

HELWES T

Analîz # Kultur # Lîteratur

Kovara Kulturî û Lîteraturî

TÊGIHIŞTINA ESTETÎKÎ

Z
A
N
Î
N
A

Z
I
M
Ê
N



E
V
Î
N

Û

Ş
O
R
E
Ş

KOVAR Û WEŞANXANEYÊN KURDAN

Hejmar - No: 8 * * * * Sal : 3 - Payiz - 1997

www.netewe.com

HELWES T

Analîz # Kultur # Lîteratur

Kovara Kulturî û Lîteraturî

Utgivare

Moderna Kultur Förlaget

Xwedî

Weşanên Çanda Nûjen

Ansvarig/Berpirsiyar

Birêvebirê kovarê

Lokman POLAT

Wênaya Bergê

A. Duran

Beşa wergêrê

N. Zaxûranî

**Danasîn û Analîza
pirtûkan: Senar Şahîn**

Fransa - K. Xalo

Almanya - E. Botî

Tel : 7545-911042

Lubnan - N. Agirî

Türkîye - A. Onal

Swîsre - A. Duran

Norveç - A. Baran

Hejmar : 8

Sal : Payiz - 1997

Çap : Baran Trykerî

Abonetî

Salek : 240 Kr.

Derveyê Swêdê : 60 \$.

Postgîro : 9 13 31 — 9

ISSN — 1400 - 9404

Navnîşan / Adress:

Tensta Alle 43 - 2tr.

16364 Spånga /Sweden

Tel / Fax:08-7618433

NAVEROK

- * 2 - Ji Edîtor Çend Gotin
- * 6 - Nameyek Ji Halabja.....
- * 7 - Bexçeyê Xwendinê.....
- * 11 - Pêwîstiya du kovaran..
- * 15 - Hêviya Bihuştê.....
- * 18 - Hevpeyvîn.....
- * 24 -Mîrado û Folklor.....
- * 34 - Romaneke Nû.....
- * 53 - Rola Kurdologan.....
- * 65 - Nivîsa G. Çiyan.....
- * 69 - Nivîsa Plehanov.....
- * 79 - Cihana Weşanên Kurdî
- * 89 - Berbanga Azadiyê....
- * 93 - Kurê Marî.....
- * 94 - Romana Y. Guney..
- * 100 - Anonsa Pirtûkan....

HELWEST^{KOVARA}T

Ji Bo Pêşveçûna Lîteratura Kurdî Xizmet Kire
û Dike. Helwest Vê Xizmetê Didomîne.

**"Kovara Helwest ji edebîyat û çanda Kurdî
re pêwîstîyek girîng bû û di vî warî de
valahîyek dagirt."
Xidir EGT**

Ji Edîtorê Kovarê Pêşkêşî



Lokman Polat

Xwendevanên heja

Kovara Helwest hejmara 8'an di destê we de ye. Di serî de em ji yên ku du car li ser hev bûne aboneyên Helwestê re gelek sipas dikin. Wan bi abonetîbûna xwe ji bo derxistina kovara Helwestê moralek mezin dan me. Ji me re bûn alîkar.

Me di hejmara 7'an de gotibû em dê bi navê ZÎN weşanek taybetî ji bo danasîn û analîza pirtûkan derbixin. Lê niha bi navê "Yayın Dünyası - Cîhana Weşanan" kovarek derdikeve. Armanca vê kovarê jî ew e ku weşanan bide danasînê. Ji bo vê me niha weşandina ZÎNê daye seknandin.

Li ser kovara Helwestê hewceyê pesnê û gotinan nîn e, 8 hejmarên wê waye li holê ye. Kovara Helwest bi rastî jî kovarek edebî ye, kovarek kulturî û lîteraturî

ye. Di kovara Helwestê de nivîsên hêja yê edebî, kulturî hatin weşandin. Li ser berhemên edebî analîzên baş hatin kirin. Ji bo pêşveçûna çand, ziman û edebiyata Kurdî kovara Helwest rolek baş leyist. Helwest weşanek ji alî naveroka xwe ve dewlemend bû. 8 hejmarên Helwestê ketin nav dîroka weşanvaniya Kurdî. Di dîroka kovarên Kurdî de kovara Helwestê cihê xwe yê bi qîmet û rûmet girtiye.

*K*ovara Helwest ji niha pê ve jî dê ji lîteratura Kurdî re xizmet bike. Carna rûpelên wê hindik be jî, dê bi naveroka xwe tije be, dewlemend be. Lê heyên ku ji destê me bê, em dê her hejmara Helwestê 100 rûpel derbixî. Ji 100 rûpelî zêdetir be pir qalind dibe, şêkl û şemalê wê nexweş dibe, ji şêweya kovarê derdikeve, dibe wek cildên pirtûkan yê qalind, ew jî nexweş e, nebaş e.

Helwest hejmar 8 di destê we de ye. Di vê hejmarê de li ser pirtûkên edebî nivîs, hene. Nivîsên analîzî û lêkolînî û hevpeyvîn heye. Li ser gramîra Kurdî nivîsek hêja heye. Şerefnazê nivîsiye. Nivîsên li ser gramîrê dê di her hejmarî de dom bike.

Di weşanên Kurdan de danasîna pirtûkan gelek kêmtir kirin, nivîsên analîza pirtûkan nayên weşandin. Kovara Helwest dê di her hejmara xwe de cihê bide nivîsên danasîn û analîza pirtûkan. Xwendevan pirtûkên ku dixwînin bila navêjin ser ref, bila li ser wan pirtûkên ku dixwînin nivîsên danasînê, yê analîzê binivîsin. Edebiyat bi analîzên edebî dewlemend dibe. Di nav Kurdan de mirovên danasînger, yê analîzvan gelek kêmtir in. Helwest ji bo gihîştandina mirovên nûn yê di vê hêlê de, dê bibe hacet ek. Ji bo gihandina wan dê bibe qada meydana têgihîştandinê. Helwest dê bibe pêngavek ji bo ku kovar û rojnameyên Kurdan yê heyî jî girîngiya danasîn û analîza berheman fêr bibin û pêk bînin.. Di Helwestê de, di derbarê weşanên Kurdî de agahdariyên berfireh dê bêne weşandin, danasîna weşanxaneyên Kurdî dê bê kirin.

*H*elwest weşanek xwerû bi Kurdî ye û mentalîta wê ya weşanî Kurdistanî ye. Armanca kovara HELWESTê ew e ku ji çand û edebiyata Kurdî re xizmet bike. Kultur, ziman û lîteratura Kurdî pêşve bibe. Li ser zimanê Kurdî û kultura Kurdî nivîsên lêkolînî biweşîne. Pirtûkên xwerû bi Kurdî û pirtûkên edebî yê li ser Kurdan bide danasînê. Li ser romanên Kurdî û romanên din analîzan biweşîne.

Wêşanxaneya ÇANDA NÛJEN jî dê kar û xebata xwe ya kulturî berdewam bike. Di nav weşanên ÇANDA NÛJEN de em dê gelek pirtûk biweşînin. Hinek pirtûk ji niha de amade ne.

Kovara HELWEST li gor xwe ji bo pêşveçûna kultur û lîteratura Kurdî xizmet kir e. Di pêvajoya weşana HELWESTê de gelek mirovan alîkarî kirin, em ji wan re sipas dikin. Em dixwazin ku ew alîkariya xwe ji bo Helwestê bidomînin. Ji bo dewlemendiya naveroka Helwestê alîkariya rewşenbîrên Kurd pêwîst e. Xebatên çandî, edebî, rewşenbîrî li ser milê ronakbîran e.

Helwest dê nivîsên danasîn û analîza kovarên Kurdî jî biweşîne. Di Helwestê de kovarên Kurdî -Kurdan- yên ku nûh derbikevin dê bêne danasînê. Li ser kovarên heyî jî dê analîz bêne kirin. Pirs û pirsgerêkên weşanvaniya kovaran dê bê nirxandin. Di vê hejmarê de me kurtenivîsek danasînê li ser kovarên Kurdan yên ku li Swêdê têne weşandin weşand. Di hejmara bê de jî kovarên Kurdan yên ku li Stenbolê têne weşandin, em dê bidin danasînê.

Me lêgerînek li ser weşanxaneyên Kurdî yên li Swêdê kir û em fêr bûn ku di sala 1997'an de ev weşanxaneyên Kurdan kîjan pirtûk diweşînin. Navê wan hemû pirtûkan di vê hejmara Helwestê de ye. Bi dilxweşî biwxînin û pirtûkên ku hûn dicibînin ji xwe re bikin. Pirtûkxaneya xwe ya di malê de bi pirtûkên Kurdî dewlemend bikin.

Di kovara HELWESTê de nivîsên li ser rewşenbîran, yên li ser pirs û pirsgerêkên ziman, nivîsên li ser edebiyatê, sînemayê, şanoyê, yên li ser nirxandina çîrok û helbestan, nivîsên rexneyî dihatin weşandin. Nivîsên weha dê di hejmarên pêş de jî dom bike. Di vê hejmarê de hevpeyvîna bi redaktorê kovara nivîskarên Swêdiyan, bi Marîa Radîkova re heye. Hevpeyvînek jî me bi nivîskarê rojnameya Pêşerojê Xidir EGÎT re çêkir. Em hêvî dikin ku xwendevan bi dilxweşî bixwînin. Me gelek hevpeyvîn bi nivîskarên Kurd yên din re çêkiribû, hinek ji wan hevpeyvînan gelek dirêjin, em dê wan hevpeyvînan di pirtûkek de biweşînin û hemû li gel hev bi yek carî bigihîştînin destê xwendevanan.

Di Helwestê de di gel danasîn û analîza pirtûkan li ser Şano -Tiyatir - û sînemayê jî em dê gelek nivîsên danasîn û analîza leyistikên şanoyî û filman biweşînin. Leyistikên tiyatroyê û filmên herî xweş û yê herî baş û balkêş em dê bi xwendevanên xwe bidin danasînê. Em dê filmên gelek girîng, xweş û balkêş bidin danasînê. Di vê hejmarê de danasîna filmek heye. Fîlmên weha divê mirov bibîne. Nivîskarên kovara Helwestê Gabar Çiyan, û A. Duran dê nivîsên danasîn û analîza pirtûkan û filman ji bo Helwestê binivîsin. Em dê nivîsên wan di hejmarên pêş de biweşînin. Ji bo danasîna kovara Helwest hejmara 7'an di kovar û rojnameyên Kurdistanê de nivîsên danasînê derketin. Berga kovarê jî li gel wan nivîsên danasînê weşandin. Em ji bo vê piştgiriya ji rojnameya Hêvî, Roj û ji kovara Rojbaşê re spas dikin.

Helwest ☞ Kovara Cihana Çandî û Edebî ye.

Helwest ☞ Analîza Berhemên Edebî ye.

Helwest ☞ Zanîna e, Aso ye, Fêrbûna Edebî ye.

Helwest ☞ Haceta pêşveçûna Kulturî û Lîteraturî ye.

Ji bo wê Helwestê bixwînin.

Helwestê bidin danasînê.

Li her derî behsa Helwestê bikin.

Yên ku bi Helwestê nehesiyane bila bibîstin ku waye Helwest derdikeve.

Ji bo berdeambûna weşana Helwestê bibin abone.

Abone peyda bikin. Bibin alîkar.

Helwestê bixwînin, bidin xwendin!

Di hejmara 9'an a Helwestê de, dê gelek nivîsên analîzî û lêkolînî heb in.

Helwest hejmar 9 dê bi gelek guhertinan derkeve.

Guhertin û xwe nûhkirin armanca kovara Helwestê ye.

Xwe nûhkirin û hemdemî rêça kovara Helwestê ye.

Nivîsandina xwerû bi zimanê Kurdî rûmet e.

Helwestê wê rûmetê diparêze û didomîne.

Em Helwest hejmara 8'an pêşkêşê xwendevanên Kurd û pirtûkxaneya Kurdî dikin.

Hetanî hejmara 9'an bimînin di xweşiyê de.

Li benda hejmara 9'an bin.

Lokman Polat
Edîtorê Helwestê

— Nameyek Ji Berpirsiyarê Kovara —

HALABJA —

Lokman POLAT

EVÎN Û JIYAN



WEŞANXANA ÇANDA NÛJEN

Kekê Lokman Polat

Silavekî germ

Pê m xweşe bibejim ku min berê çend heftan pirtûka te ya bi navê “EVÎN Û JIYAN” xwend. Kêfa min gelek hat ku kurdekî bakûr li meydana çîroknûsîda têdekoşe. Piştî eve ez çûm bo Stockholmê û bo weşanxanej Sara. Berê her tiştekî li kitêbeka nî te geriyam. Ewe bu sê kitêbên din jî ketne ber çavê min, kitebî (Hawar û Qêrîn), (Mêrxas), û (Evîndar). Bi rastî her çende çîrokekên xemgînî û bi teêştirin, lenîşaney jêhatîyan têdaye.

Hevîdarim ku tu berdewam bî li nûsîn û belavkirinê.
Gelekîş hez dikim ku hevudu bibînin. (.....)

Kake Lokman giyan!

Ji bo vê yekê ez hez dikem ku çend berhemên ku li dest me daye, pêşkêşî birayê xwe yê azîz û hêjay bikim. Tikaye qebûl bike. Her weha hez dikim ku peywendî me bi heztir bê. Eger berhemên din li cem we heye tikaye bêbeşman meken. Me (Halabja) bo we dişînim û hêvarîşim ku (Helwest) bi destê me bigat.

Pîroz be kake Lokman Polat.

Mohsîn Jwamîr
Berpirsiyarê kovara HALABJA

BEXÇEYÊ XWENDINÊ

“Zewqa xwendina pirtûkê, zewqek orîjînal e.”

XWENDIN

Gelek pirtûk evîne qal dikan. Evîna ku têt qalkirin jî evîna di nabera du însanan de ye. Di nav însan û nesneyan de jî evînek heye. Her mirov ji tiştek hez dike. Hinek ji ereban û acotina wan hez dikan. Hinek jî temaşekirina futbolê gelek hez dikan, hinek jî temaşekirina fîlm û şanoyê hez dikan. Û hinek jî ji xwendina pirtûkan hez dikan. Di nav wan û pirtûkan de evîndariyek heye. Marcel Proust di pirtûka xwe ya bi navê “Li ser Xwendinê” de evîndariya ji bo xwendina pirtûkan qal dike. Ew dibêje “zewqa xwendina pirtûkê gelek e. Zewqek orîjînal e. Xwendin keyfxweşiya herî zadegan e. Mirov tenê bi riya xwendinê dibe zanîst.”

Ji bo hinek mirovan xwendin evînek e. Mem çawan ku ji ZÎNê ewqas hez dike, ew jî ji pirtûkan, ji xwendina wan ewqas hez dikan. Lê mirovên weha di nav Kurdan de kêmin.

Lî ser xwendinê nivîsek gelek xweş û baş di rojnameya HÊVÎ de derket. Sernavê nivîsê "Bexçeyê Xwendinê" bû. Nivîskarê nivîsê birêz Ferhat Can e. Ji bo giranbihayiya girîngiya nivîsê, em wê di kovara Helwestê de diweşînin. Dibe ku gelek xwendevanên kovara Helwestê wê nivîsê nedîtibin û nexwînin. Dibe ku ew hejmara rojnameya HÊVÎ'yê neketibe destê wan. Nivîsên weha hêja, bi qîmet û rûmet çend car bêne weşandinê hîn baştir e, weha bi çend car weşandinê gelek xwendevan jê feyde dibînin. Niha em li jêr nivîsê pêşkêşê xwendevanên xwe dikin.

Kovara HELWEST

BAXÇEYÊ XWENDINÊ

Ferhat CAN

Xwendin ne tenê hînbûna xwendin û nivîsandinê ye û ne tenê mekteb e. Mekteb di jiyana mirovan da rûpelek e: Pênc sal, deh sal yan jî panzdeh sal.. Lê jiyana jê dirêjtir û xwendin di hemû jiyana da bi kar tê.

Mekteb wek haletêk e, te hîne xwendin û nivîsandinê dike. Tevî wê jî te hîne kar û hunerekê dike. Her usa jî, di warê zanîna da bingehekê ji te ra ava dike. Divê tu li ser vê bingehe bimeşî.

Ji ber ku jiyana, ji roja bûna heya çûna her usa jî hînbûn e. Tim tiştên teze derdikevin pê te, divê tu nas bikî, bi kar bînî..

Xwendin, her usa jî tamek ji tamên jiyana ye. Wek xwarin û vexwarin, gerîn, wek cejn û şahî, wek kilam gotin û guhdarî kirin, wek evîndarî û hez-kirin..

Mêyla xwendevanan ne yek e. Her kesek gor mêyla xwe, gor dil û daxwaza xwe dixwîne. Mêyla hin kesan li ser ol e, ew kes kitêbên oldarî dixwînin. Hin kes ji ilm û zanîne hez dikin, li ser kîmya û fizîkê, li ser stêran, li ser jiyana nebat û heywanan dixwînin. Bal û mijûliya hin kesan di warê felsefê da ye. Hin kes ji babetên edebî hez dikin, şîer, roman, hîkayatan dixwînin.

Bi xwendina kitêb û nivîsarên îlmî dinya mirovan fireh dibe. Mirov dinyayê, gerdûnê û jiyane dinase. Di dinyayê da çi heye çi tune.. Dinya, stêr, koma stêran û gerdûna bê dawî..

Felsefe mêjiyê merivan dişuxulîne, fîkr û raman dewlemend dike. Meriv bi meriviya xwe dihesê.. Çawa tu gîsin li erdekî xam bixî, avdî, kulbe bikî..

Edebiyat gulbaxçe û gulistana xwendinê ye. Li wir cure cure gul û giya, dar û fêkî hene. Ji derva tiştêk xuya nake, dîwarek bilind e. Divê tu derî vekî, bikevî nav. Hingê ewê te bikişîne. tuyê dinyayeke teze nas bikî.

Di warê edebiyatê da, ji sedsalan vir da hosteyên mezin gihane. Her yekî li vî baxçeyê bi ser û bê bin da gulek daniye, darek avakiriye, ku bi rengê xwe, bi bêhna xwe, bi tama fêkiyên xwe cure cure ye..

Hirî yan jî rîsê van hosteyan ziman e, gotin in. Hoste li ser ziman dişuxilin mîna zêrkeş û sîmkêşan, berhemên delal pêk tînin, rengîn, neqş bi neqş..

Ziman di dest wan da dibe wek îbrişim, wek zêr û zîv.. Şîrîn dibe wek hunguv.

Berhemên hosteyên mezin wek ronahî ye, dinêyekî ji we ra vedike. Bi aliyê hîs û raman we dewlemend dike.

Dema hûn berhemên van hosteyan dinasin, dilşa dibin. Dibêjin, çima ez dereng mame? Çima min berê nexwend?

Gelek kes heyran û hijmekarê nav û dengê van hosteyên mezin in. Dixwazin wan bibînin. Wan binasin, bi wan re sohbet bikin..

Lê gelek ji wan di sedsalan da hatine û çûne. Hinên wan himçaxê me ne, lê gelek caran ji me dûr in, li welatê din dijîn. Ger himwelatî bin jî, gelek caran zehmet e meriv wan rû bi rû nasbike û pê ra qise bike..

Lê kar û berhemên wan va ye li ber çavan e. Hûn hosteyên mezin di berhemên wan da, di şîer, roman û bîranînên wan da nas bikin. Ew zêtir li wir in. Ew ew in..

Xwendin bi aliyekê, bi îmkanan girêdayî ye. Kesê ku di jiyana xwe da firsend nediye û hînî xwendinê nebûye, ma çi bike? Lê gelek kes jî xwendinê dizanin, lê belê ji xwe ra nekirine adet û usûl. Çawa ku ji mala te sed mêtro wê da baxçe û parkekî delal heye, lê bala te nakişîne.. Tu hînî ger û meşê nebûyî..

Di welatê me da mirov çiqas dixwînin? Çiqas ji xwe ra kirine adet û usûl? Heya gelek kesê ku xwe siyasetvan û ronakbîr dihesibînin.. Meriv dibêje, di nav me Kurdan da dibe ku nivîskar ji xwendevanan zêtir bin.. Ji ber ku hin kesan roman nexwendine lê romanên dinivîstînin..

Xwişk û birano, bixwînin, xwe ji van fêkiyên delal bêpar nehêlin. Ketina vî bexçeyî gelek erzan e.

PÊWÎSTIYA DU KOVARÊN KURDÎ

Lokman POLAT

1 - PÊWÎSTIYA KOVAREK DÎROKÎ

Hinek kes dibêjin “Kovarên Kurdî pirr in, mirov nizane kîjan bikire, kîjan nekire.” Ev dîtî ne rast e. Kovarên Kurdî pirr nîn in, hindik in. Kovarên Kurdî ji dehî nabure. Lê yên gelên din bi sedan in. Kovar û rojnameyên siyasî na, tenê yên kulturî, lîteraturî li Tirkîyê nêzikê sed -100- heb in, li Fînlândiya'yê ji sedî zêdetir in, li Swêdê jî sê sed -300- heb in. (Hemû kovar û rojnameyên ku li Swêdê derdikevin ji du hezarî -2000î- zêdetir in.) Kovarên Kurdî yên çandî, edebî, hunerî şeş -6- heb in û ew jî li Swêdê derdikevin. Du -2- heb jî li Stenbolê derdikevin. Li gel vê hindikbûyîne jî hêj hinek dibêjin kovarên Kurdî pirr in. Ev çavnebarî ye, hesûdî ye, dîlnepakî ye.

Yên ku dibêjin kovarên Kurdî pirr in, bila hinek bifikirin; ka kovarên Kurdî yên cure, cure şaxên edebiyatê be, hene yan na? Kovarek Kurdî ku tenê mijara wê dîrok be, sînema be, muzîk be, şano be hene? Na!..

Ji xwe re binêrin, ji bo ku kovarek Kurdî ya ku mijara wê dîrok be tune, kovarên kulturî, yên çandî, edebî, hunerî nivîsên li ser dîrokê diweşînin. Nivîs û lêkolînên dîrokî di kovar û rojnameyên siyasî de û di yên edebî, kulturî de têne weşandinê. Çima yên Kurdan jî kovarek wan ya li ser dîrokê tunebe. Li Ewropayê kovarên "Histori - Dîrokî" hene. Li Tirkîyê kovarên bi navê "Tarih Dergisi - Kovara Dîrokê" heye. Lê, yên Kurdan tune ye.

Gelek nivîskarên dîrokzan yên Kurd hene. Ew li ser bûyerên dîrokî lêkolîn dikin. Gelek pirtûkên wan yên li ser dîrokê hatine weşandin. Ev mîrovên dîrokzan bila bên cem hev û bi hev re kovarek dîrokî derbixin.

Pirtûka dîroka Kurdan "Şerefname" pirtûkek dîrokî ye û pirtûka yekem a li ser dîroka Kurdan e. Îsal 300 saliya nivîsandina wê pirtûkê ye. Hetanî niha û helbet ji niha pêve jî de gelek lêkolînên îlmî-zanîstî li ser vê pirtûka dîrokî bête kirin. Her çiqas di vê pirtûka dîrokî ya Kurdan de - di Şerefnamê de - hinek şaşiyên dîrokî hebin jî, ev pirtûka dîrokî ji bo Kurdan gelek bi qîmet e. Di pîrozkirina 300 saliya vê pirtûkê de, jê re qîmet û rûmet nîşandan tiştekî tebiîye û bi nîrx e. Qîmetdayîna ji bo vê pirtûkê bi xwe re pêwîstiya weşandina kovarek dîrokî tîne. Dîrokzanên Kurd divê bi derxistina kovarek dîrokî qîmet û rûmeta "Şerefname" bi bîr binin û wezîfeya xwe ya dîrokî bi cih binin. Pêwîstiya weşandina kovarek dîrokî li holê ye. Di vê hêlê de wezîfe û berpirsiyarî dikeve ustiyê nivîskarên dîrokzan.

Di kovara çandî, edebî, hunerî "Nûdem"ê de nivîsên dîrokî yên li ser "Şerefname" yê derketin. Min wexta ku Nûdem hejmara 21'an dît ku gelek nivîsên dîrokî li ser Şerefnamê ne, min ji xwe pirs kir; ma gelo cihê van nivîsan ev kovar e? Kovara "ÇIRA" jî kovarek çandî, edebî ye, lê tede gelek nivîsên lêkolînî yên li ser dîrokê derdikeve û gelek belgeyên dîrokî tede tê weşandinê. Helbet cihê lêkolîn û belgeyên dîrokî kovara Nûdem û kovara Çira nîn e. Lê ji neçariya tûnebûna kovarek rengdîrokî dibe sedem ku nivîsên weha di van kovarên çandî, edebî, hunerî de derdikevin. Heger kovarek dîrokî hebe dê nivîskarên dîrokzan nivîs û lêkolînên xwe yên li ser dîrokê ji ew kovara dîrokî re bişînin û di wê kovara dîrokî de dê ew nivîs derkevin.

Pêwîstiya kovarek dîrokî di qada jiyana çapemenî ya Kurdan de xwe dide hîskirin. Hêj gelek aliyên dîroka Kurdan di tarîtiyê de maye. Hêj li ser dîroka Kurdan dîtînen gelek cuda hene. Hinek dibêjin Kurd ji Îskandînavyayê hatine Kurdistanê, hinek dibêjin ji Hîndîstanê, hinek dibêjin ji tu cihê nehatine her tim li cihê xwe, li ser axa xwe ya îroyîn jiyane. Ji bo Kurdîyê jî herkes tiştek dibêje. Hinek dibêjin Kurd ji gelek

qewman, ji gelek xelqan -gelan- çêbûne. Hinek dibêjin na, Kurd tenê ji qewmek çêbûne. Divê li ser van dîtînan cuda gelek munaqêşe bê kirin. Ji bo rohnîkirina bûyerên dîrokî lêkolîn û munaqêşe pêwîst e. Di vê hêlê de rola herî girîng kovarek dîrokî dikare bîne cîh.

Nivîskarên Kurd yên dîrokzan, hûn ji bo pêşniyara weşandina kovarek dîrokî çi dibêjin? Li gor we kovarek weha pêwîst e yan na? Heger pêwîst e çima kovarek weha nayê derxistin? Asteng çine? Divê nivîskarên Kurd yên dîrokzan di vê hêlê de dîtînan û ramanên xwe bînin zimên.

2 - PÊWÎSTIYA KOVARA ZIMANÊ KURDÎ

Yê ku neteweyan li ser piyan dihêle ziman e. Hebûna neteweyan li ser pêkanîna ziman didome. Heger ziman nebe, netewe asîmîle dibin û di nav pêvajoyê de dihelin, wenda dibin. Di hebûna jiyana neteweyan de ziman bingeh e.

Di dîroka cîhanê de gelek xelq -gel- hebûne ku di nav pêvajoya dîrokê de ji bo ku zimanê xwe neparastine, asîmîle bûne û wenda bûne. Beriya ku tirk ji Asya Navîn koç bikin û bîne Anadolîyê, li Anadolîyê gelek xelq hebûne, lê ji ber ku van xelqan -xeynê Kurdan- zimanê xwe neparastine, bi zimanê xwe neaxifiyane, bi zimanê tirkan axifiyane, fêrê tirkî bûne û paşê jî xwe wek tirkan hesibandine. Tirkan bi rê û metoda asîmîlasyonê gelek Rum, Boşnak, Arnawud, Laz, Gurçî, Erebi, û Çerkezên helandine, wan kirine wek tirkan. Îro ji wan gelan bi milyonan însan - ku bi eslê xwe bi koka xwe ne tirk bin jî- xwe wek tirk dihesibînin. Li Anadolîyê hejmara tirkan -yên esil tirk- gelek kême, hindik in, lê bi saya helandinê însanên ji xelqên din îro wek hejmar pirr xuya dikin.

Her çiqas qismek Kurd jî asîmîle bûne û xwe wek tirk dihesibînin jî, Kurd bi pirranî xwe tirk nahesibînin û li Kurdbûna xwe, li zimanê xwe, li doza xwe ya netewî xwedî derdikevin. Kurdan ji bo ku zimanê xwe parast loma jî wenda nebûn.

Lê îro, di vê rewşa hanê de, di dema radio, tv û komunîkasyonê de, zimanê Kurdî li ber xeterek mezin e. Çerxa asîmîlasyonê îro ji doh pirtir diçerixe. Bi riya radio û tv'ê polîtîka asîmîlasyonîst hîn pirtir pêk tê. Bi dehan kanalên tv'yên tirkî di mala her Kurdekî de rolekî ji bo asîmîlasyonê pêk tîne. Di vê rewşa hanê de, kar û xebata ji bo zimanê Kurdî, bi her awayî xwe derdixe

pêş. Girîngîya axaftin û nivîsandina bi zimanê Kurdî li holê ye. Divê Kurd li gor vê girîngîyê berpirsiyariya xwe bînin çîh. Ji xwe her tişt ji destê Kurdan çûye, zimanek wan maye, heger ew jî biçe tu tiştekê Kurdan namîne.

Zimanê ku pê nê axaftin û nê nivîsandin bi pêşve nakeve, pêşve naçe. Ziman divê xwe nûh bike, pêşve here, dewlemend bibe. Ji bo dewlemendbûna zimên, ji bo rastnivîsînê divê ferhengên têkûz û pirtûkên rêziman -gramer- bên afirandin. Ji bo çareserkirina pirs û pirsgerêkên zimên divê lêkolînên îlmî-zanîstî- bên çêkirin û divê kovarên zimên bên weşandin.

Kurd ji sî -30- milyonî zêdetirin, lê çî heyfe ku hêj jî kovarek wan ya zimên tune ye. Yanî "Kovara Zimanê Kurdî" hêj tune ye. Her çiqas di kovarên heyî yên Kurdan de car - carna nivîsên li ser pirsên zimên tene weşandin jî ev tîr nake. Divê kovarek xweser ji bo pirs û problemên zimanê Kurdî bê weşandin.

Di nav Kurdan de zimanzanên akademîker tunebin jî, hinek zimannas hene. Ew dikarin hewl bidin xwe û kovarek li ser pirsên zimanê Kurdî biweşînin. Weşandina kovarek weha ji bo pêşveçûna zimanê Kurdî hewldanek gelek girîng e û kar û xebatekî gelek hêja ye.

Kurd divê mentalîteya xwe bigehurînin. Dev ji metoda klasîk ya berê berdin. Kurd jî divê wek neteweyên pêşketî di warê weşanvanîyê de rê û metodên nûh bi kar bînin. Çawan ku weşanvaniya neteweyên pêşketî li gor babetan cuda ne, divê yên Kurdan jî weha be. Xelq -bi taybetî jî gelên Ewrûpî- ji bo muzîkê, sînemayê, şanoyê, edebiyatê, kulturê, dîrokê, ziman û ji bo danasîn û analîza pirtûkan kovarên cuda cuda derdixin. Lê ev hemû tişt di kovarên me Kurdan de, di yek hejmarek de dikarin çîh bigrin. Lê divê weha nebe! Ji bo her babetî divê kovarên cuda hebin. Ji bo ku ev mentalîteya cihêreng hêj di nav me Kurdan de bi çîh nebûye, loma jî tevlihevî berdewam dike. Ji bo vê divê kovarên cihêreng, yên li gor babet û mijaran cuda bêne derketin. Ji bo zimanê Kurdî pêwîstiya kovareka zimên heye. Divê kovara zimanê Kurdî ji alî zimanzan û zimannasan ve, yan jî ji alî dezgeh, kurum, sazîyên Kurdan ve bê weşandin.

Pêwîstî û girîngîya radio û kanalên Tv yên Kurdî ji xwe hewce nake ku mirov li ser gotinan bibêje. Hema ji destê kê hat divê vê tiştî pêk bîne. Di şûna yek radioyek Kurdî de, yek TV'yek Kurdî de bila bi dehan radio û Tv'yên Kurdî hebin. Hebûna wan xeter û astengên li pêşberî zimanê Kurdî dikare ji holê rabike û bi saya wan weşanan zimanê Kurdî dê gelek pêş bikeve, dewlemend bibe û bibe zimanek ragihandinê, zimanek modern.

HÊVIYA DÎTINA BEHUŞTÊ

Şahînê Bekirê SOREKLÎ

Li dû şerê cihanî yê 2'em li gellek welatên Afrîka û Asya têkoşîna li dij dagirkerên ewropayî dest pê kir û li welatine bizava damezirandina dewletên Marksîst-Lenînîst hat kirin. Di nav 30 salên li dû şer de hejmareke ne biçûk ji gelên cîhanê li Afrîka, Asya û cîhên din gihîştin serxwebûnê. Hêviya gelên van welatan ew bû ku jiyaneke azatir û rewşeke çaktir li dû serxwebûnê bi dest xin.

Îroj, sê salan li pêş destpêkirina sedsala 21'emîn, dema mirov rewşa wan welatên ku di sedsala 20'emîn de serxwebûn bi dest xistin dide ber çav, mirov dibîne ku rewşa pirraniya wan ji aloziyê ber bi aloztirbûnê çûye û diçe. Ji aliyekî de hukmatên fasid û dîktator, ji aliyê din de rewşa xirab ya aborî. Ji aliyekî de zêdebûna xelkê wan welatan, ji aliyê din de şerê navxoyî û yê li gel welatên dirawsê; ji aliyekî de belengazî, ji aliyê din de nezantî û rêhişkî, ...

Bi encama rewşa kambax ya van welatên di pirsê de û bi encama bêhêvîmayîna bi milyonan hemwelatîyên wan îroj bazirganiyeke nû bi jiyana mirovan dest pê kiriye. Ji welatên Afrîka, Ji Vîyetnamê, Hindestanê, Pakistanê, Bengeladeş, SrîLenka û heta ji Çînê; ji welatên Rojhelata Navîn, hindekên Ewropaya Rojhelat û hindekên Emerîkaya başûr bi milyonan mirov bi hemî şeweyan bizavê dîkin ku xwe

bigihînin welatên Ewropaya Rojava, D.Y.E., Keneda û Australya. Ji van penaberên ekonomî di nav çend salên borîn de bi milyonan gihîştin welatên rojavayî. Bi hezaran yên bedbext ji wan hatin girtin, paşvevegerandin, yan li ser sînoran û di deryayan de mirin. Van penaberên ekonomî zewiyên xwe, xaniyên xwe, heywanên xwe, zêr û zîvê jinên xwe difroşin da ku wan pereyan bidin bazirganên jiyana mirovan, bi hêviya ku wan bigihînin behuшта welatên Rojava. Di sandiqên hesinî yên kamiyon û trê û keştiyan de, di gemiyên biçûk û tehlûke de, bi rêya sînorên bi mayîn, di nav dehl û çiyayên ase re, û bi pasport û kaxezên sexte van ksan didin dû hêviya gihîştina behuşteke xeyalî.

Bi taybetî di nav du salên borîn de hejmareke ne biçûk ji van penaberên ekonomî di rêya behuшта xeyalî de mirin. Tête gotin, masîvanên ji Spanya û Îtalya dema şebekeyên xwe diavêjin ava deryayê pirr caran hestiyên mirovên mirinî di şebekeyên wan de xwe bi cîh dikin. Bi dehan mirovên Kurd jî di van demên dawîn de li ser sînoran û di ava deryaya di navbera Tirkîyeyê û Yewnanistanê de, ne tenê jiyan wenda kirin, lê hindekan ji wan laşên xwe yên di deryayan de bêxwedî manî jî, çimkî kesek li term û laşên miriyan xwedî dernakeve. Yên Çakbext ji van penaberên ekonomî xwe digihînin Ewropa, Emerîkaya Bakur û cîhên din. Hindek ji wan bi salan di rewşeke aloz de dimînin, hindekên din dikevin ber karên herî giran û dijar, û hindekên din her bêkar û bêhêvî dimînin û bi pereyên dayîreya sosyal yan karê reş xwe di behuшта xeyalî de îdare dikin. Bi hezaran çînî, viyetnamî, afrikayî, meksîkî û yên din rojê bêtir ji 12 saetan di xwaringehan de, di karxaneyên neqanûnî de, yan di nav baxçeyan de dixebitin. Ber kurtedemekê komeke ji zarokên kerr ji Meksîkê li başûrê D.Y.E. hatin dîtin ku wek koleyan dihatin bikaranîn. Hindekên din ji van penaberên ekonomî bi zorê, yan bi encama neçartiya wan, wek giyanfiroş yan qaçaxcî tîyên bikarhanîn.

Dema van penaber û muhacîrên ji welatên cîhana 3'yem û 4'em dibînin ku behuшта wan hêvî dikir nîne ew dest bi gazindan dikin; dest pê dikin li dij stemkarî û nijadperestiya welatên mazûvan biaxifin.

Li gel hemî deng û behsên ne baş, li gel zêdebûna nijadperestiya li welatên rojava, li gel dijarbûna şert û mercên pejirandina penaberan û li gel tehlûkeya mirinê jî, hejmara penaberên ekonomî heku diçe bêtir dibe. Ew bi rêya filimên sînamayî û televizyonî û wêneyên xizm û hevalên xwe behuшта xeyalî ya li welatên rojavayî her bi bîr tînin û naxwazin bawer bikin ku behuшта ew li dû dikare bibe dojeha ebedî jî.

Çiqa rojname behsa rewşa aloz yan muhacîrên ekonomî bikin jî, çiqa filim û şano di derheqê dojeha penaberên her tişt wendakirinî de bîyên raberkirin jî, çiqa rojname behsa tehlûkeya birêvemirinê bikin jî, ew hên jî dixwazin ji welatên xwe biçin der. Peya, jin û zaro xwe û jiyana xwe dixin destên bazirganên jiyana mirovan bîyî ku bizanibin li pêş wan çi heye. Li gor raportine, van bazirganên jiyana mirovan bi pirranî bazirganên berê yên efyûnê û çekan in. Wisa diyar e ku bazirganiya bi jiyana mirovan ji bo wan hêsantir û bi kelktir e. Ew bi xwe di koşkên mezin de dimînin û wek milyonêran dijîn û ji bo va karê gemarî kesên di bin destên xwe de bi kar tînin.

Tête gotin ku li welatên Ewropa, li Emerîkaya Bakur û li Australya bi milyonan muhacirên neqanûnî hene. Van welatan sal bi sal qanûnên pejiwandina muhaciran û penaberan dijiwartir dikin. Bi encama hatina bi sedhezaran muhacirên ji Afrîka, Asya û Emerîkaya Latînî nijadperestî jî heku diçe li welatên mazûvan bêtir dibe. Welatine rojavayî dest pê kirine hejmareke ji penaberên ekonomî li welatên wan vegehrînin. Wekî Vîyetnamiyên li Hong Kong ber demekê îspat kirin, xuya ye li gel hemî dijiwariyên li holê jî, van penaberan rewşa aloz li welatên nû ji vegeza li welatên xwe baştir dibînin.

Ber demekê min filimeke ji wan filimên xeyalî dît ku tê de welatên ewropayî hemî sînorên xwe yên deryayî bi tîlên elektrîkî parastibûn ji bo rawestandina muhacir û penaberên ji Afrîka û Asya. Eger rewş wisa bidomîne, gelo filimên wisa dê ta kengê xeyalî bimînin?!

Ola îslamî û ya katolîkan bisînorkirina zarokan qedexe dike, li welatên wek Afxanistanê rêxistinên curbecur bi navê xwedê kujtinê û wêrankirinê geş dikin, û tevî ku hejmareke mezin ji welatên cîhana 3'yem û 4'em welatên rojavayî wek neyar û xirab bi nav dikin jî, bi milyonan ji xelkê wan amade ne kujtinê bidin ber çav da ku xwe bigihînin van welatên ewropayî. Wisa jî endamên malbatan jî hev diqetin û belav dibin, erf û toreya gelan dest bi wendabûn û nemanê dikin û çanda COCA COLA'yî li cîhanê belav dibe; û dema hindek ji penaberên ekonomî yên do rojekê diçin serilêdana xizmên xwe, ew bi kamêraya vîdyo, bi taxim û şebqe, bi fantazî û hêlehob diçin serilêdana welêt, û hemwelatîyên wan dibînin dikevin nav xewn û xeyalan û xweziya xwe bi wê rojê tînin ku ew jî bigehîştina behušta rojavayî, li şûna ku bizavê bikin welatê xwe bikin behuşt. Hejmareke din ji penaber û koçberên ekonomî, dema dibînin ku behušta wan di xewn û xeyalan de dihanîn ber çav li welatên rojavayî nîne, dest pê dikin neyartiya welatên mazûvan bikin û heta dibin endamên rêxistinên rêhişk û dikarin di kirinên bi teror de jî beşdar bibin. Li dû mayîna çend salan li welatên rojavayî, koçber û penaber dest pê dikin welatê bapîrên xwe îcar wek behuşt bi bîr wînin; heta hindek ji wan stemkariya dewletên ew ji ber reviyabûn ji bîr dikin û dibin piştgirên wan dewletan bi xwe, yan li welatê rojavayî dikevin nav partiyên "şoreşgêr," bi hêviya ku welatê ew jê reviyabûnê bibe behuşt û ew ê ji dojeha dûrewelatîyê vegerin wê. Hindek ji van koçber û penaberan, li dû sernekeftina di jiyana li welatê nû de, dibin xweperest jî. Îcar dixwazî erf û toreya kevnar li ser zaroya xwe feriz bikin. Zarokên wan di jiyana xwe de rastî dijiwariyên mezin têyên ji ber ku ew hem ji cîhana welatê bav û dayên xwe, hem jî ji jiyana civata ew nuha di nav de ji gellek aliyan de bêpar dimînin. Li gel nerazîbûna hejmareke mezin ji koçber û penaberan ji rewşa welatên nû jî, ew amade ne karên herî aloz bikin, amade ne kêkar danîşin, amade ne birçî bimînin, lê ne amade ne li welatê xwe vegerin, tevî ku ew xwe bi xwe dîkin û vegeza welêt wek xewnekê di hiş û dilên xwe de dihelin. Hêviya gihîştina behuştê her bi paşve tete xistin, ta ku rojek tê û ew hew dibînin ku jiyana wan li kutabûnê ye. Hêviya dîtina behuştê careke din bi paşve tete xistin: heye ku li dû mirinê!

HEVPEYVÎN

H
e
v
p
e
y
v
î
n



H
e
v
p
e
y
v
î
n

HEVPEYVÎN

Xidir EGÎT:

“Kovara Helwest ji edebîyat û çanda Kurdî re pêwîstîyek girîng
bû û di vî warî de valahîyek dagirt.”

Keçek min heye. Min wê hînî xwendin û nivîsandina Kurdî kir. Ji xwendina Kurdî zehf hez dike. Çi pirtûk, kovar û rojnameyên Kurdî dikeve destê wê, bi piranî dixwîne. Gava ku kovarên Helwestê ketin destê wê, piştî ku ew xwendin, ji min re got: “Yabo, ev kovarek pir delal e; min ew eciband! Divê kovarên Kurdî yên welê hebin ku em ji nivîskar, edebîyat û çanda xwe hayîdar bin, em bizanibin ku ew xwedîyê çi berhemane, me çi xwendîye an nexwendîye. Kovarên welê, yên wek min bi piralî perwerde dike! Rewşa wê, mîzampaja wê ewqas xweşik e ku gava çavê min lê ket min xwest ez bixwînim!”

Kovara Helwest - Pirs : 1 — Ji kerema xwe, tu dikarî behsa xwe û nivîsîna xwe ya bi Kurdî bikî. Te kîngê dest pê kir û bi Kurdî nivîsand?

Xidir EGÎT - Bersiv : 1 - Ez baş nizanim kîjan sal bû, lê li dora salên 75'an bû, Alfeba Kurdî ya M. Emîn Bozarslan, Gramera Zimanê Kurdî ya M. Celadet Bedirxan û Dîwana Cegerxwîn ket destê min. Wê gavê ez hînî xwendin û nivîsandina Kurdî bûm.

Kovara Helwest - Pirs: 2 — Te kengê, çawa û çima dest bi nivîskariyê kir? Tu ji bo çi û ji kî re dinivîsîn?

Xidir EGÎT - Bersiv : 2 - Di sala 1993'an de li girtîgeha Aydinê min dest bi nivîskariyê kir. Wê demê gramerên Kurdî, pirtûkên li ser dersên zimanê Kurdî, pirtûk, rojname û kovarên xurû Kurdî, an nêvî Kurdî, nêvî Tirkî di sensora girtîgehê re derbas bûn, ketin destê min. Di wê pêvajoyê de du hevalên şoreşgerê Tirk û yekî Kurd, ji min daxwaz kirin ku ez wan hînî Kurdî bikim. Bi dilşayî min daxwaza wan pejirand û dest bi mamostetiya zimanê Kurdî kir. Lê ya balkêş û matmayî ev e ku herdu şoreşgerên Tirk bi biryarkarî xebata xwe berdewam kirin û hînî Kurdî bûn, lê hevalê min yê Kurd piştî çend dersa terikand û hîn nebû. Ji xwe zimanê wî yê zikmakî bi Kurdî bû, tenê wê gramera xwe rast bikira û wê Kurdîya xwe pêşda bibaya. Weke tê zanîn ji alî rojname Azadî, li ser navê Ahmedê Xanî lecek kurteçîrok û helbestên bi Kurdî hat li darxistin. Ji bo ku ez beşdarî wê lecê bibim, min jî dest bi nivîsandina kurteçîroka xwe ya bi navê "Serlêdan" kir. Weke tê zanîn di wê lecê de kurteçîroka min xelata duyem wergirt. Di wê pêvajoyê de, ji kovara "Newroz Ateşî" re min dest bi nivîsandina nivîsarên bi Kurdî kir.

Çima nivîskari? Ji bo ku pêwîstiya civaka Kurd bi nivîskara heye divê bi zimanê xwe bixwîne û binivîsîne. Ya din ez endamekî civaka Kurd im; xwedîyê zimanekî bi bingehe û şêrîn im; xwedî çandek kevn û dewlemend im. Li gundekî Kurdistanê, di malek Kurd de hatim dinyayê. Heta ku çûm dibîstana tîrka, ji Kurdî pê ve min tu zimanê din nizanibû. Ez bi çîrok, serpehatî, stran û kevneşopîyên civaka Kurd mezin bûm. Ji bo ku mêtinkar hemû dewlemendîyên Kurdistanê talan bikin û serwerîya xwe li ser gelê Kurd bidomînin, heyîyên gelê Kurd yên civakî, dîrokî û çandî înkâr kirin. Ji bo di vê siyaseta xwe ya tunekirinê de serfiraz bibin, zimanê Kurdî û berhemên wî zimanî jî înkâr û qedexe kirin. Loma bi destxistina mafê me yê aborî, çandî, demokratîk û mirovî, bû parçekî bi destxistina navnama xwe ya netewî. Zimanê me him bingeha navnama me, him jî bingeha rûhiyet, hîs û kesayetîya me ye. Ji bo ku em li rûmetên xwe yên mirovahî, netewî, çandî bêtir xwedî derên, siyaseta mêtinkaran vala derxin û rêkoşîna xwe li ser esasekî tebût bimeşînin, pêwîst e ku em bi zimanê xwe yê zikmakî binivîsin.

Pîvana mirovantiya meriv pêwendîyên wî yên civakî ne. Ji bo ku ez mirovantiya xwe pêste bibim û têkiliyên xwe bi civakê re xurt bikim ez dinivîsim. Pêwîstiya gelê me zehf heye ku têke zanîna dîrok, çand û hemû heyîyên xwe yên netewî û mirovî; divê di derbarê mirovahiyê û temamê heyîyên cîhanê jî bîn rohnîkirin. Vê vatînî û berpirsiyarîya li ser milê rewşenbîrên Kurd in. Loma bi Kurdî nivîsandin, her çiqas zor û zehmet be jî, divê em wî kara, mîna parçekî rêkoşîna netewî û şoreşgerî, ji xwe re bikin armanc. Çawa ku nivîskarekî Tirk, Ereb, an Faris bi zimanê xwe dinivîsin, divê em jî bi zimanê xwe binivîsin. Ez endamekî civaka Kurd im; çarenûsa min ya bi gelek alî bi ya gelê Kurd ve girêdayî ye; loma hîs, raman, bawerî û zanîna xwe, divê ez pêşî bi gelê Kurd ve par bikim. Loma min dest bi nivîskariyê kir û bi taybetî ez bi Kurdî dinivîsim.

Kovara Helwest - Pirs: 3 — Tu rewşa edebiyata Kurdî ya nivîskî çawa dibînî? Başt û kêmasî çî ne û ji bo çêtkirinê çî divê?

Xidir EGÎT - Bersîv : 3 - Edebîyata Kurdî ya nivîskî, li gorî ya cîhanê zehf xizan û bi şûnde ye; lê em dikanin bêjin di destpêka gebûnîya xwe de ye. Di vî warî de, bi gavî biçûk xebatek berbiçav heye. Li gorî min, heta ku sero-bin bûna civaka Kurd û têkoşîna rizgarîxwaz berdewam bike, edebîyata Kurdî jî ber be sitewandinê de geşbûnîya xwe berdewam bike.

Edebîyata nivîskî, her çiqas bi giranî li dervî welat aj dabe, bûye serdem û geşbûnîyek di vî warî de jî; li gorî min, ew dê di hundir ax û ava xwe de, yanî li Kurdistanê û di hundir civaka Kurd de bigehê sitewandin û encamek têr û tije.

Edebîyata nivîskî, dewlemendî, delalî û zelalîya zimanê meriv li ber çavê meriv radixe. Tama şêrînbûna zimanê meriv, bi hîsên meriv yê estetik û bedewîyê, bi yê kamiranî û aramîyê re dikelîne. Meriv hînê ramanê û bihevgerêdana ramiyîyek dîyalektîkî dike; meriv hînî xwendin, nivîsandin û axaftinek têkûztir dike. Temamê dewlemendîyên welat û cîhanê yê xwezayî û civakî, kêmanî û pîrsgirêkên wan derdixe holê, balê dikşîne ser estetik û bedewîya çand û hunerê civakê. Li gorî dîtina min, ji mirovekî an civakekê re, tu şaxa zanîne an ya huner, dewsa edebîyata nivîskî danagire. Ez behsa edebîyata “rasgoya civakî” û ya sosyalîst dikim. Edebîyata ku dîyalektîkî raxe ber çavan. Her çiqas edebîyata Kurdî, îro ne xwedîyê naverokê werê be û negehîstibe vê qonaxa girîng, dîsa jî ji bo gavên pêş de pêlêkên pêwîst û giranbûna ne.

Ji bo çêtkirina edebîyatê, merivê nivîskar divê di nav civakê de bijî, çavdêrî û lêkolînê bike; jî bo ku bibe rewşenbîr û perwerdekarê civakê, divê berê ew xwe şagirtê civakê bibîne û pêdivîyan pêk bîne. Her nivîskarekî edebîyatê, divê di mijara xwe de xwendevan û lêkolînerekî baş be. Ger em dixwazin ku em bibin xwedîyê berhemên edebî yê girîng û giranbûna, divê em wergerandina hemû qilasîkên edebî ji xwe re bikin armanc. Her pirtûkeke ku bê wergerandina zimanê Kurdî, mîna ku ji xwendevanên Kurdî re pirtûkekê bê nivîsandin û ew kesê werdigerîne jî dibe xwedîyê zanî û tecrûba nivîsandina pirtûkê.

Kovara Helwest - Pirs : 4 — Ji bo nivîskarên ku bi eslê xwe Kurd in, lê berhemên xwe bi zimanê neteweyên serdest (tirkî, erebî, farisî) dinivîstnin, tu çî difikirî? Berhemên wan yê edebî di nav edebiyata Kurdî de têne pejirandin an na?

Xidir EGÎT - Bersîv : 4 - Nivîskarekî Kurd ku dixwaze di derbarê jîyan û berjewendîyên civaka Kurd de binivîse û bangî gelê Kurd bike, divê bi Kurdî binivîse. Her civak bi berhimandina jîyana xwe re zimanê xwe jî diberhimîne. Taybetîyên her civakê, bi giranî xwe di ziman de rû dide. Gava ku zimanê civakekê ji holê bê rakirin, di jîyana wê civakê ya ramiyî, ruhî, kulturî, hunermendî û hwd. de jî, seqetî, valahî û paşdemayîn çêdibe. Tu zimanê bîyanî nikane heyî, daxwaz û pêdivîyên civakekê wek zimanê wê yê zikmakî bide îfadekirin. Meriv bi kîjan zimanî binivîse, meriv pêwîste ku

bi wî zimanî birame û meriv xwendevanan bi kîjan zimanî zorgayî xwendinê bike, meriv wan bi wî zimanî jî dide ramandin.

Mirov bi kîjan zimanî bixwîne û birame ew dê bi wî zimanî jî bipeyîve. Hela civakek wek ya Kurd ku zimanê wê bê inkarkirin, qedexekirin û bi taybetî bê bişaftin, mirovên rewşenbîr rabin ser xwe û bibên em dê pêşengîyê ji vê civakê re bikin û bi zimanê mêtinkarên bişafker di nivîsandinê de îsrar bikin, bihêlin ku berhemên wan di nav edebîyata Kurdî de bîn pejirandin, bi hemdê xwe an bê hemdê xwe, dibin sedema bişaftina zimanê Kurdî. Ew nivîskarê bi nîjada xwe Kurd, bi armanca ku fêdakê bigehîne civaka Kurd, ku bi zimanekî biyanî binivîse, dibe ku fêda wî/wê li civaka Kurd bê, lê tu têkilîya berhemên wî/wê û edebîyata Kurdî bi hev tune. Nivîskarekî biyanî, li ser civaka Kurd, bi zimanê xwe berhemek nivîsandibe, ma rast e ku em bêjin ew berhem dikeve nav edebîyata Kurdî? Li gorî min na.

Berî ku ez biçim dibîstana tirkî, min bi tirkî qet nizanibû. Piştî ku ez çûm dibistana Tirkî jî, ji bo ku di nav mal û civakê de ez bi Kurdî diaxîfîm, ez hîna bi Kurdî diramîyam, xeyal û xewnê min jî bi Kurdî bûn. Lê piştî ku ez ketim girtîgehê, him ji bo ku bi piranî ez pêwîstî axaftina Tirkî bûm, him jî ji bo ku min hertim pirtûkên bi Tirkî nivîsandî dixwend, hêdî hêdî min bala xwe dayê ku êdî ez bi tirkî diramim, xeyalan datînim û di xewnên xwe de bi tirkî diaxîfîm. Ew pirtûkên ku min dixwendin jî hema hema tevên wan wergerên bi tirkî, yên nivîskar û edebîyata cîhanê bûn. Yanî tirkan ne bi berhemên xwe tenê, bi berhemên biyanîya ku wergerandibûn zimanê xwe jî, zimanê min dibişaft. Evêna werê domand, heta ku di axaftina Kurdî de zimanê min giran bû. Tu carî ne telafûza min bû mîna ya tirkî û tu carî bi qasî Kurdî, min tahm û şêrîniya zimanê tirkî hîs nekir. Tirkî, her tim ji min re xav, bêrûh û bêreng ma. Gava ku min bi tirkî binivîsanda, ji min re çar qata ji nivîsandina Kurdî hêsanîr bû. Lê min dît ku bi zimanê min re rûmetê civaka min, hîs û xeyalê min jî dimirin, loma min ya zor da ber çavê xwe û ji nivîsandinê min xwe bi rastîya xwe ve perwerde kir. Li gorî min, nivîskarên ku berhemên xwe bi zimanê biyanîyan dinivîsin û wan di hundir edebîyata Kurdî de dinirxînin, yan bi tûmî asîmîle (bişaftî) bûne û neçar in, yan ya zor û zehmetî nakin karê xwe û direvin hêsanîyê, an jî xwe dixapînin.

Kovara Helwest - Pirs : 5 — Romana Kurdî çawan dikare pêşbikeve? Rewşa çîrok û helbestên Kurdî yên nivîskî çawa ne?

Xidir EGÎT - Bersiv : 5 - Roman berhemek civakî û netewî ye. Berhema yekîtî û bihevkelandina kultura netewî ye. Romana herî pêşde çûye, ya Fransî û ya Rûsî ye. Romana Fransî, piştî şoreşa bûrjûvazî ku yekîtîya netewî ava kir û di ber dewamiya nakokî û şerê navbêna çînan de, di hundir 50 salan de bi berhevbûn, civandin û parzî-nandinekê gehîşt kemalê. Ya rûsan jî, him bi tesîra şoreşa bûrjûvazîyê Ewropa û kultura wê, him bi pêşveçûna pêwendîyên sermîyandariyê ku gehîşt yekîtîya xwe ya netewî û kulturî, him jî bi tesîra serhildanên gundîya dest pê kir û di hundir 40 - 50 salan de, ew jî gehîşt kamilîyekê; lê bi şoreşa sosyalîzmê re pêş ve çû û geşbûnîya xwe berdewam kir.

Li Kurdistanê jî, hîn em di destpêkê de ne. Ji bo stewandin û kemalîya romana Kurdî, berhemên îro bingeh û zehf girîng in. Divê em li hember roman-nivîsên Kurd gelek bi balkêşî helwest bigirin û em rexnê erênî bikin. Roman nivîsandin têkoşînek netewî - şoreşgerî ya taybetî ye. Nivîskar divê tekoşîna nivîsandinê û ya rizgarîya civakê bi hev re û di hundir mêzînekê de bimeşîne.

Li gorî min, ji bo ku Kurdistan mêtîngehek e û di her warî de bi şûn de maye, loma him roman, him jî çîrok û helbest nivîsandina Kurdî di pêvajoya xwe ya normal de ye. Rewşa çîrok û helbestan ji ya romanê baştir û pêşdetir e. Her şaxa edebîyatê mîna ya din girîng e; lêkolîn, zor û zehmetî jê re pêwîst e. Her merivên wêjekar, divê xwe di analîza rexnê re derbas bikin, kêmasîyên xwe yên teknîkî û rêzimanî rast bikin, perspektîfa xwe dewlemend û berferah bikin, berhemên xwe bi xem û xeyalên mirov, bi estetîk û bedewîya xweza û civakê, hemû cudahî û taybetîyên tişt û mirovan bihûnin û bineqîşînin.

Hîna bandora helbesta klasîk li ser helbesta Kurdî ya îro didomîne. Hinek helbestvanên me gehîştine normên helbesta hemdem, lê hindik û bi kêmasî ne. Di helbesta Kurdî de xizanîya îmaj û razberîyê heye. Divê di hundir ahenga dangan de kompîzisyonek yekser û hevgirtî hebe. Helbesta hemdem ya wezna serbest, bi qasî nivîsandina romanê pêwîst e. Li gorî min tixûbê helbestê, yê novelê jî derbas dike. Helbesta hemdem ew e ku nakokî, cudatî û bêahengîyên mirov, civakê û xwezayê, di hundir girêdanek dîyalektîk û bi ahengekê bi hev bide kelandin. Divê girêdan û pêwendîyên navbeyna mirov (tevlî xeyal, hîs, raman û vîyanên mirov jî) û gerdûnê, di hundir estetîk û delalîyekê de bê neqşandin û bi hevgirtina mijarê re denglêdanek bi hêz û di ahengbaziya deng de helbesta hemdem bê afirandin.

Kovara Helwest - Pirs : 6 — Tu berhemên nivîskarên Kurd yên nûh (yên ku xwerû bi Kurdî dinivîsînin) çawan dinirxîni?

Xidir EGÎT - Bersiv : 6 - Ez berhemên nivîskarên Kurd yên nûh ku xwerû bi Kurdî dinivîsînin, xebatek rizgarîxwaz ya netewî û berdewamîya geşbûnîya edebîyata Kurdî dibînim. Divê meriv ji kêmanî û şaşîyan netirse; bi xebat, tecrûbe û rexna wê pêşkevin. Piştî 12'ê Îlonê, ji bo ku zimanê Kurdî û berhemên wî zimanî, zûtir ji holê radibûn ez di hundir xemgînîyekê de bûm; li him li dervî welêt, him jî li hundirê welêt, bi bizava têkoşîna rizgarîxwaz û avakirina dezgeh û sazandê Kurdî re berhemên zimanê Kurdî gehîştîye qonaxeke werê ku xemgînî cîhê xwe ji hêvîyê re hişt. Di wî warî de, xebatên li Swêd an li tevê Ewropa dibin, xwedîyê rûmetek giranbûha ne. Lê nivîskar, ji bo ku bala gel bikişînin ser berhemên xwe, divê di alîyê zimên û naveroka mijarên xwe de zehf balkêş bin. Mijar, divê xwendevan bi pîralî têkildar bike.

Kovara Helwest - Pirs : 7 — Tu berhemên kîjan nivîskarê cîhanê û yên Kurdan hez dikî, kî tesîra xwe li ser te kiriye û kîjanî nêzî xwe dibîni?

Xidir EGÎT - Bersiv : 7 - Bi rastî, her nivîskarê ku zanînekê bide min, hîsên min tev-rake û min bide ramandin, ez jê hez dikim û li ser min dibe xwedîyê bandûrekê. Her nivîskarê gerdûnî, rastgo, li hember zordaran, alîkarê kedkar, bindest û hejaran ez nêzî

xwe dibînim. Weke E. Zola, V. Hugo, L. Tolstoy, M. Şolohov, E. Hemîngway, J. Steinback, J. London, A. Malraux, P. Neruda, Y. Rîtsos, Mayakovskî, N. hikmet, A. Arif û gelekê mîna wan hisnî taybetî dane min. Nivîskarên Kurdan tev hîsên taybetî didin min.

Kovara Helwest - Pirs: 8 — Tu niha li ser çi dixebitî? Planên te yên pêşerojê çi ne?

Xidir EGÎT - Bersîv : 8 - Ji helbestvanên cîhanê, tirkî, yên Kurd ku bi tirkî nivîsandine min antolojîyek bi wergêra Kurdî û pirtûkek serpêhatîya amade kir û şand çapxanê. Lê mixabin hîn çap nebûne. Mercê ku îro ez tê de me dest nade ku ez li ser berhemek girîng bixebitim. Planên min yê pêşerojê, di destê defret û rewşa min ya pêşerojê de ye. Lê tevî her tiştî, berpirsiyarîya ser milê min, destûr nade ku ez rawestim.

Kovara Helwest - Pirs : 9 — Pirsê me ya dawî jî ev e: Ji bo kovara Helwestê dîtin, û pêşniyazên te çi ne? Tu kovarek ku li ser hîmê munaqêşe û rexneyên edebî bê weşandin pêwîst dibînî an na?

Xidir EGÎT - Bersîv : 9 - Keçek min heye. Min wê hîn xwendin û nivîsandina Kurdî kir. Ji xwendina Kurdî zehf hez dike. Çi pirtûk, kovar û rojnameyên Kurdî dikeve destê wê, bi piranî dixwîne. Gava ku kovarên Helwestê ketin destê wê, piştî ku ew xwendin, ji min re got: “Yabo, ev kovarek pir delal e; min ew eciband! Divê kovarên Kurdî yê welê hebin ku em ji nivîskar, edebîyat û çanda xwe hayîdar bin, em bizanibin ku ew xwedîyê çi berhemane, me çi xwendîye an nexwendîye. Kovarên welê, yê wek min bi piralî perwerde dike! Rewşa wê, mîzampaja wê ewqas xweşik e ku gava çavê min lê ket min xwest ez bixwînim!”

Gelo tişteki ku ez li ser van dîtinan zêde bikim ma(?). Lê dîsa jî ez bêjim: Kovara Helwest ji edebîyat û çanda Kurdî re pêwestîyek girîng bû û di vî warî de valahîyek dagirt. Di kîjan warê cîvakî de be, gava ku gengeşî û rexne çê nebe, şaşî û kêmanî jî zûbizû ji holê ranabe, pêşveçûn, xwe nûkirin û serketin jî zehmet e. Ji bo vê xebata we, ne tenê ez, divê hemû welatperwer, nivîskar, lêkolîner û hunermend ji we re sipaskar bin.

Ez amade me ku berpirsiyarîya xwe ya li hember Helwestê li gorî îmkanê xwe pêk bînim. Ji Helwestê re sipasîya xwe pêşkêş dikim ku destûr da min, ez bîr û bawerîyên xwe yê di vî warî de diyar bikim.

Bi silavên biratî, ji hemû xebatkarên Helwestê re, ji hîsên kûr ve berdewamîya serfrazîyê dixwazim. Bimînin xweş!

Ji bo bersîvên te em sipas dikin. Rûpelên kovara Helwestê her tim ji te vekirîye.

“Mirado” û Folklor

N. Zaxuranî

*B*erîya niha bi çendekî hevalekî hêja kasêta hunermend Mirad ya “ Şerê Bişarê Çeto” ji welêt diyarî min kir. Bi rastî jî, gava ku mirov li vê kasêta hunermend Mirad dihisîne, mirov dibîne bê Mirad çi hunermendekî bêhampa bû di warê vegotina stran, lawik , şerên mêrantî û melodîyên evîndarîyê de. Ji ber vê hunermendîya wî ya bi nirx celadên dewleta tirk ya kolonyalist weke gelek keç, law, bav û kalên me kurdan hunermend Mirad jî di bin darê şkenca xwe de bi awayekî barbar kuştin. Dê herdem hunermend Mirad û hunera wî di tekoşîna tevgera rizgarîxwaz ya gelê me de bijî.

Bêguman, hunermend Mirad ev berhema folklorîk bi zimanekî bi rêk û pêk, bi hevokên hîlbijartî yên li ser hevdu rûkûbî û bi vegotineke bi ahengî şaîrane vedibêje. Mijara vê berhema folklorîk qahramantî û mêrantîya çaxa feodal ya civata Kurdistanê ye. Gava ku mirov li berhemên folklorîk yên ku bi awayê vegotineke heyecana mêrantî an jî qahramantîyê hatine vegotin, guhdaî dike, hinganê mirov dibîne, bê folklorîka me di vî warî de çiqasî dewlemend e. Ji bo vê yekê, ez dixwazim ku di rêzên jêrîn de bi metodeke zanistî hinekî li ser van berhemên folklorîk yên ku bi heyecaneke mêrantîyê ji alîyê stranbêj û hunermendên gelêrî ve tên vegotin, rawestim.

Ev berhemên folklorîk yên ku bi heyecaneke qahramantîyê tîn vegotin, li ser bingehê çalakîyeke hêzekê an jî kesekî qahraman ku ev çalakîya wan an jî ya wî ji pêşeroja netewa wan an jî ya wî, ji vê yekê wîrdetir heta ji bo mirovantîyê gelekî girîng û bi reng çarenosî ye, tê hunandin. Ango, mijara berhemên folklorîk qahramantîya bi heyecan ya bi reng civakî ye. Lewra bi alîkarîya çalakîyeke aktif ya bi reng civakî an jî netewî pêşeroja neteweyekî tê çareser kirin.

Naveroka mîrantîyê bi pîrr alî bi dîroka netewî ya konkret ve tê rapêçan. Ji ber ku amanca vê qahramantîyê ew e ku hêzên dagirker yên biyanî ji xaka welêt bêne qewirandin, an jî di qada jiyana civakî û polîtîkî de hêzên kevneperestî paşmayî ji meydana bêne rakirin û bî saya vê yekê jî bingehê kultureke netewî û gelêrî bê avêtin. Ev yeka ha bi tenê dema ku kes an jî komikên ji rafên gel yên xwedî ceserat xwe ji bo berjewendîyên netewa xwe bidne pêş û vê yekê mîna karmendîyeke xweyî sereke bizanin, dê bikarin rola xwe bi awayekî çê bi cih bînin. Hinganê jî berjewendîyên giştî dibin amanc ji mirovê qahraman re û bî vî awayî jî hemû hêz û irada wî dikevê nava tevgerê de û dibe xwedyê çalakîyên bi reng dîrokî di serpêhatina dem û dewranan de. Bi gotina Hegel “çalakîyên hêzên gelemperî” dibin serçavî ji bo karakter û çalakîyên kesên qahraman ji bo bi hêzkirina “hêza giyanîya” wî bi xwe. Lê, divê newê ji bir kirin ku ji bo geşbûna qahramantîyê di kesîtiya mirovên qahraman de bê li hev civandin, biryara azad û pêkanîna çalakîyên serbixwe gelekî girîng e. Ji ber ku qahramantî bi daxwaz an jî bi tevdêdana kesên din nayê pê.

Lewra bicihkirina kar û barên dîrokî an jî xebata ku doza netewî bi pêşve dibe, anga dema amancên giştî yên netewî dibin mijar ji bo çalakîyên kesên qahraman hinganê mirov dikare bi hesanî naveroka qahramantîya jiyana civakî karakterize bike.

Heçî hunermen de, bi destnîşankirina wesfên serekî yên karakterên qahraman, anga pesindana wan weke mînakên hîlbijartî, berhemên bi heyecan yên mîrantîyê diafirîne. Bêguman, gava ku hunermendê gelerî Mirad “Şerê Bişarê Çeto” li gora versyona xwe vedibêje, Karakterên ku wî di vegotina xwe de afirandine, him bi jiyana civakî ya Kurdistanê re diguncin, him jî pesn û wesfên karakteran bi awayekî bi serketî biqasî ku jê tê xwestin, bi gelek alî şîrove dike.

Mîna ku hunermend Mirad dibêje: “Lêlê Beybûnê xweha minê dêranê rebenê, li te nemayê. De îro sê ro eskerê Mûsîka, Welîya, Neqîba, Gurdelan, Delav û Şêxan û Ramayê jorîn, Ramayê jêrîn, Walîyê Sêrtê, Mûserrîfê Bedlîsê, Qaymaqamê Zoxêû kurê ûnîs Axayê Qûrnaxa. De vaye serê sê roja wana xwe dane ser Qasra Baxemsê, rûniştina ser Hesenê Osman qet û qet ranabin. De lêlê xweha minê dêranê, de rabe ser xwe kar û bara xwe bike, daw û delingê xwe hilke. De emê xwe bavêjin ba Şêxê Zila, bila tevi sofî û miridê dora xwe rabê û neqebeyna Hesenê

Osman û Bişarê Çeto serê çend sala ye, neyartî ye. Wela bila li ser destên van şêxan fasl û nîşanê, de fasla van xweş egîd ,mêr û axalara qet çê nabê xwehê.” Bêguma mirov karê di warê sosyolojîkî de gelek tiştê ji vê vegotina hunermend Mirad hîn bibe. Alozi û tevliheviya ku hingane li civata welatê me Kurdistan hebû, îro rojî zalîtiya xwe li seranserê Kurdistanê di warê hemû jiyanê de didomîne. Ma ne ji ber vê yekê ye ku li başûrê welatê me dîsa Bişarê Çeto, Emerê Gozê û Hesenê Osmanên “me” bi hevdu dikevin û bi saya vê bi hevduketina wan dijmîn jê istifade dibînin?

Lê blê, divê newê ji bîr kirin, gava ku hunermend qahramantiya di rastiya civakî de vedibêje, an jî pêşkêşî civatê dike, divê ku ne bi awayekî rast û rê bê. Pêwîsta ku hunermend qahramantiya jiyanê civakî - ku ew jî nav û deng, hesiyet û şeref e - bi tasawûrên xweyî hur û kûr bi gelek alî biafirîne û bi vî awayî jî fenomenên jiyanê civakî di vegotina xwe de bi îmajan vebêje, da ku bi karakterên mêrantî û çalakîyên wan re bigunce. Bêguman, hingane jî cihê karakterên mêrantîyê ligel jiyanê wan ya civakî bi îmajên hunerî tene hevbeş kirin. Ka em dîsa bi hev re di vî wari de guh bidne hunermend Mirad bê ka bi çi awayî karakterên xweyî mêrantîyê divê berhema xweyî folklorîk de vegotine: “ Lêlê, belê carekê Bişarê Çeto Bakir Emê Gozê : Go, lolo Emero dilê min bi demed e. Siûda mêra ji terafê Rabbê Elamê , ji kenarê Ehedê Wehed e. De tuyê rabê, çixara xwe bipêçe, pakête li tîfinga xwe de. De tu bi xwe dîzanê bê şerê Mala Faro çiqasî zehmet e. Heke ez Bişarê Çeto bim, wê navê min belabê li welatê û memleka. De ez ê nehêlim ku tu wî rihê şêrîn vegerênê bi ser Goza dayîka xwe de. De loylo, de loylo... ” Hunermend Mirad bi vê yekê jî qaîl nebûye. Wî bi awayê vegotina xwe hiştîye ku mêrantîya rastiya civakî di nav rapêçana berhema hunerî de bi karakterên fîktîf an jî di navbera bûyerên ku di serpehatina berhema folklorîk hatine li dar xistin, mîna pêlên derya wanê bilind bibin. Di kîmkîna şerê di navbera Bişarê Çeto û Emerê Gozê de dîsa hunermend Mirad ji alîkî ve dihele ku kîmkîna wî zîz bibe, bipeyve, ji aliyê din ve jî dayîka Emerê Gozê ji me re bi rih û can dike. De ka em bi hev re carekê din guh bidnê : “De li halê mîn û vê xebere. De Emerê Gozê dêhnê xwe dayê va pîrekek ji Qasra Baxemsê tê û dilezîne. Rahîştîye desmalek ji desmalê romanî di destê xwe de dihejîne û ji Emero re dilîlênê. Wela va dîsa dibêje : Emero de lê de, pozberano de lê de, kurê mino de lê de. Hedef û nîşana ber çavê dijmînano de lê de. De tuyê dipçika tîvingê li erdê de. De tuyê nebêjê: Evê hanê kurê filankes axayî ye. Tîvinga ewilî li bin çengê kurê dewletê de. Heta kefenê qiyametê çiqas dengbêjek li dinyayê hebê, da daîm wesf û senedê kurê min bidin di nav ciwamêr û di dîwanê xelkê de, de lawo, de lawo... ” Ez hêvî dikim ku serokê rêxistinên me - çi li başûr û çi li bakur - dev ji hev berdin û mîna ku dayîka Emerê Gozê, Gozê dibêje: Berê tîvingên xwe bidin kurên van dewletên ku welatê me Kurdistan li hev par kirine. Lê, heyf û gelek mixabîn ji dêvla ku berê xwe bidin van dewletên qolonyalîst bi hevdu daketîne. Ma gelo bextreşîyeke ji vê yekê kambax û wêrantir heye? Biya min Na ! Ji ber ku hevdu roj bi roj qelştir dîkin, lê dijmînên kurd û Kurdistanê li xwe xurtir dîkin.

Gava ku dengê dayîka wî bi qêrîn û gazîyeke wehayî bi şewatî dilovan dikeve guhê Emerê Gozê de, Emerê Gozê li dayîka xwe Gozê vedigere û dibilîne: “ Wela carekê Emo go : Lêlê yadê, de lêlê yadê, lêlê yadê Gozê. De minê soza xwe bi Hesenê Osman re dayî ye. De vaye minê destê xwe xistina kelepçê de, minê lingê xwe xistine qeydê de. Wela minê sund xwarî ye divê kozê de. Heke tu bawer nakê, miftê van qeyd û marbeta min şandîye Qesra Baxemsê kirine sebata şarê de. De lêlê yadê tu van xebera nebêje di nav ciwamêr û xelkê de. De heçî ez im, min ji nav û dengê bavê xwe fihêt e. De lêlê yadê siûda mêra ji kenarê rabbê Elemê, mane serê ku hatî, dûrî hezira careke din nakevê dê de. De wela heke ez Emerê Gozê bim, heta ku ez newme kuştin divê kozê de... Ezê gelek laşê baba egîda bikme kevya cadê de. hetanî ku Mala «sayê Kinê li Tora Heverka saxbin, wê herdem wesf û senedê kurê te bidin li nav ciwamêra û di teybê xelkê de.”

Weke ku tê zanîn, ne bitenê naveroka mêrantî ya rastîya civakî, herweha şîrovekirina wan jî çî di berhemên folklorîk de û çî di berhemên edebî de li gora dem û dewranan him versyonên wan pirrtir dibin, him jî awayê vegotina wan tê guhertin. Fîgurên bi reng qahramantî yên di efsana û çîrokan de hebûna xwe heta di berhemên folklorîk de yên serdema me jî domandine. Herçiqas guhertina di wan de roj bo roj wateya (maneya) wan fereh û kûrtir bike jî, ew heta roja me jî bûne nîşana qahramatîya bi reng mirovantî.

Di serpêhatina dem û dewranên jiyana netewî û civakî de pîrsgirêka - çî amanca wê rakirina nîrê bîyanî be an çî jî rizgarîya ji kevneperestîya diktatorên curbicur be - mirovantîyê - ligel hemû astengên netewî û navnetewî - bêtir bi hêz dibe û dibe xwedî wateyên (manayên) dîrokî û rojevî. Wateya wan bi pirranî xwe di berhemên folklorîk, stranên bi reng dîrokî, şer û çîrokên qahramantîyê de û herweha xwe di destan û hikayetên cengê de li dorbera kesîtiya kesekî ku li pêşberî hêzên dagirker ditêkoşe, lê belê di nav rafên gel de ji bo berjewendîyên gel bi awayekî bi rêk û pêk hewl dide, bi gîyan û can dibe. Bêguman ev kes bi biryara xwe tevî / beşdarî vê têkoşîna gelekî diwar dibe û bêtir ku tû kelkê (menfaatê) ji xwe re bixwaze, xwe dike bi gorî ji bo serketina gel di serpêhatina jiyana netewî û civakî de. Weke ku em ji dîrokê hîn dibin, ev kesên gernas, mêr û ciwamêr bi awayekî birewerî dest bi çalakîyên xwe dikin, li bawerî û kevnepêşîyên gel rêz dikin. Ev kesên weha yên rêçenas ji aliyê rafên gel yên curbicur ve tên hiz jê kirin, bi vî awayî jî nav û dengê wan li dorbera wan tê pijirandin. Lewra ev kes xwe li himberî netewa an jî civata xwe berpirsyar dizanin.

Pîrre caran berhemên folklorîk bîrewerîya netewî ya ku di kesîtiya mirovê qahraman de peyde dibe, dest nîşan dike, çalakîyên wî bi wateyeke welatperwerî dinirxîne. Ma ne ji ber vê yekê ye ku hunermend Mirad mirovên qahraman yên ku li pêşberî cendirmên tirkên li ber xwe didin, bi awayekî bi heyecan di berhemên folklorîk de vedibêje? Herweha niviskarê berhema “Cid “ pesnên qahramanê vê berhema xwe yê Rodrigo Diaz de Vivar dide. Ma gelo ji ber çî? Ji ber ku Rodrîgi

Dîaz de Vivar bi awyekî qahraman li himberî dagirkerên ereban şer dike, ji aliyê nivîskarî ve tê pesn dan. Bêguman mirov dikare mînakên weha bi vî rengî ji dîroka Rusan, Faransîyan û ji ya gelê navçê Rojhilata Navîn bide. Ji ber ku têkoşerên mîna Alyoşa Papovîçû Dobrînya Nikitîç ji bo serketina Rusya Kievê berxwedan li pêşberî hêzên biyanî li dar xistina, ev berxwedana wan ji aliyê nivîskarî ve bi gelek alî tê pesn dan. Biya min pesindana wî di cihê xwe de ye. Lewra qahramanên ku di rêzen jorîn de behsa wan hate kirin, li pêşberî hêzên dagirker ji bo pêşaroja welatê xwe ceng dikirin. Ev cenga wan ne bi tenê ji bo kesitîya wan, ji beravajî ji bo berjewendîyên netewa wan bi nirx û paye bilind bû.

Di berhemên edebî yê qahramantîyê de bîr û bawerîyên nivîskarî yê bi reng ideolojîkî ji bîr û bawerîyên hunermendên ku berhemên folklorîk vedibêjin, bêtir ber bi çav tînin xwiya kirin. Di vî warî de gelek mînak hene, lê belê ez dixwazim ku mînakê ji dîroka kevna ya Yewnanîyan bidim. Mîna ku tê zanîn, şairê Yewnanî yê bi navê Pîndar di berhemên xweyî mîrantîyê de, qahramantî bi awireke aristokratî (mîrane) şîrove dikir, lê hevçaxê wî Sîmonîdes cengdarên ku di cenga di navbera Persan (ranîyan) û Yewnanîyan de hatin kuştin, pesnê wan bi awireke demokratîk pêşkêşî xwedevanên xwe dikir. Ma gelo ji ber çî? Ji ber ku şair împaratora Persan mîna împaratorîyeke despotîk û koladar dinirxand, lê dewleta Yewnanîyan mîna dewleteke demokratîk dest nîşan dikir. Vêca, weke ku bi hesanî tê xwiya kirin, hêj ji serdema kevna ya Yewnanîyan têkoşînên netewî / dîrokî yê qahramantîyê bi awirên ji hev cuda yê siyasî û axlaqî dihatin şîrove kirin.

Li welatê me, Kurdistan qahramantîya bi reng netewî / dîrokî bi pirranî di heyama feodalîzmê de hate pê. Qahramantî û mîrantîya ku di vî çaxî de di serpêhatine jiyana civakî ya Kurdistanê de peyde bû, pîrrê caran bûyerên rastî yê ku ji aliyê kesên welatperwer ve li himberî hêzên dagirker - çî di serdema împaratorîya Oamanî de û çî di serdema Komara Tirkîyê de - yê tirkan li dar dixistin. Mînak Seyid Xanê Ker û Elîkê Batê û ed. Bûyera Seyid Xanê Ker û ya Elîkê Batê bûyerên rast yê bi reng dîrokî ne. Seyîdxanê Ker û Elîkê Batê yek ji wan qahramanên ku bi mîranî li pêşberî hêzên dagirker yê ku dixwestin hebûna me ya netewî ji meydana dîrokê rakin, têkoşîneke bêhempa dan. Baş e, divê mirov bi çî awayî bûyera Seyîdxanê Ker û ya Elîkê Batê şîrove bike. Biya min şîrovekirina herî rast û di cihê xwe de ev e: Tevgera netewî / dîrokî xwe di çalakîya Seyîdxanê Ker û ya Elîkê Batê de bi gîyan û can kir. Ango Seyîdxanê Ker û Elîkê Batê bi çalakîyên xwe yê dîrokî derd, kul û meremên gelê Kurdistanê li himberî direndîtîya (zalimîya) hêzên kolonyalist yê tirk bi cih dikirin.

Herweha şairê Rus yê bi navê Pûşkîn, ji bo çalakîyên Petrovê 1. yê bi reng dîrokî ku hingane ji bo Civata Rus gelekî girîng bûn, di şîrên xwe de pesnên wî dide. Ji ber ku bi alîkarîya reformên Petrovê 1. dewleta Rus dibû hêzeke mezin di seranserê cihanê de. Wateya reforman ya dîrokî ji vî yekê dihat. Lewra kultura Rusan ya netewî - çî di warê maddî û çî di warê wateyî (manewî) de - roj bi roj geş û bal dibû.

Lê, çi heye ku qahramantî an jî mêrantîya bi heyecan ne bi tenê ji bo qawrandina dijminên bîyanî yên ji derve ve tê pêk anîn, herweha ji bo têkbirina despot û dijminên navxweyî jî tê bi cih kirin. Vê yekê bi pirranî, mirovên welatperwer yên qahraman mîna karmendîyeke xweyî himwelatî ji razîbûna dilê xwe li pêşberî kevneperestîya nava xwe pêk tînin. Ji bo bi cihkirina vê qahramantîyê divê ku mirov bi cesaret bê, ji vê yekê wîrdetir divê ku mirov bi amancên xweyî sereka ve girêdayî be, da ku di warê ideolojîkî de mirov ji bîr û bawqerîya xwe ya bingeşîn dûr nekeve.

Gava ku haya mirov ji Şoreşa Fransa an jî ya «ngilistanê hebe, mirov dibîne bê di serpêhatîna şoreşa burjuwazî de bê çawa li Fransa jekobenan li himberî kevneperestîya navxwe ya fransî qahramantîyeke bi reng dîrokî li darxistine. Biqasî ku ji pirtûka Milton ya bi navê «Bihîştê Windakîrî» têgihîştin, Milton divê pirtûka xwe de qahramantîya şoreşa burjuwazî ya «ngilistanê bi gelek alî pêşkêşî xwendevanên xwe dike.

Mirovên edîb yên ku serê xwe li ser tevgerên rizgarîxwaz yên gelên çawsawa êşandine, di kar û xebata xweyî edebî de cihekî girîng ji wan re veqatandine. Minak, şaîrên serdema Dekabrîstan pesnê têkoşîna gelê Yewnan ya ku ji bo serxwebûna xwe li dar dixist, didan û bi alîkarîya vê yekê li pêşberî Çarên Rus piştgirîya gelê Yewnan dikirin. Ma ne ji ber vê yekê ye ku Cigerxwîn di şîîra xwe ya bi navê «Heval Paul Robson» de piştgirîya reşikên Emerîkî dikir, an jî di şîîra xwe ya bi navê «Dîyan Biyan Fu» de piştgirîya gelê Wetnamê li himberî dagirkerên Dewletên Emerîka Yê Yekgirtî dikir.

Vêca, weke ku bi hesanî tê xwîyakirin, berhemên bi heyecan yên ku qahramantîyê ji xwe re dikin mijar, hunermend bi alîkarîya wan çalakîyên ku ji bo serketina mirovantîyê xwedî roleke giring in, mezintî û pîrozbayîya wan dest nîşan dike û bi alîkarîya imajên hunerî dihêle ku qahramantîya bi vî rengî di nava raf û çînên gel de bi hemû alîyên xwe bê nas kirin.

DÎ XEBATA WÊJE YÎ DE CÎHE PÊKENÎNE ÇÎ YE?

Adil DURAN

Pêkenîn: dî wêje û hûner de tiştên ku mecburî ne eksê van derdîkeve wek: rexne, rexne lî xwe gîrî û bûyereke bi ramanîyên felsefî tê holê. Mîrov dikare bi hêsanî jî xweştirîn bî nav bîke. Ew jî ev e: dilşewatî, henek, rexne û kendarîyeke bi mane ye. Roja îroyînde bî hêsanî zû digihe gel û wek bahoza guhêrkar û vegûhêrînê bandurek mezîn çê dîke. Di sê gruban de tê dîtin.:

1-) Pêkenîna nîvîsî

2-) Pêkenîna devkî

3-) Pêkenîna xêz kirin.

Ev teşe di nav xwede tên guhurandinê jî...

Ji mêj ve heya îro di gelek pîrtuk, kovar û rojnameiên Kurdî de bî taybetî hin mîjar bi rabestîna pêkenînê têne nîvîsandîn. Têne ziman û bî xêzîkan têne rêşkirin. Mixabin ev berhem gelek jî, ji rêzê derdikevin. Cîvateke kêrn xwendî û nezan jî van tiştan zû guman dîke lê fonksiyona cîvakî a bîngehîn tê inkarkirin û dejenerebûnê rê vedibe.

Ew ko,pêkenîn dî rastîya cîvakî a hemdem de pêşve diçe,dijî zordestî, neheqî yê serhildaneke bi nîşan e û zindî ye.. Di şertên guhêrkar de wek demarek jê nehatîye birrîn bi zanistî di herike û xwe nû ve dike. Di Felsefe û zanistîyê de qanunên civakî tabîetê li gor regeze û serete yên xwe bi rê ve dibe. Rexne li xeletî û şaşîtiyan digire û piçûk dike,dijî neheqîyê asê dibe û pesnê tiştên rast dide û wan rastîyan hildide taxa jorin.

Dema berê,bav û kalên me, li ser erdê perçek kaxiz bi erebî bidîtina rahiştin ew ji erdê radikirin , maçdikirin û qul û qul vêdişartin. Ji ber ku ev “Tabû” yek mislimanan bû bû..

Îro jî nivîsandin û rêşkirinên bi zimanê Kurdî bi wê vacê bêtî analîzkirin têne qebulkirinê. Astengî û dîjminahîya dîjminan yên li ser ziman, ax û neteweyê Kurd dîyare,lê bellê girîngîya wêje, huner û meyana zanyarî jî pêwîste. Em ji bo tiştên han nikarin çavên xwe bigirin,bi taybetî jî dixwazim vî tiştî bi tilî şanîbidim. Mesele dagirtina walahîyan be rehet e,lê nivîsandin û xêzkirina pêkenînê wisa ne bi hêsanî ye.

Yên ku îro vî karî dikin sibê gelek astengan li pêş me de çêbikin, bi zanîn ango bi nezanîn!. Gelo,emê çawa wan ji hev derînin û bi çi rengî,deng û şiklî di nav wêje yê Kurdî de bi cîh bikin?

Ew ko, hûner, wêje û pêkenîn ji bo pêşerojê heyîyeke bakî ye, afirandin û hêlengandin bi çavên rîn û lêkolînên zanyarî, têrzanîna nivîskar ve girêdayî ye. Ji ber ku pêkenîn di şerê rizgarî û çînî de tesîrek tamdarîya xwey û îsotê dide..Lewra, wêjenas N.POSPELOV wisan salix dide." ..berhemên ku tê afirandinê bedewî ya wan bi mutebaqata sê tiştan çê dibe:

a)Teşe b)teşekirina naverok c)fonksîyon.. va bingeh a qanuna bedewîyê ye.." Dîroka gel, jîyana civakî û ramanî ji bo guhêrîn pêşketina mîrov di warî wêje û huner de girîng te girtin.

Pêvejo ya dîrokê de dikare roleke şaş ango roleke rast (pêşverû) jî bi leyîze. Ji ber vî qasî ji bo ronakbîr, hûnermend û nivîskarên welatên mêtîngehkar xêr û guneh û berpirsiyarî gelek in. Divê ew bibin şahîd û berdevkê doza gel û pêvajoyê xwe..Pêkenîn bi tenê kendariya ziwa nîn e. Raste rast êşên dilê me, fêde ya zanînê û bedewîya evînê, aşîti, azadî û bîhnpakîyên taybetî bi me salix dide û dixê nav hîssên me. Divê em pêkenînê ji nav qalibên netewî derxinîn û navnetewî bikin. Ew ên ko bi hizirdanê kendar na kin û bi kendarî yê nikarin hîn bikin, bila dev ji karê nivîsandîna pêkenînê berdîn.

HEVPEYVÎN
Bi Marîa RODÎKOVA re
“Ez Ji Edebiyatê Hez Dikim”

Lokman Polat : Pirs - 1 - Tu dikarî xwe bi xwendevanên me bidî naskirin?

Maria Radikova : Bersîv - 1 - Navê min Maria Radikova ye, û ez redaktorê kovara komela nivîskarên Swêd Författaren - Nivîskar- im.

Lokman Polat : Pirs - 2 - Kovara “Författaren” kînga dest bi weşanê kir û hetanî niha çend hejmarên wê derketine?

Maria Radikova : Bersîv - 2 - Kovara Författaren di sala 1970'yî de dest bi weşanê kir û salê 8 hejmar diweşîne. Ev kovara hîn jî 8 hejmar dertê, lê piştî ku ez bûm redaktorê kovarê - di sala 1993'an de - me form û rêvebirina kovarê guherand.

Lokman Polat : Pirs - 3 - Hûn di kovarê de giranî didin ser kîjan mijaran?

Maria Radikova : Bersîv - 3 - Författaren kovarek komeleyî ye. Bi gotinek din ev ne kovarek kulturî ye, ev kovar bêtir bi pirsên kar û barên nivîskar û wergeran dadikeve. Em li ser pirsên destûrî, serbestiya gotinê û peywendiyên di navbera nivîskar, wergêr û weşanxaneyan dinivîsîn. Em wek

kovar çavdêriya karûbarên komela nivîskaran dikin û her weha di vî warî de çavê me li ser rewşa navneteweyî ye jî. Bo nimûne me hejmara xwe ya dawî de hevpeyvînek bi Emîn Bozarslan re kir ku li Uppsalayê rûdine û destana Mem û Zîn wergerandîye tirkî. Dema ku pirtûk li turkiyê çap bû, hukumatê dest da ser, qedexe kir û weşanvan ceza xwar. Ji boyê me girîngtîre, em nîşan bidin ku neheqîyên li hemberî serbestiya gotinê û çapê çiyê. Ev mesela me hemîya ye.

Lokman Polat : Pirs - 4 - Tu di kovarê de li ser çî nivîs dinivîst? Yanî giraniya nivîsên te li ser çî ne?

Maria Radikova : Bersîv - 4 - Em li ser gelek mijaran dinivîsin. Anuha pirs destûriya dîgîtalê germ e. Ji bo diwariya kontrola destûriya dîgîtalî ew kevnepeşniyara peymana di navbera komela nivîskaran û komela weşanvanan de rabû. Ev pirs destûrî, di her welatî de, ji bo her nivîskar û rojnamevanekî girîng e, nemaze bi pêşdeçûyîna înternetê ve van pirsina em zêdetir taqîp dikin û dinivîsin.

Lokman Polat : Pirs - 5 - Naveroka kovara Helwestê hejmara 6'an li ser Sembolîzm û Romantîzmê ye. Di derheqê Sembolîzm û Romantîzmê de fikrên te çî ne? Di edebiyatê de tu rola Sembolîzm û Romantîzmê çawan dinivîstî?

Maria Radikova : Bersîv - 5 - Författaren ne kovareke kulturî ye ku li ser beşên edebî raweste û pir kêman caran em nivîsên li ser tekstên edebî digrin. Lê wek redaktorê kovara komela nivîskaran, bêguman ez ji edebiyatê hez dikim û ji bilî rojnamevaniya min, ez fil kandê ilmê lîteraturî û dîroka ramanî me. Ez bi dilxwazî di kovarên din de, makalên li ser essayan jî dixwînim.

Lokman Polat : Pirs - 6 - Ji bo xwendevanên kurd gotinên te yên dawîn çî ne?

Maria Radikova : Bersîv - 6 - Kovareke Kurdî ya kulturî baş e. Min dixwest ku ev kovara di nava xwendevanên Swêdî de jî belav bibana û wan jî hayê ji kultura Kurdî hebiya. Û herweha min dil hebû ku Kurdên li Swêdê jî di rojname û kovaran de beşdarî munaqesên kulturî bibyana. Ji bo dîalogeke germ û jîndar danûstendineke weha girîng û pêwîst e.

Têbînî : Vê hevpeyvînê A. Wahab ji Swêdî wergerand Kurdî.

SORGUL yan jî GULASOR

(Romaneke Nû)

Senar ŞAHÎN

Nivîskarên Kurd yên Kurdistana başûr ji alî romannivîsê ve qels in. Hetanî niha tenê sê, çar roman nivîsîne. Kurdên rojhilat dengê xwe nagihîşînin Kurdên perçeyên din. Em tenê dizanin ku Rehîmê Qazî bi navê “Pêşmerge” romanek nivîsiye. Nivîskarên wan yên din roman nivîsîne yan nenivîsîne ez bi xwe nizanim. Kurdên Kurdistana başûrê biçûk hemû jî şaîr in, helbestvan in. Berhemên wan yên edebî ji sedî nodî pirtûkên helbestan û kurteçîrokan in.

Di hêla romannivîseriyê de Kurdên Kafkasyayê -Kurdên Sovyeta berê- û Kurdên Kurdistana bakûr di pêste ne. Erebb Şemo, Eliyê Evdirrahman û gelek nivîskarên din yên Kurdên Sovyeta berê gelek roman nivîsîne. Hetanî van demên dawiyê, berê romanên bi Kurdî yên herî pirr wan nivîsîbû. Niha nivîskarên Kurd yên Kurdistana bakûr her diçe hejmara romanên bi Kurdî zêde dikin. Bi tevahî di hemû perçeyên Kurdistanê de romana Kurdî qels e, kêr hatiye nivîsîn. Lê niha nivîsîna romanên bi Kurdî pir dibe, zêde dibe. Gelek nivîskarên Kurd yên nûn romanên bi Kurdî afirandine û diafirînin. Min bi xwe jî hetanî niha tenê kurteçîrok dinivîsand, lê niha min jî dest bi nivîsîna romanek bi Kurdî kiriye.

Di van demên dawîn de di nav nivîskarên Kurd yê Kurdistanê bakûr de yê ku bi Kurdî roman nivîsandin û weşandin gelek zêde bûn. Demek berê Mustafa Aydoğan û niha jî Suleyman Demir, herduyan jî bi Kurdî roman nivîsandin û weşandin. Min li ser romana Mustafa Aydoğan "Pêlên Bêrîkirinê" nivîsek nivîsand û ew nivîs di kovara HELWEST hejmara 7'an de hate weşandin. Niha jî ez dixwazim li ser romana Suleyman Demir "Sorê Gulê" binivîsim.

Romanek li romana Kurdî zêde bû. Romana Suleyman Demir "Sorê Gulê" her çiqas ji hinek aliyên xwe ve qels be jî, romanek baş e. Ez wî pîroz dikim ku bi kedek giranbiha vê berhema edebî afirandiye. Roman romanek baş e, ji alî naveroka xwe ve -naveroka ku li ser evîndariyê hatiye honandin- delal e. Di vê romanê de evîn heye. Evîna xort û keçek Kurd heye.

Min gava dest bi xwendina romanê kir, romana Çernîşevskî "Çi Bikin?" hate bîra min. Suleyman Demir wek stîla Çernîşevskî nivîsiye, heta mirov dikare bibêje ku metoda romannivîsîna wî bi kar aniye. Di bin tesîra Çernîşevskî de maye. Suleyman Demir jî wek Çernîşevskî, dawîya romanê haniye seriya romanê. Dawî lêhatina çîroka romanê di pêş te be, di seriya romanê de be, ji xwendevanan re balkêş tê û bi vê metodê xwendevan dîkşîne nav romanê. Xwendevan wexta ku destpêka romanê de dawîya romanê dixwîne meraq dike, gelo çibû, çawan bû ku weha bûye? Ev meraq e ku xwendevan hetanî dawiyê romanê dixwîne.

Di romana "Sorê Gulê" de, di destpêkê de dîmenek ji axaftina du evîndaran heye. Ev axaftina wan gelek balkêş e û ev herdu evîndar paşê di nav texsiyê de mirî têne dîtîn. Axaftina herdu evîndaran û mirî dîtina wan di hestê xwendevanan de meraqê mezîn çê dike û xwendevan bi vê meraqê xwe berdide nav romanê û hetanî dawî romanê dixwîne.

Nivîskarê romanê di Stockholmê de diçe şevêkî şahiyê. Li wir vedxwin û govend digrin. Mêrek û jinek Kurd di wê şevê de hevdu dibînin. Ev herdu evîndarên hev ên berê ne. Bûye 20 sale ku hevûdu nedîtine û bi tesadûfî di wê şeva şahiyê de hevûdu dibînin. Herdu evîndar bi hevdu re diaxifin. Nivîskarê romanê gohdariya axaftina wan dike. Mêrik û jinik berê evîndarên hevdu bûne, lê miradê wan neçûye serî. Evîna wan têk çûye. Mêrik ji jinikê re dibêje ku; ev hêj jî ji wê hez dike, hêj jî aşîqê wê ye. Mêrik ji jinikê re pêşniyar dike ku jinik pê re biçe û ew herdu piştî 20 salan bigihêjin miradê xwe.

Lê ji ber ku jinik zewicandiye û zarokên wê hene, pêşniyara evîndarê xwe yê berê qebûl nake. Evîna wan têk çûbû û bi salan wan êşa evînê kişandibûn, niha zarokên wê hebûn û nedibû dest ji zarokên xwe berde.

Pîştê şeva şahiyê ya Stockholmê 6 meh derbas dibe, ew herdu evîndar hevûdu direvînin. Pîştê revandinê jî mehek dibûre, herdu di nav texsiyê de mirî têne dîtin. Nivîskarê romanê pê dihesê, lê dikole, serpêhatiya wan fêr dibe û çîroka wan herdu evîndaran bi metoda romanê dinivîse. Çîroka wan herdu evîndaran li Nisêbînê dest pê dike. Serdar di Lîseyê Nisêbînê de dixwîne, xwendevan e. Gulê jî di Lîseyê de ye. Herdu di yek sinîfek de ne. Dilê Serdar dikeve Gulê. Lê paşê malbata Gulê, wê dide yekî din, didine Seîd.

Di romanê de qelsiya herî mezin xwe di hêla hevokan de dide xuyakirin. Gelek ciyan avakirina hevokan şaş hatiye danîn. Honandina hevokan di zimên de seqetî çêkiriye. Hinek hevok hene ku ji xwe qet nayê fêmkirin.

“Lê tiştêk fam nedikir, wê bi tirkî nizanibû.” Wê bi tirkî nizanibû, yan ew bi tirkî nizanibû. “Abora mala Usivo..” yan “Aboriya mala Usivo...”

Xweşka Gulê, Sêvê û Xalit bi hev re dizewicin. Nivîskar weha dibêje: “Sêvê giha Xalit. Dawetê mezin ji bo wan geriya.” De ji xwe re li hevokê binêrin. Dawet digere yan çêdibe?

Nivîskar qala nûn avakirina Nisêbînê dike û weha dibêje: “Çaxê nû avakiribûn, yek ji malên teref bû.” We ji vê hevokê çî fêmkir? Mal -xanî- bi teref û bê teref dibe? Heger li vir mexseda nivîskar mal nîne malbate, çima dibêje “malên teref”? “Li hêla din, li mala Têliyê, bêdengî serdest bû.” Ma qey serdestî û bîndestî dengî û bêdengiyê jî heye? Di mala Têliyê de bêdengî heye. Vêca serdestî û bîndestî wê çî hewce dike?

Nivîskar kelîmeya -bêjeya- “Kar” jî di nav hevokan de bi xelet nivîsiye. Di şûna ku divê kelîma “amade” binivîse kelîma “kar” nivîsiye. Niha binêrin; “.. xwe ji pevçûnê re kar dîkin.” Mirov xwe ji pevçûnê re “kar” dike yan “amade” dike. “...xwe ji şer û heyfê re kar dîkin.” Divê bigotana “xwe ji şer û heyfê re amade dîkin. Kelîmeya “aşxanê” jî çewt bi kar aniye. Di nav romanê de li gelek ciyan di şûna “metbexê” de “aşxane” gotiye. Di hundirê malê de “aşxane” nabe, metbex dibe. Tirk “mutfak” dibêjin, li cem me jî “metbex” dibêjin. Koka vê kelîmeyê tirkî ye an Kurdî ye, ez nizanîm, lê ez dizanîm ku “metbex” “aşxane” nîn e. Nivîskar dibêje “Sarê li aşxanê diçû û dihat, sifre rû dikir.” Sarê di mala xwe de di metbexê de ye. Yanê li cihek din, li derve, di lokenteyê de nîn e. Û sifre jî tê raxistin, ev “rû dikir” çîye?

Hinek kelîmeyên tirkî bi kar aniye ku Kurdiya wan hene. Wek; “extiyar” “çax” Çima di şûna wan de negotiye “Pîr - kal” û “dem” Binêrin dibêje: “Çaxê Serdar û Meçît çûbûn” “Çaxê nû avakiribûn...” Li vir “çax” di şûna demê de têt bi kar anîn.

Di şûna “zikat”ê de “zika” bi kar aniye. Zik û zikat du kelîmeyên çûda ne. Di romanê de pirr kelîmeya “wilo” bi kar aniye. Di ser û binê hevokan de îlla “wilo” heye. Kelîmeya “zayîn”ê jî ji bo însanan kar haniye. “Di taxa wan de mêrê kê lê xistiye, kî zaye, kî bi xeyd û kî jî bi dilê xwe çûye mala bavê xwe.....” Di Kurdî de “zayîn” ji bo dewaran, bo heywanan têt bi kar anîn. Nabêjin filan jin za, yan jî jina filankesê zaye. Dibêjin welidiye.

Qelsiyek romanê ji ji alî bûyeran ve ye. Roman herîkbar nîn e. Di romanê de bûyer tune ne. Evîna Serdar û Gulê bi bûyeran nayê honandin. Li der û dora wan bûyerên din yên girîng jî naqewimin. Di qalkirina greva karkerên pambuyan de jî balkêş û herikandin tune. Nivîskar çima navê Behîce Boranê û gotinek wê xistiye nav qalkirina beşa sendîqayê? Behîce Boran sendîqevan nebû. Seroka partiyek siyasî ya çep bû. Têkiliyên wê û sendîqan bi hevdu re -ne huquqî û ne jî siyasî- tunebû. Yê sendîqevan di axaftina xwe de dibêje: “Gava em çûn û me sendîqe ji enqera anî, Behîce Boran jî wilo got.” Tu dibêjî qey çûne sendîqe ji Behîcê sendine, Behîcê sendîqayê daye wan û wê gotina xwe gotiye, yanê li wan şîret kiriye, ji wan re gotiye ‘bibin yek’.

Nivîskar romanê di qalkirina zewicandina bav û dêya Serdar de xeniqandiye. Gelek dirêj behsa daweta Ûsivo û Gulçînê kiriye. Ji rûpela 72 heta 102 behsa wan tê kirin, 30 rûpel e. Ev qalkirina 30 rûpelî bûye wek qalkirina çîrvanokek gundiyan. Ji ziman û honandina metodên romanê dûr ketiye.

Navê romanê jî ji min re ecêp hat. Du navên tewandî, du rengdêr di Kurmancî de nayên ber hev. “Sorê Gulê” wek hîtap jî bê mane ye. Ji xwe di nav romanê de di tu cihek de evîndarê Gulê Serdar bangê wê an xitabê wê nake, nabêje “Sorê gulê”. Divê navê romanê yan “Sorgul” bana, yan jî “Gulasor” bana. Yan jî navê romanê tenê “Gulê” bana hîn baştir bû.

Û li ser qareqterê lehengê romanê û li ser tîpên wan kesên ku di romanê de ne nesekinîm. Ew jî bi qewlê Suleyman ve “wilo” ne. Di hêla ramanên netewî de di romanê de tiştek tune. Roman bi mejiyê dema beriya 1980’yî û li gorî wê demê hatiye nivîsîn. Di romanê de leheng -Serdar- û hinek tîpên din- Xalit û hinekên din- xwedêgiravî “komunîst in, çep in” lê çepên çawan in, dîtîn û ramanên wan yên di derbarê pîrsa netewî û sazûmana sosyalîzmê de çi nin qet diyar nîn e. Di hêla fikrî-ramanî de, di hêla felsefîk de romanek gelek qels e. Roman ji alî folklorîk û psîkolojîk ve jî gelek qelse, heta mirov dikare bibêje ku vê hêla wê qet tune ye.

Ëz dixwazim çend gotin jî ji bo weşanxaneyê bibêjim. Sorê Gulê roman e. Weşanxaneya Nûdemê çima li ser nenivîsiye “roman”. Li ser romana Mustafa Aydoğan “Pêlên Bêrîkirinê” jî nenivîsandibûn “roman”. Heger li gor xwediyê weşanên Nûdem ev herdu pirtûk “roman” nînin, divê ew fikr û ramênên xwe li ser van herdu pirtûkan eşkere bike.

Di berga paşîn a “sorê Gulê” de bi îmzeyê “Nûdem” kurtenivîsek hatiye nivîsîn. Dibêje “Di siya evîna Serdar û Gulê de; Demir, rewş û guhertinên herêmeke civaka Kurdî bi rengên xwezayê û bi zimanekî rewan radixe ber çavan.”

Civaka Kurdî yan civaka Kurd? Kurdî navê ziman e, û Kurd jî navê civakê ye, navê netewe ye. Yanê civaka Kurdî nabe, zimanê Kurdî dibe. Nûdem, “Guhertinên herêmeke” dibêje. Di romanê de “guhertina herêmeke” tune. Ew çawan gihîştîye vê encamê? Mirov şaş dimîne.

Dawiya romanê de hatiye nivîsîn “Dawiya pirtûka yekem.” Mirov ji van gotinan derdixe ku berdewama vê pirtûkê hêj heye. Yanê ev pirtûka yekem e, berdewama wê -pirtûka duyem- heye. Heger weha be, çima li ser bergê pêşîn negotîne “Cîld - 1” Wek têt zanîn gelek roman hene çend cîld in û li ser bergê wan yê pêşîn têt nivîsîn cîld 1 - 2 - 3 û hwh.

Na heger ku berdewama vê pirtûkê, anku romanê tunebe wê gavê ev roman romanek nîvçoyê ye. Lewra piştê ku evîndariya Serdar û Gulê bi bextiyarî naçe serî, ew nagêhîjin miradê xwe û Gulê didin Saîd, reaksiyona Serdar çawan çêdibe? Di vê pirtûkê de beylû nîne ku Serdar pê dihesî yan nahesî ku Gulê dane Saîd? Paşê çi dibe? Çi bûyer diqewime? Çima tene Swêdê? Piştî hevdu revandinê çi dibe? Di nav texsiyê de çima mirî tên dîtin? Xwe întîxarê dikin yan wan dikujin û sîsa întîxarê didinê?

Van tiştên ku min li jor behs kir, ez wek balkêşiyek pêşkêşê nivîskarê romanê û xwendevanan dikim. Ez ji van balkêşiyên xwe re nabêjim rexne ne. Dibe ku ez şaş bim, nivîskar rast be. Bi hêviya ku rastî bê zanîn.

* - Sorê Gulê - Suleyman Demir - Roman - Weşanên Nûdem.

ZANÎNA ZIMÊN “ TEWANG ”

Pervîn ŞEREFNAZ

Xwendevanên Hêja

Xanim Pervîn Şerefnaz demekê dûr û dirêj li ser Gramera Kurdî xebitî, lêkolîn kir û pirtûkek gelek hêja amade kiriye. Ev pirtûk dê di nêzde bê weşandinê û bikeve destê xwendevanên Kurd.

Pirsa Tewangê ji bo ku ji alî hinek Kurdan ve baş nehatiye fêmkirin me pêwîst dît ku em vê beşa tewangê a ku di pirtûkê de bû di kovara Helwestê de jî biweşînin. Wek têt xuyakirin gelek Kurd ji bo ku navê tewangê bihistine hema bibêj hemû tiştan ditewînin. Û qaîdeya rêzimana Kurdî xirab dikin. Di zimên de tiştên ku nahên dewandin jî hene. Divê Kurd fêrê wê jî bibin. Vê nivîsê biwxînin hûn dê fêrê gelek tiştan bibin.

Em ji xanima hêja Pervîn Şerefnaz re sipas dikin ku xebatek weha têkûz kiriye û berhemek hêja amade kiriye. Xebatên weha ji bo zimanê Kurdî dewlemendiya herî mezin e.

Kovara HELWEST

TEWANG :

Zimanê Kurdî, zimanekî tewangber e. Ango bêjeyên wî di nav hevokan de weke xwe namînin. Li gor kar û cihê xwe di hevokan de tene tewandin. Tewang bi xwe, bi hin parkîtan çêdibe yan jî di nav gotinan de hin tîpên wê tèn guhertin.

-Ji birên hevokê bi tenê ên guherbar têne tewandin. Ên neguherbar tu caran nayine tewandin.

-Bi gelemperî bêje di hevokê de an kiran? an jî bireser in. Gava ku ew di hevokê de an kirar? in nayine tewandin. Lê gava ew di hevokê de bireser bin têne tewandin.

-Tewanga birê hevokan, herçen yekcar ji hev cuda nabin jî, kêm zêde ji hev biferq in. Tewanga her birî di cihê wî de tete bikaranîn.

TEWANGA NAVDÊRAN

Navdêr, hevenav yan jî serenav bin, li gora mêjer û zayendên xwe têne tewandin. Tewang bi gelemperî bi parkîten jêrîn çêdibin;

Ji bo navdêrên yekejimar û nêr: Î

Ji bo navdêrên yekejimar û mê: Ê

Ji bo pilejimarên her du zayendan: AN

Li jor şirovekirina xwe dixwazim îcar bi numuneyan raberî we bikim, wek: Dema ku em dibêjin "hesp hat, yan jî hesp hatin" li vir navdêr nayin tewandin. Lê dema ku em bêjin;

dengê hêsp

rengê mehînê

qeşengiya jinan

Baş e, piştî ku me numuneyên xwe dan, îcar em vegerin ser babetên tewangê. Gelo tewang bi çi awayî, çêdibe.

BIKARANÎNA TEWANGÊ:

Me got ku tewang dikare bi cûre cûre be, baş e, ew babetên wan çi ne?

1-Tewang: Dema ku navdêrek navdêreke din dide nasîn, têt bikaranîn:

Dengê hêsp Dengê mehînê

Rengê hêsp Rengê mehînê

Dengê hespan Dengê mehînan

2-Gava ku hevok bi aliyê daçekan tete saz kirin navdêr xwe ditewîne, wek;

Li Parîsê

Li Diyarbekirê

Di girtîgeha Diyarbekirê de.

Di gundan de

Ez ji Parîsê tîm

Ez ji malê tîm

3-Heger lêker, lêkereke têper be, bireserê wê lêkerê her dem tê tewandin,

wek:

Ez hêsp dibînim	Ez hespan dibînim
Ez mehînê dibînim	Ez mehînan dibînim
Sînem keçîkê dibîne	Sînem keçikan dibîne

Weke ku li numuneyên jor jî dixûyên di Kurdî de dema ku lêkerên têper di rewşa dema nuha de têne kişandin, wê gavê bireserê wê lêkerê her dem têne tewandin. Ji ber ku wek prensîbeke gelemperî tu caran du pronavên ji yek grubî nayên ba hev. Ji ber ku li dema nuha gruba pronav a ku bi "ez" destpêdike wek kirar? tête bikaranîn divê bireserê wan jî ji gruba duyem ango ji gruba "min" were destpêkirin. Ji bo ku em vê dersê baş têbigiyên divê em numuneyên xwe zêde bikin, wek:

Ez hêsp dibînim ango Ez wî dibînim.

Tu cara nabe ku em bibêjin "ez ew dibînim". Ji ber ku ez û ew herdu jî ji yek grubî ne.

Wek prensîb ew herdu nikarin bên ba hev. Dîsa dema ku em dibên: "Sînem keçîkê dibîne" Ango "Sînem wê keçîkê dibîne". Dîsa ji vê numunê xuyaye ku divê dema ku kirar ji grubeke pronav be, bireser jî ji gruba din dibe û herdu ji grubekê nabin, eger bibin jî ew dê wuha bin "Sînem ew dibîne. Ango Ew ew dibîne" ku tu caran nabe ku bi vî awayî bête gotin.

4-Gava ku lêkerên têper (biborî), di dema borî de werin kişandin, her dem kirarên wan ditewin. Ji ber ku kirar li vir dîsa ji gruba "min" têt bikaranîn, divê bireser jî ji gruba "ez" bête bikaranîn. Wek;

Mehînê ka xwar	ango	Wê ew xwar
Heger em ne tewînin;	dibe	Ew ew xwar. Ku ev ne rast e.
Keçîkê lawik dît	ango	Wê keçîkê ew dît.
Sînemê kevir avêt	ango	Wê Sînemê ew avêt.
Keçikan lawik dît	ango	Wan ew dît.
Zaroyan kevir avêtin	ango	Wan ew avêtin.
Keçîkê sêv anî	ango	Wê ew anî.

5-Gava ku lêkerên têper(biborî), di dema pêşende de werin kişandin, herdem bireserên wan tên tewandin. Ji ber ku weke têt zanîn di dema paşeroj de kirar her ji gruba "ez" dibe ji ber ku ew bi gruba ez û bê tewang dibe divê bireser jî ji gruba "min" de bi tewang be. Divê em baş bizanin ku gruba "min" her dem bi tewang e, lê gruba "ez" herdem bê tewang e. Wek;

keçîk dê sêvê bixwe.

Perwîn dê namê binivîsîne.

Siltan dê berxê bîne.

Zarok dê wî bigire.

6-Gava ku navdêr wek bireserê lêkerek bi tevgerî were nivisîn, wê gavê dîsa xwe ditewîne, wek;
Ez diçim Parîsê
Ez ê te bibim Şamê.
Ez diçim dibistanê.
Ez radihêjim barê giran.

7-Gava ku navdêr di nav hevoka fermanî de bireser be, wê gavê dîsa xwe ditewîne û navdêr piştî lêkerê têt nivisîn. Wek;
Bala xwe bide vê pirtûkê.
Çavê te bila li ser malê be.

8-Hinek navdêrên ku ji tîpa kêteyekê yan ji du kêteyan çêbûne, di tewangê de dengdêr xwe bi "a" diguherînin. Tîpa "ê" têt şûna "a" û tewanga wan jî bi vî awayî çêdibe. Ji wan navdêran hinek ev in;
Aş, êş bajar, bajêr
ba, bê xanî, xênî
ziman, zimên çiya, çiyê
Anuha van gotinan li gor awayên ku me li jor nivîsandiye, bi tewînin, li gor hemû rêzanan em dê wan bi tewînin.
a-Me got eger navdêrekê tarif bike;
Dengê êş, şîweya zimên
Dengê bê, xweşikiya bajêr
Rengê çiyê, firehiya xênî

b-Eger hevok bi aliyê daçekan saz bûbe;
Li êş di zimên de
li bê ji bajêr
li çiyê di bajêr de
ji çiyê ber bi xênî
di çiyê de ji xênî
Weke ku di van numuneyan de diyar in, navdêrên bi vî rengî pir caran parkîten tewangê (ê) û (î) nagirin û tewanga wan di navdêrê de çêdibe.

c-Dema ku navdêr biresera lêkerekê têper be;
Sînem xênî dibîne.
Elî êş dikire.
Semend çiyê dibîne.

d-Di lêkera têper de kirar be; êş genim hêra
-Her çi navdêrên mêjera nêr bin û di nav bêjeyê wan de tîpên "e" û "a"

hebin, dikarin tewanga wan di nava bêjê de be û ew tîpên e û a tèn guher-
tin. Wek; û dibin (ê)

Soro ji kêvir ket.

Gurgîn çû êş.

Balafir ber bi ezmên firî.

Ez li hêsp suwar bûm.

ferzo ji bajêr têt.

Kî li ser bên bû?

Em ji xênî derketin.

Li gor van prensîban, divêt di hevokê de hin navdêrên nêr bê tewang bimînin. Ji ber ku di hemî navdêrên nêr de dengdêrên "e" û "a" peyde nabin. Ji lewra li ba Kurmancên ku li ser vê prensîbê diçin, bêjeyên wek; "kum, goşt, dil, hiş, mirov, mêrik, gir, kur, mîr, mêr, gund." nayîne tewandî. Ji ber ku di nav wan de ne tîpa "e" û ne jî tîpa "a" heye, wek; "ez gund dibînim". Ji ber vê yekê gava ew di hevokê de dibin bireser jî weke xwe dimînin. Piştî ku ev prensîb di zimên de bi cîh bûye navdêrên ku bi tîpên "a" û "e" çêbûne jî, em dikarin di hevokê de bê tewang jî bikarbînin. Ji lewra meriv dikare bibêje;
" ez ji kêvir ketim, ez ji kevir ketim û ez kevirî ketim".

NOT: Ji numuneya jorîn dixuyê ku di navdêrên nêr de meyildariya zimên berbi terikandina tewanga wan a yekejimar e; nemaze şiklê pêşîn, ji lewra her sê şiklên jêrîn rast in wek;

Soro kevirî davêje.

Soro kêvir davêje. (Apê Osman vê tenê rast dibîne û dibêje ên din ne rast in.

Apê dibêje ê rast tenê binivîsîne û ên din nenivîsîne.

Soro kevir davêje.

Gurgîn çû aşt.

Gurgîn çû aş

Gurgîn çû êş. (Rast ev e ên din çewt in)

Balafir ber bi ezmanî firî.

Balafir ber bi ezmên firî. (rast e)

Balafir ber bi ezman firî

Ez li hespî suwar bûm.

Ez li hêsp suwar bûm. (rast e)

Ez li hesp suwar bûm.

Ferzo ji bajarî têt.

Ferzo ji bajêr têt. (rast e)

Ferzo ji bajar têt.

Kî li ser banî bû?

Kî li ser bên bû? (rast e)

Kî li ser ban bû?

Em ji xaniyê derketin.

Em ji xênî derketin. (rast e)

Em ji xanî derketin.

-Dîsa hin navên nêr di dema borî de dema dibin kirar ditewin, wek,

Osman-- Osmên sêv xwar.

Ga-- Gê ka xwar.

Aş-- Êş genim hêra.

Ji ber ku ev navên han li vir temsîliya pronavên gruba "min" dikin û weke têtin zanîn ku ew grub jî her dem tewangber in.

-Lê ew navên han dema ku di dema nuha de kirar bin nayên tewandin. Ji ber ku li vir êdî berpirsiyariya gruba "ez" dikin, wek;

Osman sêvê dixwe.

Ga kayê dixwe.

Aş gênim dihêre.

Di dema paşeroj de jî ew navdêrên han nayine guhertin û tewandin. Ji ber ku li wir jî berpirsiyariya gruba "ez" dikin, wek;

Osman dê sêvê bixwe.

Ga dê kayê bixwe.

Aş dê gênim bihêre.

-Ji ber ku cih û wextê vê dozê ye, ez dixwazim tiştekî li vir zêde bikim û we agahdar bikim, di rûpela 38 an de Reşîdê Kurd ev numune daye. "Navên nêrza ku pişkberên dirust bin di buherkê de nayên guhestin, lê di nuhok û mandê de tên guhastin, wek;

a-Di buhêrkê de; nayên guhastin. Wek;

Soro Xalid xist.

Qenco ga kuşt.

Kurik nan xwar.

b-Di nuhokê de, tên guhastin.

Soro Xêlid dixê.

Qenco gê dikuje.

Kurik nêr dixwe.

c-Di mandê de tên guhestin. Wek;

Soro ê Xêlid bixê.

Qenco ê gê bikuje.

Kurik ê nêr bixwe...."

Li vir divê em li numuneyên wî baş binêrin. Ji ber ku di numuneyên wî de hin cihên ne rast hene. Ji ber ku di numuneya pêşîn de (a) Reşîdê Kurd xwestiye ku li cihê ku tewang bê îmkân e, bibêje tewang na be, ji xwe em nikarin

di wî cihê de li tewangê bigerin. Ji ber wek berê jî min gotibû ku tewang, dema ku du grubên pronav tên ba hev û ji wan yek dibe kirar yek jî dibe bireser mumkun e. Heger ji wan kîjan ji gruba duduyan ango "MIN" be tê tewandin. Gruba "ez" qet nayê tewandin û nabe ku em li wir li tewangê bigerin. Reşîd Kurd di cihê gruba "ez" de li tewangê digere, ango;

Soro xalid xist,---Wî ew xist.

Qenco ga kuşt,---Wî ew kuşt.

Weke em jî dibînin bireserê vir her ji gruba ez e û heger em ji bo wan bibêjin "ew nav li vir nayên tewandin" em ê têkevin çewtiyan ji ber ku ew qet nayên tewandin.

Dîsa Reşîdê Kurd, di nivîsanên xwe de navên mêza dema ku tewandiye her dem tîpa (ê) pê ve zeliqandiye. Wek; di rûpelê 40 î de;

Siltanê berx anî.

Çelekê kurik xist.

Keçikê sêv xwar.

Lê di rûpelê 38'an de di nimûneya xwe de navên nêrza ne tewandî ye û gotiye; "Soro Xalid xist. Qenco ga kuşt. Kurik nan xwar."

Li vê nimûneyê kirarê xwe ne tewandî ye, wî bê ku bizanibe herdu kirarên Soro û Qenco bi anîna tîpa "o" tewandiye. Ji ber ku wî bê zanîn kiriye hevoka sisiyan, ne tewandiye. Heger wî bi zanîn kiribana diviyabû bitewandîna ji ber ew nimûneya jor û ên jêr wek hev in, herdu jî di dema borî de kirar in û çima ên jor tewandîne û ên jêr ne tewandîne.

-Dema ku bi rengdêra îşarekî, bi hawekî din bête nîşan dan, tewang divê wek;

Ez wî mirovî dibînim.

Ez wê jinikê dibînim.

Tu wî kurikê dibînî.

Tu wê keçikê dibînî.

-Navdêrên ku bi tîpa (a) û (e) diqedin, di dema tewangê de dikarin; a-(ê) yek tenê bigirin û bitewin, wek;

Mase, li ser masê.

Çiya, li ser çiyê.

Kite, di nav kitê de.

Çira, çirê vemirîne.

b-Dikarin navdêr weke xwe bimînin û bitewin. Lê dema ku bi vî awayî hatin tewandinê, divê tîpa "y" bikeve navbera navdêr û parkîten tewandinê, wek;

Çira, çirayê vemirîne.

Mase, li ser maseyê.

Çiya, li ser çiyayê. (ev ne rast e)

Kite, di nav kiteyê de.

-Pirejimarên wan navdêran jî, dikare bi tîpek (n) tenê bêne çêkirin, wek;

a-Çira, çiran vemirîne.

Mase, li ser masan.

Çiya, li ser çijan.

Kite, di nav kitan de.

b-Dikare bi (an) jî çêbe, wek;

Mase li ser maseyan.

Çiya li ser çiyayan. (Ne rast e)

Kite di nav kiteyan de.

Çira Çirayan vemirîne.

-Bêjeyên ku bi tîpa "e" temam dibin wek gotinên Sûriye, Franse, Efrîqe, tewanga wan jî dikare wekê prensîba jorîn be, angû (e) ya wan bi "ê" yekê cîh diguherine û bitewe, wek;

Ji Fransê.

Ji Sûriyê.

Ji Efrîqê.

A duyem jî dikare di cihê tîpa "e" de tîpa "a" were û bitewe, wek;

Ji Fransayê.

Ji Sûriyayê.

Ji Efrîqayê.

-Ger nav, veqetandekeke nebinavkirî girtibe, parkîten wangê têtin paş weqetandekê, wek;

Dengê hespekî.

Dengê hespinan.

Mehînekê xwar.

Keçîkekê dît.

Rengê mehînekê.

Rengê mehînan.

Di bajarekî de.

Mehîninan xwar.

Keçikan dît.

-Tîpa "n" di tewanga pirejimarî de, carna wenda dibe, ji lew ra em dikarin bi vî awayî jî binivîsin, wek;

Mehînina xwar.

Ez mehînina dibînim.

-Dema ku navdêr têye nîşan dan û salix dan, dîsa veqetandeka nebinavkirî girtibe, parkîten wê wuha dibin;
Î=Ji bo nêrê yekejimar.
E=Ji bo mêya yekejimar.
ÎNE=Ji bo pirejimarên herdu babetan,wek;
Hespekî sipehî.
Hespine ciwan.
Mehîneke sipî.
Mehînine ciwan.

-Di wexta dengkirinê de, navdêr dîsa xwe ditewîne. Parkîten dengkirinê ev in:
O: Ji bo nêrê yekejimar.
Ê: Ji bo mêya yekejimar.
ÎNO: Ji bo herdu babetên pirejimar.

Lo pismamo!
Lê xwişkê!
Mirovino!
Hevalino!
Dotmamino!

-Rengdêra îşarekî jî xwe ditewîne. Baş e ew çawa dibin. Rengdêrên îşarekî bi xwe "ev û ew" in, dema ku "ev û ew" têne tewandin, dibin;
Vî-VÊ-VAN- Ji bo kes an jî tiştên nêzîk.
Wî-WÊ-WAN: Ji bo kes an jî tiştên dûr. Rengdêrên îşarekî li gora navdêran xwe ditewînin, wek;
Ez vî mirovî dibînim.
Ez vê keçîkê dibînim.
Ez van mirovan dibînim.
Ez wî mirovî dibînim.
Ez wê keçîkê dibînim.
Ez wan mirovan dibînim.

-Rengdêra hejmarkî jî xwe ditewîne, lê heger du navdêr hevûdin terîf dikin bi (ê) ve têne tewandin.
a-) Yekê Gulanê.
Sisiyê Gulanê.
Pêncê Adarê.
Şeşê Adarê.

b-) Bi awayê deh deh; ji 20'an heta 90'î tê tewandin.

Bi awayê sed sed; ji 100'î heya 900'î tê tewandin.

Bi awayê hezarî; heger reqem dom nake xwe ditewînin û herdem jî weke nêrê yekejimar dibin. Ji bîstan bêtir, ji bîst û yekan bêtir, ev tişt ji bo reqemên deh û heya 20'an re ûsa ye û li wir gelejimar e, heger daçek hatibin ber hejmaran, tewang bi (î) dibe wek;

Ji çilî bêtir.

Ji sedî kêmtir.

Ji hezarî kêmtir.

Ji pêncsedî kêmtir.

-Gava çend navdêr didin pey hev herwekî mirov dikare wan navdêran li gor mêjer û zayendê heryekê yek bi yek bitewîne û dikare bi tewandina hinekan jî têr bike, wek;

a-Birayê min vî hespî û mehîne dibîne.

b-Birayê min hesp û mehîne dibîne. Ev herdu jî rast in.

-Navdêrên ku dane pey hev ne ji yek zayendî bin, lê ji yek mêjerî bin, wê gavê navdêra paşîn tenê bête tewandin, têr dike, wek;

a-Ez hesp û mehîne dibînim.

b-Hesp û mehînan xwar-- di wan nimûneyan de herdu jî ji hêla hejmarî weke hev in. Ango di nimûneya (a) de, navdêr herdu jî yekejimar in, di a (b) de herdu jî pirejimar in, ji ber wê jî navdêrek tenê bête tewandin, bes e.

-Navdêrên ku dane pey hev ji hêla mêjerî (hejmarî) ne weke bin, lê ji hêla zayendî weke hev bin, li gor mêjer û zayendên xwe têtin tewandin, wek;

Ez mîhî û bizinan dibînim.

Ez mangeyan û mankerê dibînim.

-Navdêrên ku dane pey hev ji hêla mêjerî û ji hêla zayendî jî ne weke hev bin, wê gavê her yek li gor mêjer û zayendên xwe têtin tewandin, wek;

Ez mîhiyê û keran dibînim.

Mîhiyê û bizinan xwar.

-Navdêrên ku dane pey hev ji yek mêjerî û tevde jî yekejimar in. Lê ew ne ji yek zayendî ne û navdêra paşîn jî nêr e. Ji ber ku di tewangê de bingeh navdêra paşîn e, hukum li mêjerê wê dibe, heger ew ne hatiye tewandin navdêra mê jî bê tewang dimîne, wek;

Ez ê herim keçik û kurik bibînim.

Tu Rewşen û Felemez dibînî?

-Di nav hin bêjeyên ku bi "an" êkê temam dibin, ew "an" ji aslê bêje ye, wek; Rewan, baran, peyman, garan.

Lê di hinan de ew "an" ne ji eslê bêje ye. Li wir ew "an" tewang e. Bi hoya tewangî bi wan ve hatiye girêdan, wek; Serhedan, Botan, Şêrwan, Xerzan, Hevêrkan..ji lewra ev bêjeyên han, bi tu awayî nikarin bêne tewandin. Ji ber vê yekê herwekî mirov dibêje, "Ez ji Rewanê tîm." nikare bibêje; "Ez ji Botanê tîm." ji ber ku eslê bêjeyê "bot" e, "an" a ku pê ve bûye, tewanga gelemariyê ye. Ji xwe gava em dibêjin "Botan" daxwaz, "cih yan jî eşîra Botan" e. Bêjeya "Bot" bireserê cih û eşîrê ye. Ji lewra hatiye tewandin û bûye "Botan". Weke bêjeya "dar". Dema bêjeya "dar" dibe bireserê gotineke din tê tewandin, wek; "pelên daran". Bêjeyên; Serhedan, Şêrwan, Xerzan, Hevêrkan, Soran jî weke van in.

Di vê navê de bêjeya "gulan" rexma ku ji vî cinsî ye tête tewandin. Bi rastî eslê vê bêjê "meha gul" ango "meha gulan" e, ango (an) li vir tewanga gelemariyê ye. Ji lewra diviyabû ku "gulan" nehata tewandin. Lê ev bêje ji rêzê der e. Ji bo wê jî careke din têt tewandin û dibe "gulanê". Bi vî awayî şûna ku bibêjin "meha gulan" dibêjin (meha gulanê).

Pervîn ŞEREFNAZ

GRAMER

(Zanîna Zimên)

Derdikeve!

JI EDEBIYATA KLASÎK HELBESTÊN KURDÎ

Helbestek ELÎYÊ HERÎRÎ



Dîsan ji no eşqa beî
Pirr enderûnim ateşe
Zulfa muzeyyen enberî
De'wa digel xala reşe

✱

Xala li dêmê dil reva
Sed rûh û canim bin feda
Sotim gelo çûm tê nema
Terkim kirin eqil û heşe

✱

Eql û hişim bûne esîr
Dunya ku geh geh tete bîr
Dêm şubheta bedra munîr
Zulfa ji dewrê bên xweşe

✱

Werdan ji nîv zulfan derîn
Şu'la binefşê tê werîn
Bala û qeda erêrîn
Herîyan li ser marê reşe

✱

Dîsane hey tê û diçît
Ehyayê em watan dibît

Wechan mudam nûr jê diçît
Dêm şubhetî şem'a geşe

✱

Şem'a şebistanan ewe
Werda gulistanan ewe
Sirrê tebistanan ewe
Şoxa HERÎRÎ dillkeşe

✱

Ecîb letîf û cindîye
Ezman nezan û rûmîye
Ageh ji eşqbazan nîye
Mest û xumar serxweşe

✱

Serxoşê cama şerbetê
Dêm şubhî şem'a zulmetê
Hûrî ya baxê cînnetê
Serdarê çendîn mehweşe

✱

Mehweş ku westan sef bi ser
Ew hate der misrî di kef
Wan got Elî yo la texef
Meb mirdinê qewî xweşe

Helbestvan Alî BÎÇER

Alî Biçer, di navbera bajarên Yozgat, Çorum, Tokat û Amasyayê de koloniyek e kurdên Elewî heye. Hejmara wan bilind e. Nêzî 300-400 salan e ku li wir bi cîh bûne. Ew ji wir e û di sala 1960 de li gundê Kirk-dilimê ku bi ser Çekereka Yozgatê ve ye, hatiye dinyê. Wî xwendina bingehîn li gundê xwe, ya navîn li Enqerê û lîse jî li Amedê kir.

Ji ber Qanûna Komara Tirkiyê ya 125, di sibata 1981 de hatiye girtin. Dadgêha Awarte ya Enqerê, di serî de fermana îdama wî da. Paşê jî kirin muebbet. Ew 6 salan li zindana leşkerî ya Mamakê girtî bû. Paşê jî, bi dorê, wî ajotin hepsa navendî ya Enqerê, Bartinê, Aydınê, Nazilliye, Eskişehirê û Ermenekê. Bi tevayî 15 salan ew di zindanan de girtî ma. Alî Biçer, di Sibata 1996 de hate berdan.

*Pişt*re, ji ber nivîsên wî ku di kovar û rojnameyan de weşiyabûn, dewletê di heqê wî de dawê vekir. Her wesan dixwestin bi zorê eskeriyê

bi wî bidin kirin. Ji nûh ve wî nedixwest ew têkevê zindanê û eskeriya wan bike. Ji ber van sedeman û pêve girêdayî zordariya dewletê, ew derkete derveyê welêt. Hare cem malbata xwe. Yanî, hinekî jî wî guh da vê helbestê:

...

Ji min bawer bik! Ji welatê xwe bireve!
Rehên xwe rake û li welatekên biyanî bicîh bibel!
Guhdarî bik! Ava sekinî genî dibe!
Lê gava dest bi herikandina xwe bike,
dikare ji bêhna genî rizgar bibel!
Ji bilî vê tu rêyên din tune ye!

...

Û tîr?
Gava neyê bikaranîn, dikare birîndar bike?
Û zêr, an jî zîv?
Ku ji rehên wan neyên derxistin,
ma dikarin ewqasî bi nîrx bibin?
Û tembûra biziman! Ku ne xerîbê te ye,
ku hosteyê wê şikil û reng nediye,
ji êzinvanan re dê nebe êzing?
Tu jî welatê xwe bicîh bihêl,
Û derkev serê giran!
Gava bi bi erdê xwe ve bê girêdan,
Tu nikarî bigihêjî tu bilindahiyên!

(Ji Çîroka Hezar û Yekşev, c 1, r 220, Afa)

Heya nuha pirtûkên wî di bin navê Newroz Çîçekleri, Gül Soylem û Înanç, Aşk ve Düş çap bûne.

Alî Bîçer hetanî niha berhemên xwe -ji bo ku bi kurdî nizanibû- bi tirkî dinivîsand. Lê niha dixwaze fêrî Kurdî bibe û berhemên xwe bi Kurdî binivîse.

ANALÎZ

Edebîyata Kurdî ya devok, têxistina nivîsê û rola Kurdologên ne Kurd

Ahmed ÖNAL

Gelên ku sazîyên xwe yên xwendegehî nîn in di nav wan gelan de edebîyata devokî gelek devlemende û peşte çûye. Prof . O. Vîcevsky ji bo folklorê Kurdî dibêje ku " folklore herî dewlemend e" . Wekî din em di derbarê ku berî nivîsare kurd ê ku xwedî metoda zanîyê û dest avitine çand û bi taybetî edebîyata kurd, zêde zêde ne Kurdin. Nivîsarê bêyanî ye wek sehya (gerok) gelek belge û dewlemendîya Kurda bi dest xwe xistine, nîvîsîne û çapkirîne. Kirîne nav dewlemendîya arşîvên cihanê. Jî wan; A. Jaba, E. Prym, A. Socîn, O. Mann, H. Makas, B. Nîkîtîn, E. Lescot, Th. Boîs, S. Wîkander, D. N. Mac Kenzie û hwd.

Paş şerê Cîhane yê yekemîn Kurda jî ji kale-pîren xwe û ji dengbêjan îstîfade kirin û dest bi komkirîna hazîne ya folklorê xwe kirin. Tê dîtin ku nivîsên mazlum di edebîyata kurdî de di salên 1920 an şunvetir hatine şuxlandin. Di salên 1930 û salên 1940 î de di nav rupelên Hawar, Ronahî û Roja Nû de nivîsarên weki Emir Kamuran û Celadet Alî Bedirxanîyan, H. Cîndî, E. Evdal, M. Resul, «smaîl Heqî Şaweys, Maruf Çîyawok, M. Xal, Cemîl Kenna, O. Celfî, ev folklorê kurd a dewlemend de zêdeyî ya ku peşte tê ber çavan gotinên kal û pîra, sitran û destanên gelerî yê kewnîn. Gotinên pêşya gelek zindîne û tê de zanîyê ya pratîkî heye. Alîye sitran û muzîkê de

neteva kurd gelekî bi ritmikê. Di alîye deng û naverok de cure curene û gelek pir alîne. Sitranên wekî reqs, dilok, evînî, lawik, şer, pahizok, lorî, hevalê, şin, qevîl û hwd. Ew sitran ji bêşigê heya gorê, roj bi roj bargiraniya insanan kurd sivik dike, rewşek moralize û zindive girêdide û dîroka kurd bi devok gîhandîye dema nûjen...

J. Nebez, M. Xeznedar, Pîremêrd û gelek şairên dîn bî hempa dest avitine folklorê kurdî û bî toreke helbestvanî ew dane şuxulandin.

Di edebiyata kurdî de qasî babetên kurdî yê metelok, destanên dîrêj jî hene. Memê Alan, Binevşa Narîn, Xelîl Bego, Bozanê Pîrê, Siyabend û Xecê, Xurşîd û Xawer, Şîrîn û Xoşnaw, Şîrîn û Ferhad, Faxîr û Sitîya û hwd. Ew û gelek destan berê di odayên gundan de dirêj dirêj hatîne qisekirin, dengbêjan îstraye û nesilekî dewra nesilekî din kirîye û ji hezar salan gîhandîne roja îro. Û ode ji hêla rabûne, her kesê kurd xwe daye ser televizyonê û ter ter sitranên tirkî guhdar dibin û sînema ya kû ji jîyan û keseyatiya kurdî dure dinêrin û dixeyîdin. Di vê demêde diji medya nijadperest, pêvîste medya neteva kurd û edebiyatek nivîsî ya nûjen bersîva gel û dujmin bide. Em dibinin ku wan salên davi de gelek tîr û tijî nebe jî xebatên baş û hêvîdar derdikevînin û di jîyanêde rola girîng dileyîzin.

V. Mînorsky, her du bira Profesora Ordîxan û Celîlê Celîl, Fevzî Gazî, Elî Evdîrehman Mamedov, Qanadê Kurdo û hwd. em dikarin gelek edebîyatvan, dîrokzan, romannivîs bihêjmêrin.

Nivîsarên Kurd zêde zimanîne

Em dikarin bêjin ku nivîsarên Kurd zêde zimanîne, an jî edîbên ku bi xwe Kurdî û derî Kurdî dinivîsînin gelekî.

Ez bawer nakim ku, netewek wekî netewa kurd koçber bûye. Ez bawer nakim ku, netewek wekî netewa kurd gor nifusa xwe waqes dîr û dîrej di bin bandora devletên dagîrker de maye û parçe parçe hatîne hiştin. Ez bawer nakim ku, netewek wekî netewa Kurd, xwe bî xwe dujminatîya xwe dike û bike. Ez bawer nakim ku, netewek wekî netewa Kurd ji xwe bîyanî bibe û xwe û xwêre di nav nakokîye sunnî de be, xesudî û fesadîya hevale xwe, cîrane xwe, gelê xwe, dostê xwe bike. Bawer bikin ku Kurd çikas qencîn wêqas jî xîrabîn. Ji bo wê pevîstîya me heye ku xirabîyê, neyartîyê, xesudîyê, kîn û rîka nav xwe, buzza serê xwe em heyane paqîj nekînin, bawer bikin ku yêkîtiya me bi ser nakeve û pêşveçûna me wek meşa gelê be. Bes hemu netew alîye aborî, ramyarî, çand û weşanwanî û bî taybetî edebîyat û xwendîne de gawên gelek girîng avitîne û davejînin. Em bî meşa gelê çî xwelîye lî sere xwe bikin. Edebîyat bi rewşa cîvakî we gîredayîye. «nsanê ku

helbesta nexwîne û nekeve xem û xeyala kê mîrove. «nsane kû ter û ter ro-
manan nexwîne û nêrîn û aso ya xwe nû neke û di pir alîde nenêre jîyane,
jîyana xwe fam neke dî cîvakê de cîye xwe nizanî û kê mîrove. «nsanê kû
dîroka xwe nezani û jî bo guhertîna wê ya pêste nexebîtî, ferqa xwe û hêşîn
gîhayekî ku baharê derdîkeve û payîzê zer dibe û dibe pelax nahêlîne û rola
xwe ya hember dîrokê nîkarî cî bî cî bînî û tora mîrovî bîjî. Ya rastî eve ku
mîrov berî her tîştî xwe bizanî, xwe nasbike, xwe rexne bike, xwe bide nasîn
û bî rumetî û bi nasnama xwe ya zelal derkevî nav mîrovayetiye. Bele dema
ku merîv bî zimanê xwe, xwe nekarî bide naskîrî di wê de çepnîyek
derdîkeve û heye jî.

Der û dora me tijî tijî nezanin. Di nav kurdan de nifusek gelek mezin nezan
hene. Em dikarin bêjin ku gelê kurd gor gelek netewan şunda maye an jî em
dikarin bêjin şunve hatiye hiştin. Bes di nav gele kurd de em dibînîn ku
çikas kêmbin jî revşenbîr, zana û nivîsare kewn ê jîr jî derketine. «bn- el-
Esîr, Şerefname an jî Hecî Halîfa jî behsa wana dikan. Sehya Ewlîya Çelebî
di Wasîyetname ya xwe de dibêje ku " Li Kurdistanê, dema ku min li Begê
Bîdlîsê kîtapxana Evdaxan nêrî gelek kî bala min kişand, b' kurti
muheşem bu û ez ji wêra heyran mam." û ew di kuve diçe behsa we
kîtapxanê dîke û ji behskirina wê têr nabe. Lê hezar car hêyf û mixabin ku
nivîsar bi asanî eserê xwe û bîyogirafiye xwe bi zimane xwe nenivîsîne û ne-
girtine qeleme. Îbn-î Xalîkan (1282) Di beşa dîrokê de, Abdul Fîda (1331)
di beşa Nexş û cografyê de, di beşa dîrok û huquqnasîye de Şerefxanê
Bîdlîsê, nivîsarê Dîroka Osmanî ya yêkemîn "Heşt û Behîşt"an jî "Heşt
Cennet" bi destê «drîs Hakîmê Bîdlîsî (1530)ve hatiye nivîsandin. Zanyar û
şairê zimanê tirkî, şairê mezin Fuzulî(?...1556). Çikas emrê xwe yê zêde bi
caştî derbazkirîye jî disan jî xebatkarê Sosyologa nûjen Zîya Gokalp, roman
nivîsê bi nav û deng Yaşar Kemal, Omer Seyfettin û gelek balkeşin, yê wekî
El - Zahawî (1863- 1936), prensê şairê Ehmed Şewkî (1868-1932), El-
Resafî(1875- 1945), sosyolog Qasim Emîn (1865- 1908), romannivîs El -
Aqqad(1889- 1964), Muhamed Teymur(1892-1921) hwd. bi zimane
biyanî nivîsîne.

Muhammed Merdux Kurdistanî, Raşîd Yasîmî, «hsan Nurî Paşa û gelek
nivîsaren kurd jî lekolinên xwe bi zimanê Farsî nivîsîne.

Tekoşerê wek Vet. Dr. M. Nurî Dêrsimî û Mustafa Yamulkî Paşa jî bi xwe
Kurdin û dîrok nivîserên jîr in. Bes wan jî nivîsen xwe bi tirkî nivîsîne.
Nivîserên ku me wek mînak li jor bi nav kirin, çawa ku bi zimanê zikmakî
nenivîsînê û eseren xwe yen edebî, zanistî, dîrok, huquq û lekolinên cure
cure bi Farsî, Tîrkî, Erebi û hwd. zimanê bêyanî nivîsîne, nivîsaren van
salên davî gelek kes hene ku bi Îngîlîzî, Fransî, Almanî, Rusî, Ermenî
dinivîsîn. Bes li derweyî welêt û bi taybetî li Swêd û gelek cîyên din Kurd bi

zimanê xwe yê zikmakî despekirine û dinivîsîn. Lê ew rewşa jî di guhera dîroka nivîsara kurd de merî nikare ku beje gelek cî digre. Xebatek balkêşe bes merîv nikare bêje ku jî çen gulan bahar hatîye û ronesansa sera ser bingeh girtîye. Bi rastî em dibînîn ku ji Kurda di her demî de zêde zêde nivîsar hene û pir alî û çanda devlemend daye cîhane. Van nivîskaran, helbest, fên, zanyarîyên mîrovayetî, sîyasatmedar, rojnamegerê zîrek jî ji nav Kurdan derketîne û derdikevin. Lê em belko dikarin bêjin wan ji mîrowatîyêre xizmetkirine. Bes hezar car heyf û mixabinek mezine ku em nikarin bêjin wan bi têrayî ji ziman, netew û civaka xwere direkt xizmet kiriye.

Di sala 1960 de A. Jaba li ser edebîyata qlasîk sekinîye û behsa heşt şaîrên devera Hekkarî dike. Ela -Dîn Sicadî jî di sala 1952 de li ser devren edebîyata Kurdî û guherînên derbaz kirîye, 634 rupel û ebata mezin pirtukê balkêş nivîsîye. Di pirtukê de bi taybetî li ser 24 şaîr û nivîsarên kurd berfireh sekinîye û 212 nivîskar jî bi kurtî daye nasîn û bîbliografya wan derxistîye. Em dibînîn ku Ela -Dîn Sicadî bes li ser şaîr û nivîsarên kurd ê rojhilatê Kurdistanê û Kurdistana başur rawestîye. Paşê em dinerin ku M. Resul Xiznedar, Prof. «zeddîn Mistefa Resul û A. Jaba li ser xebata Kurdo-logîye û bi taybetî li ser edebîyata oryantal ravestîne û kemasîyên hev û din temamkirine û bifermaya gelek xwe ê xwendekar kirine. Bes ji wan xebatên heja û zanyar çend kurd û xwendekarê Kurd bi xebirin û xwendine ? Ev pirsgireyeki girînge...

Em li dîrokê dinêrin kû şaîren herî berê yen Kurd di sedsalîya 15 e yêde peyda bûne. Elî Herîrî (1425-1495)- Şêx Ehmed Nîşanî an jî navê wî ye ku di nav gel de tê zanîn Melayê Cizîrî (1407- 1481), Melayê Batê (1414-1495), Mîr Muhemedê Muqîsî jî navê wî ye ku di nav gelde tê zanîn Feqîyê Têyran (1307-1375) tê behs kirin ku ji wan şaîrên ku me behskir berî wan jîyaye. Lê mixabin ew tarîxa ku di derheqa ji dayik buyî anji koç kirina van a cîhane hatîye nivîsîn û nîşankirin mûmkûne ku nerast bî, bo ku nava gelek lekolinvanan de li ser wan nakokî hene, kijan raste kijan xelete gor belgeyên ku di dest medane em nikarin tiştêkî bibêjin. Li ser wê mîjarê Qedrî Cemîl Paşa, Muhammed Şefîk Arwasî Hesenîyê di kovara Hawarê de li ser tarîha dayîkbun û mirina Melayê Cizîrî û gelek şaîren kurd rawestîne û nîrxandine bes xwe ji nav wê keşeye zelal nekirine.

Melayê Batê bi Mewluda xwe balkêşe û tê nasîn. M.B. Rurdenko çîroka Şex Sena dinivîsîne. A. Jaba devra du şaîrên wekî Şex Sena û bi taybetî dest davêje Ehmedê Xanî (1650- 1706) û li ser esera vî ya bi nav û deng destana neteva kurd Mem û Zîn kûr kûr û berfireh radiweste. Ew destana Kurd wergerandine Almanî, Fransîzî, Rusî, Rumenî, İngîlîzî, Ermenî, Erebî, Tirkî û hatîye çapkirin. Xwendekarê Ehmedê Xanî «maîle Bayezîdî (1654-1709) jî li paş xwe gelek helbesten Kurdî yên xweş û balkêş hiştine. Bes ne tenê

helbest, Ferhenga Kurdî- Erebi- Farsî ku nav lê daye "Gulzar" (baxçe yê gulan) jî «maîle Bayezidî amade kiriye û ji bo netevê kurd, Erebi û Fars li du xwe hiştiye. Şerîf Xan (1682- 1748) bi xwe ji ezbeta Mîre Hekarî ye û bi kurdî û Farsî ne helbest û manzum, bi tîpa Nazim xwedî yê gelek edebane. Dîsan Mirad Xanê Bayezidî (1736- 1778) jî gelek şîrên lîrîk li du xwe hiştine.

Disa di wê dewrê de di Bîrca Mîre Hewreman de Ehmedê Texî(1764-?) bi zimanê Kurdî û zarava Goran gelek şêrên lîrîk nivîsîne. Çawa ku dîroknivîsere bi nav û deng Kurdolog Minorsky bas dike, gelek nivîsaren kurd jî hene ku li ser nivîse xwe nav nenivîsîne an jî navekî din li xwe kirine û navên nerastî li ser eserê xwe xistine. Gora ku kurd dibêjin navên "Tekalluş" li xwe dikin û bi wî navî eseran dinivîsîn. Wekî mînak; Şêx Mistefa Berezanî, Xanay Gubadilêrî zêde zêde eserên xwe bi wî navê tekalluş belav-kirine.

Li dîyarên Baban, di dawîya sedsala 18. û serê sedsalîya 19. jîyayê û bi xwe di wê devrê da şaire mîrê Baban Evdîrehman Paşa ye û Mîre şairan Elî Berdeşanî; li ser pehlevanî, evînî, jîyana civake û ramanî de gelek helbest û nivîs nivîsîne.

Nalî (1797- 1855), Salîm (1800- 1866), Kurdî (1803- 1849) helbestên lîrîk, romantîk û bervî nûjenîyê gelek pêngav avitine, nivîs nivîsîne bes xwe ji nav şêrên qilasîk xilas nekirine. Di vê dewre de disan bi nawerok û tîpa tasavufê de gelek nivîsar hene. Wekî, Nakşîbendî Mehvî(1830-1909), Mîrza Rehîm Wefâî (1863- 1950) bi wan navê xwe ye tekalluş di naw xwendewaran de tên nasîn.

Disan di wê demêda çend kesên balkêş hene ku bi edeb û şêrên xwe, di dîle cîwanên kurd de her dem cî girtine û tesîrek welatperverîye daye wan. Şêx Rîza Talabanî(1842- 1910), Hecî Qadîrê Koyî, Edeb, Evdîla Beg, Misba El- Dîvan û hwd. ji wan şairanin û bi taybetî di Kurdistana başur de her xortek welatparêz bi asani şêrên wan helbestwanan girtiye û bingehiya gel kiriye û daye standin.

Edebîyatwanên Kurd yên Jin

Qasî meran zede nebin jî di nav netewa kurd de edebîyatmaderên jîn jî ji nav nivîseran derketine û rola xwe listine. Ew nivîserên jîn gelek caran natine bahs kirin û di nav gelde nehekî liwan hatine kirin. Mah Şeref Xanima Erdelanî (1800- 1847) ku navê wê yê tekalluş Mestane, xwedî Dîvane û li ser dîroka kurdî jî gelek xebatê xwe hene. Sîra Xanima Dîyarbekîrî(1814- 1865), Mîhrebana Berwarî (1852- 1905), Rewşen Bedîrxan ku ew alîyê ramiyarî û nivîsede gelek jinek jîr bu û di sala 1992 an de jî

nav perê kurdewariye koç bu. Sarya Dostkî bi xwe xwedî Dîvane û hezar mixabin ku gelek nivîsen wê jî wekî her nivîsarekî kurd yen berê paş mirina wê nehat parastin, çap nebun û wenda bûne... Bi rastî dema ku bê lekolîn gelek jinen kurd ê nivîsar û şaîr û zanyar hene .

Bê zanîn ku diljenî ya jînen kurd bîngehiya edebiyata kurd sazkeriye. Bo ku jina kurd dil xemgîn e. Dil sotîye û her dem li ser jan û kula derdê civakê û buyerê nehekîye hîşare . Rojên şadi de serê dilane jina kurd kişandîye. Ew berî her tiştî dinalê, direkise, dibe û lorîka distire. Ew ji bo me dibin sitran, helbest, roman. Le kencî, cîvanî û hêjatîya jina kurd dile xort û mêra dipertine û ev dibe bîngehiya edebiyata evînî ye. Azeba kurd hindik li ser xorte kurd distire.? Anjî berxwedanî û fedakarîya jina kurd gelo hindik di edebiyatê da cîye xwe standiya? Em dikarin wan pirs û bersîvan direj bikin, bes gor van rupelên teng ne hewceye!! Bes disa jî jina kurd çima kêmbê dest avitiye pênişê ev mijulbûn û lêkolîn dixwaze.

Bervî Edebîyata Nûjen gavên herî pêşin

Gelek xwendewar, şaîren dema nûjen nasdikin û dizanin. Bes pêvîste disa jî bi dilsozî wan yek û yek nasbikin û ji bo wan lêkolînen kur û dirêj çêbikin. Tê zanîn ku ew wekî antolojî û kar û xebatek ansîklopedî dixwaze. Lê wek minak em ji bo we xwendewarên hêja dikarin ku çend navê wan edîba li wir kifşbikin;

Pîremêrd (Hecî Tevfîk -1863-1950), Emîn Mîrza Kerîm, Zekî Ehmed Hênarî, Faîk Abdullah Bêkes (Bavê Şerqo Bêkes) Abdullah Mihemed Ziwer(1875- 1948), di warê helbesta nûjenî de şaîre herî balkêş û di penusa xwe da hevbeşîya lîrîzme, azadî û zanyarî li ba hew day şuxulandin û jîyanek bi rumet û xebatek siyasetî ajotîye û bawerî bi kesayeta komûnîstîye aniye Abdullah Suleyman Goran (1904- 1963), Ganî Mihemed Şêx Abdulkerîm, Ehmed Mixtar Caf, Hamdî û devra paş wan û şaîren Cîvan; Abdulwahîr Nurî (1903- 1944), Nivîsarê "Ey Raqîp" e Dildar (Yunus Rauf. 1918- 1948), Baba Tahîr, Dilzar û hwd..

Devra Komara Kûrd ya Mahabat e de sê şaîren herî bi nav û deng bal dikşînin. M. Hemîn, Abdurrahman Hêjar (Biraye Şehîd Dr. Seîd Sadîk Şerefkendî ye) û Rehîm Gazî. Di dewra sedsalîya bîstî de xwendewar û mamoste û tekoşerê sosyalîst û welatevînî, helbeswan, polîtîkwan, dirokknas û feylezof Şêxmûs Hesên (Cegerxîn - 1900-1984) hîç jî bîra her kurde kî der nay...

Tê dîtin ku nivîsên mazlum jî di edebiyata Kurdî de di salên 1920 an şunvetir hatîye şuxulandin.

Şoreşa Oktobrê ya Sovyeta Mezin Jîn da Edebîyata Kurdî

Paş şoreşa Sovyetê ya Oktobra 1917, hişyarbuna netewên bindest û peşveçuna zanyarî û rewşenbîre wan, wekî welate kî cînar tesîr li rewşenbîr û ronakbîrên kurd xîst. Wana jî di nav wê hişyarîyê de cîhe xwe stendin û jî bo pêşwebîrîna edebîyata nivîsî ya kurdî bî şîwekî zanyarî, bî metodek nûjen di naw wê atmosferê de cî bûn. Nivîsarên Kurd û yên ne Kurd gelek nivîsaran li Sovyetê û derî Sovyetê gelek welatan de balkêşiyên edebîyata Kurdî bun û li ser xebîtîn, lekolîn kîrîn, mijar bun û rawestîn.

Şoreşa Sovyetê bes li nexşa Sovyete tesîr nekirîye, bê zanîn ku ew tesîr gîhîştîye hemu cîhanê. Nerînek nû, bawerîyek peşeroj û bi kurtî jîyanek anjî asoyek nû peyda kirîye jî bo revşenbîrîyê. Em dibînin ku ew tesîr li edebîyata kurdî jî bûye. Em dikarin bêjin ku kêma an zêde kurd hene di Qafqasyê de û gelekî wan jî xwe di nav şoreşe de dîtine. Alîyekî din ji em welate kî cîranen Sovyetin û çawa tesîra giring li me nebe? Em dema ku lekolîn dikin bersîva wê pirsê bi pozîtîf tê nîrxandin û ya mantiqî jî ewe.

Paş şoreşa Sovyetê kesayetîyek azadi peyda bu û wê revşe xwe berda naw her civakê. Wan buyeran de edebîyata kurd em dinêrin ku nû ve jîn daye. Kurdên me yen Sovyetê zêde bi olek kevnepereştve ne girêdayî bûn. Zedeyî ya wan Êzîdî an jî ateîst bûn. Ji bo wê jî tesîra edebîyata tasawuf di wê edebîyatê de tune bu. Ya ku hebû jî ji naw edebîyata kurdî her çu pakij bu. Bi asane wê kêma be jî di alîye edebîyatê de tesîr li kurdê me yê der - dorê alîye din, parçeyê din jî kirin. Alî kî dîn de jî ev kurdê me yê devra şoreşa Sovyetê, zedeyî yê wan xwedî ramyarî, felsefe û nêrînên Marksîzmê bun. Polîtîkzan bun jî. Ji wan Eterê Şero, Erebe Şemo, Casimê Celîl, Mîkaîle Reşîd, Usive Beko, Qaçaxê Mirad, Wezîrê Nadir, Nurê Polat, Emînê Evdal, Hecîyê Cindî, Karlanê Çaçanî, Emerîkê Serdar, «smaîle Duko û gelek şexsîyete din pir alîde xebat kirine û eseren edebî û ramyarî amede û çapkirine.

Kurdên wergêrvan

Eseren balkêş, bi taybetî gor daxwaz û pevîstîya devre ya gel, gelek pirtuk û nivîsên zimanen bêyanî bi destê kurdan hatine wergêra zimane kurdî. Mînak; Victor Hugo, Gogol, Shakespeare, Daudet, Puşkîn, Gorkî, Tolstoy, Çexov, Lermantov, Dostoyevsky, Marks, Lenîn, Stalîn, Zînovyev, Mao hwd. gelek eser bi zimane kurdî çap bûne. Li Erîvane, Kurdîstana sor û gelek cîya; jî eserê Ermenî û gelek zimanên din jî pir nivîs hatine

wergêrandin û bi kurdî çapbune. Wergerê herî balkêş; Nadoyê Xido Mamedov, N. Esed, T. Mirad, Q. Mirad û hwd...

Di nav Kurdê Sovyetê de cîyê rojname "Rîya Teze" gelek mezine û tesîrek mezin li edebîyata kurdî kirîye. Gelek bend (makale) ên balkêş hatine wergerandin û di navrûpelê rojnamê de cî danê û çapbûne. Em dikarin bêjin ku kowara Hawar û bi taybetî Ronahî yê fêzek girîng ji Rîya Teze sitandine. Di nav rupele Ronahî yê de ji bi asanî ev nêrîna hatîye kifşkirin.

Li Kurdistanê Başur, Dr. Haşîm Dixîrmancî û Nacî Ebaş seyhatname yê berê yê Îngîlîza herî pêşîn vergerandine Kurdî. Îro di Kurdistanê rojhilat û başurde hemû cîldên Mao Zedung, yê Lenîn, Stalîn, Marks, Engels û gelek eserên kilasîk bi kurdî hatine çapkirin. Dîsa pirtukên Yaşar Kemal, Azîz Nesîn, Samet Behrengî û hwd. gelek hatine wergerandin û çapbune.

Diwe, xebata edebîyata Kurdî bê nîrxandî û naye Nureddîn Zaza, Qedîrî Can, Osman Sebrî, Mistefa Ehmed Botî, Reşîde Kurd, Mihemed Emîn Zekî, Refîk Hîlmî, Şakîr Fetah, Omer Amca, Kemal Badilli, Musa Anter hwd. û paş xwe ve ji zarok û nevîye wan bo berjevendiya gelle Kurd arteşek rewşenbîr li du xwe hiştine. Lê em nikarin bêjin ku ev arteş bersîva gel û dûjminen xwe dide...!! Em dikarin bêjin ku îro arteşa me ya rewşenbîrîyê gor bargiranîya xwe gelek lewaze, bi prensîp nîn e. Bo wê ji dernakeve pêşîya gel û ronahîyek giring nade neteva Kurd. Bes ew realîta me bila me bê hêvî neke. Dem xwe nû dike û nûjenî berwe başîyê ye. Berjevendiya gele Kurd îrova kevîren pêşîya xwe gelek gelek rastkirine.

Berî salên '70 yî Çapemenîya Kurdî

Çapamenî kifş û temsîlîya; netew, gel, çand, polîtîk û bi taybetî denge çîna ya ne. Demên ku çapemenîya Kurdî derbaz kirîye, kifşa guherîna polîtîka kurde. Bo ku çap tora helîye her çî heye dixîne ber çavan. Em dikarin bêjin ku çap û weşanwanî têdîtîye.

Em dibînin ku çapamenî û weşanwanî ya kurdî nawenda vê zêdetir li Kurdistanê nebûye. Bi taybetî Stenbol, Baxda, Şam, Tehran, Tebrîz, Beyrud, Erîvan, Moskov, Qahîre herî cîye balkêş bune ji bo çapamenî û weşanwanîya kurdî. Li Kurdistanê jî Mehabat, Silêmanîye, Hawlêr, Kerkuk, Dîyarbekîr bala me dikşîne. Dema nîvîsîna qilasîkî jî Hekkarî, Bayezîd, Cîzîra Botan û Baban navend buye ji bo edebîyata kurdî. Alîye edebîyata tasavufî û diroknîvîse de jî Bîdlîs balkêşe. Bo ku ev herem nawenda polîtîkîne, cî û ware Mîr û Emiranin. Ev jî kifşdike ku peşve çûna edebîyatê yek û yek bi polîtîka yê we tevlîhev nebe jî bes bi hevîre girêdayîye.

Mîqdat Mîthed Bedîrxan, di sala 1898 ê de karbideste herî pêşîne ku rojname Kurdistan dest pêkirî ye. Rojname Kurdî ya ewil li Misîrê bajarê

Kahire yê derxistîye. Li kahîrê, Almanya yê , Rewanduzê, Hewlêrê, «stembolê, Şamê, Halebê ronakbîrên kurd ew çapamenî bi rik berdewamkirine u heya roja îro anîne gîhandine wê bilindayê. Heya di sala 1970 ê de Kemal Fuad wekî berdewamî û cîhgirtina Rojnameya Kurdistan ya ku Mîqdat Mîthed Bedirxan destpêkiriye li Baxda yê deranî.

Jîn(*), Roja Kurdistan, Bangî Kurdistan, Pêşkewtin, Bangê Heqq, Umîdî «stîklal, Dîyarê Kurdistan, Jîyanawe, Jîyan, Jîn, Zanistî, Ziman, Gelawej, Dengî Getî yê Taze, bi tîpên latînî Hawar û rojname bi wêneyî Ronahî, Roja Nû, Bi tîpen kirîlî Rîya Taze (Erîvan), Kurdistan (Komara Kurd ya Mahabat), Haware Niştîman, Nîzar, Awar, Gîr û Galî Mindalanî Kurd, Helale, Niştîman, Hîwa, Hetaw, Raya Gel, Azadî, Bilêşê, Rojê Newa, Bîrwa, Xebat, Çares Kirdini Kişt û Kal, Dengê Kurd, Kurdistan (heftenî bu û li Tehranê 205 hêjmar derket), Hewlêr, Agîrî, Titun, Dicle û Firat, Deng, Dengê Teze, Birayetî, Dengî Memosta, Jîn, Estêre, Ta axî, Gel-î û Pul, Hîşyarî Krekaran, Rêka Yêkîtî hwd. çapên balkêş der çune.

Berî salên '70 yî Çapemenîya Kurdî li Avrupa

Di sala 1949 a li Firansê de Dengê Kurdistan, di sala 1958 heya salên 1970 ê bi navê Yêkîtî ya Komala Xwendewarê Avrupa, bi Kurdî û tîpa herfên latînî rojname Kurdistan dertînin. Disa ew xwendewar salên 1963- 1967 de Hêvîya Welat, 1965- 1967 ê de kovara Çîya çapdikin. Li Îngîlistane, ji alîye K.K ê Kurdîca çapbuye. Li Amerîka yê Yêkîtî ya Komala Xwendewaran di salên 1963-1969 de The Kurdish Journal hatiye çapbûyîn. Sala 1971 de li Avrupa yê Ronahî hatiye derxistin.

Paş 12 îlona 1980 gelek ronakbîrên Kurd koçbun Swed û li wê derê gelek xebatên heja anîn hole û ekola Hawar a delal bi nûwe jîn kirin, pêş de birin û xebatên wan berdewame. Bê zanîn ku nivîsaren Kûrd yên bi rumet, di welatê xwe de bi niheni xebata xwe kiriye, di welate xwe de koçber bûye, mecbur maye ji welatê xwe derketîye. Lê bele welat û gele xwe ji bir nekirîye evîna welat kişandîye û jî xebata xwe dur neketîye û di her firsendê de şunve hatiye welet. Wekî mînak Husên Huznî Mûkrîyanî

Bi taybetî "Weşanxana Kurdîstan" û sazimankarê wê Huznî Mukrîyanî

Bi navê "Weşanxana Kurdîstan" di nav zor, zelp û hejarîyê de gelek rupelên zêrîn çap bûne û gîhiştine nav edebîyata Kurdî. Berî ku Huznî Mukrîyanî

dest bi xebata çap û weşanvanî yê nekîrî bu, di donzde salîya xwe de bajarê Mehebarê bicî dihêle û diçe Meraxê, Tewrîzê, Erîvanê û hwd. welatê derve digerrî, dixwînî, lêkolîn dike li ser dîrok, çapamenî û weşanvanîye. Ji bo dîtîna belgeyan xwe dide ser fêrkirina zman. Zimanê Rusî, Tirkî, Hîndî, Erebi, Farsî, Efganî û îngilîzî fêr dibe.

Weşanxana Kurdîstan bi despêka Husên Huznî Mukrîyanî di sala 1914 de li Almanyayê saz bu. Salekî şunve anî Helepê, paşê jî anî Şamê û demekî kurt de weşanxane gîhand kurdistanê. Bajarê Rewanduz jî bo xwe kir nawenda xebatê.

Mamoste Mûmtaz Heyderî dibêje: "Ew xîzmeta mêjunîvisê mezîn, Huznî Mukrîyanî bo Kurd û Kûrdîstanê kîrye, ne tenê derbarey nivîsîna pareke dîroka Kurdî, belkî li dor rojnamegerî û danana çapxana Kurdî li Kûrdîstanê bi tîpekî rengîn bi çend ruperekan yan bi babetekî kes mafê rasteqîna wî nikarî bide"

Huznî Mukrîyanî yêkem kesbu dîroka Kurdî bi zimanê Kurdî tomar kirîye, nivîsîye û pîranîya wana çapkirîye. Ji wana;

1- Awîrek Bo Paş 1. 2. 3. Berg (cîld), 2- Kurdîstana Mukrîyanî -yan jî Etropatîn, 3- Mejû ya Navdarên Kurda, 4- Dîroka padîşahê Kurd ZEND, 5- Kurd û Nadîrşah, 6-Kurdên Zend, 7- Mejuyên Mîre Soran. Ev heft pîrtuk li revanduzê çap kirine. Pirtuka "Rupelek jî dîroka Kurdîstan" jî li Baxda çap buye.

Berhemên Huznî bi awayekî akademî hatine nivîsandin. Li dor wî hinek rojhilatnasan ev bîr û raya li ser wî gotine;

Prof. B. Nîkîtîn nivîsîye û dibêje: Mamosta Huznî Mukrîyanî daner û dîroknivîse mezine Kurdistanê ye."

Mînorskî Dibêje: Bi rastî ew keda ku Huznî Mukrîyanî jî bo mîllete xwe daye tu wextî jî bîr naçe"

Huznî Mukrîyanî yê Edîb

Huznî mukrîyanî edîbekî qelem rengîne. Helbestwanekî welatparêz û çîroknivîse. Gotar nivîsekî hunermende. Ew kovarên wî diweşandin pîranîya berhemên wî bi gotar û helbest û çîrokên xwe dixemîlandin. Huznî Mukrîyanî, şairekî evîndare, evîndarê welatê Kurdistan û neteva kurde. Di hozanekî xweda wiha dibêje:

Hemu kes mestî camî awî engurin le nafamî
Emîn şeydayî awî badeyekî kurdî huşyarim
Diz û rêgir le nêw baxî weten azadî gulçînîn
Be ah û hesretî bergî gole kurdî gîranbarim
Le çawan xwên bibarîne kê zanît mîletit xewtûm
Be giryan ray perîne xewtuwan ey çawî bêdarim.

Huznî mukrîyanî û rojnamegerîya Kurdî:

Huznî di jîyana rewşenbîrîya xwe de rolekî serekî hebû di warê rojnamegerîya kurdî de. Gelek rojname û kovarê Kurdî bi aşkerayî û nihênî weşandine. Yên ku bi aşkere derxistine evîn;

Zarî Kirmancî: Kovarekî civakî, hunerî, edebî bu. Hejmara yekê di 25-5-1926 an li bajare rewanduzê derxistîye. Ew rojname ta sala 1932 an berde-wam bu. 24 hêjmar jê derçune. Pêngavekî mezin avitîye di pêşxistina hunerê gotarên rojnamenivîsîya Kurdî de.

Kovara Ronakî: Ronakî, kovarekî hefteyî, îlmî, civakî û edebî bû. Hêjmara yekemîn di 24- 10- 1935 an de hatîye weşandin. Hêjmara dawî ku yanzdeh bu di 16- 5- 1936 an de hatîye çapkirin.

Ronahî duwemîn kowara kurdî bû li wilayeta Hewlêrê.

Dengî Gêtî Taze: Kovarekî mangane bû. Gelek revşenbîre kurd yê wekî Tewfîk Wehbî Beg, Şex Hesên beşdarî sazîya kovarê bun li gel Husên Huznî Mukrîyanî. Hêjmara yekemîn di heyva çirîya pêşin sala 1943 de derketîye û 24 hêjmarên mehane jê derketine. Heya çirîya pêşina sala 1945 dom kirîye. 30 îlona 1946 şunwetir jî li Baxda 35 hêjmaren hefteyî jê derketine.

Wekî din jî Husên Huznî Mukrîyanî gelek belge û pirtuk weşandine û dîroka welat û neteva xwe ronahî kirîye. Edebîyata kurdî geş kirîye û peşte birîye. Pewîste ku yad û sed sala pîrozkirina rojnamegerîya Kurdî de Husên Huznî Mukrîyanî, gelek edîbên kurd û kirinen wan neyên ji birkirin. Xebata Husên Huznî Mukrîyanî paş mîna wî (1947) Gîw Mukrîyanî dom kir. Ji bo xebata niha jî çapemenî û weşanwaniya Kurdî de tesîr û bîngêhîyek mezin amade kirîye bo pêşerojê. Di dîrokê de rupelek ku neye dîtîn û wenda bibe , dîrok zelal nabe. Bes dîrok ezberkirin ne, ferbuna dirokê ji bo berjewendîye û guhestina dirokê pewiste. Em dikarin ji bo edebiyate ji bi wê nêrîne binirxînin.

Wekî mînak ku mîn li jor jî dîyarîkir, rojnamevanya Kurdî her tim hatîye qedexekirin, zilm û zora herî dijwar bi hovîtî hêriş dane ser. Em bi rehetî îdea dikin ku nivîsarekî kurd tune ku lêdan û eşkence, zulm û zîndan nedîtîye. Bes wan nivîsên xwe bi rîka dujmin û zulm û zora mehtîngeran zîndan kirine dibistan. Her di zîndanên de jî edebîyata xwe, dirok û zanyariya xwe fêr bûne û geş kirîne. Em dikarin bêjin ku çapamenî û weşanwanîya kurdî bi berxwedanî gîştîye wan rojan.

Em dema ku dinêrîna dîroka çapamenîya kurdî, dibînin ku her dem kovar û rojname yê kurda kêr hejmarin û paş çen hejmaran hatine kurtkirin, car din hatîye dest pê kirin. Ketin û rabûn, rawestî û qedexekirin, berxwedan û jîyandina çapamenî û weşanwanîya kurdistanî her demê de pêk hatiye û hin jî ew buyer di jîyana çapamenî û weşanwanîya meda her dijî.

Azadîya edîb û çapamenîya kurd her bi azadîya kurdistanê ve giredayî ye. Ji bo wê jî gelek nivîsar û entellektûelê Kurd gelek caran penîvsa xwe danîne û çek dane milê xwe. Li çîya û banîye kûrdistanê şer kirine, şehîd ketine, di êrişanda lekolînên xwe wenda bûne, hatine şewitandin, an jî bi dest neyaran ketîne û hatine wendakirin. Tê zanîn ku welatekî ne azad de penîvs azad nabe. Bes gor wan astengan jî bi desten lawen kurd, keçên kurd û xwendewar, nivîsar û edîben kurd bi rik dest ji çapamenîya kurdî bernadin. Ji wir şunve jî serketina rojnamegerî, weşanvanî û edebîyata kurd di dest nivîsarê Kurd, xwendewarê Kurd û netewa Kurd de ye.

Roja îro çapamenîya Kurd, medya kurd ji teknolojiya nûjen îstifade dike. Her çikas netewekek bê devlet bî jî îro xwedî rodyo û televîzyone. Îro Kurd bi wasita Internetê dikarin mesajê xwe yê rojane jî bigîhînin cîhanê.

.....
* Ew nivîs bi taybetî li ser berî 1970'yî hatîye nivîsîn.

Dilên şewitî-agir pêketî Werdê û Gewriye

GABAR ÇIYAN

gabar@swipnet.se

*Z*êriya Sûryanî Werdê (1) dibêje:

"Ez Gula file, dîlbera sûryanî, tayê bi tenê yê ber dilê te me. Min navê xwe ji gul an, bêhna xwe ji tebîetê girtiye. Mîsala xweşikbûnê, benîştê devê helbestvanan me. Ez kaniya helbestan, hezkiriya bilbilan im. Mîn ew dîn kirine. Di dil û li ser zimanên evîndaran im. Hevalê sitêyrikên li esmên im. Rengê min ji evîna bilbil û gulê ye, bi hilma wan ez sotî me û sor bûme. Ez hevalê şevên tarî, sirbarê sirrên dîl-bikulan im.

Ez bi hêviyên kesên hezkiriyên Yezdan li Torê hatime dinyê: Bi duayên keşeyên ruhanî û rihspî; pîrên rûspî ku berên wan lalêşa pîroz e, cihûwan ku berê wan li Musayê çiyayê Tûr ê ye û seydayên hêja ku bi zanîna Ehmedê Xanî perwerde bûn e, mezin bûme. Ji kehniyên wan ez têr av bûm e û bi wan heme.

Lê dayikê! Bê miradê! Te xewa şevan li xwe xeram kir û ez mezin kirim! Were li nik min rûn e. Ez ê serê xwe deynim ser paqên te, di ber çîrok, lorî û stiranên te yên kezepşewêt de herim nav xewn û xeyalên kevn, yên zaroktiyê: Bibim heval ji Mem û Zînê, paşê ji Îştar û Temmuzê (2) re. Û dayika min, min baş hemêz bike, bila germa te bedena min dagir bike.

Lê dayikê, hejarê, bêmiradê! Tu ku evîndarê şêrê Tora evdînê, Ûsif î. Ûsif ku hesin bi sarî dicût. Dijminê êvaran e û piştî te zewac û xewên şevan li xwe heram kiriye. Dîn bûye û bi çol û çiyar ketiye. Bavê te ku evîna we nedît, te kir qurban û bi bavê

min re zewicand. Lê dayê, li te nemayê! Bedena xwe ya bavê min, lê dilê xwe bi Ûsifê çavreş ve girêdayiyê. Çawa çêdibe ku tu dike min jî bi agirê xwe bişewitîne?! Dilê min û Gewriye (3) ji hev vediqetîne û layiqî çepelê pîs, bêvilmezîne Melkê (3) bibîne?!"

Dayika Werdê, hêstirên ji xwîne dibarîne. Serê Gulê datîne ser paqa xwe. Pora Werdê ta bi ta dihûne û dibêje:

"Werdê, Gula min, perîya ku Mesîhê Meryemayê ji bo min mîna xelat şandî! Qet çi kesan qala salên xelayê ji te re kiriye? Birçîbûn û tîbûn çiye, tu qet zanê? Dema şîr di sîngên min de nema, çikiyan, tu giriya bû, ez jî bi te re. Dema ku min berû kirin ard û tevî avê kir, da te, qet tê jibîrkirin? Roja ku kereng û parpar li mal hebûna, beroş bikeliya, cîhan dibû ya mirov. Rojên reş, salên "Seyfo"! Ku dawîya şikeftên tarî, qeboyên dêran ji me re dibû sitar. Di pey me hespên Romê, kenê jon-tirkan! Û di bin tîrsê de, tîrsa kuştina te, ya min û ya me. Di tengasiyê de jî hezkirina te, li ser jiyana min bû. Ma tu vê yekê qet zane?

Delala min, ji te we ye dayika te nezan e, nexwende ye. Lê zanîbe ku her tayê sipî di nav pora min de, tecrûbeyek e, şahidê jiyane ye. Lê li vê cîhana bêbext ku mêr lê hikum dikin, tecrûbe pere nakin, dibin sirr û kul, û bi mere tîr heta gorê. De ka bêje, ez rebena xwedê dikarim çi bikim?! Çawa te ji vê tengasiyê derînim? De rabe delala min, bêje erê, biya bavê xwe bike."

Gula file ji peyvên dayika xwe bi jehrî dikeve. Pêyvên wê dibe kul û keser û xwe berdide ser dilê Werdê. Gulê çavê xwe digire û devê xwe vedike:

"Birîna ku te di dilê min de vekirîye, Şerbêlê Ezîz (4) nikare derman bike. Ma tu nizanê min sund xwariye; li Qartmînê, li dêra Mor Gabriêl li ber abîdeya bi xwîn ya Mesîhê Meryemayê; li Ernasê, bi can û cesedê Mor Quyaqos (4); li Mêrdînê, li dêra Mor Hananya bi bîranîna diwazdehezar şehîdan; li Nisêbînê, bi Incîla rehîbika delal a Ziyane (4); li dêra Umro ku di dilê Tora Evdînê de cîh digre, li ber gora Mar Samuel û Mar Şemun (4), ku qedera min dê neşîbe ya te. Ku ez ê bedena xwe bidim ber berên tîvinga û laşê xwe bidim ber kêr û xenceran, lê teslîmî Melkê nekim. Ku ez ê kila bikşînim çavên xwe û kirasê xwe yê pel-pelî berdim ser bedana xwe. Ez ê bazdim, bigihêjim delalê dilê xwe. Ez û Gewriye dê hevudû birevin û xwe bavêjin çiyayê jorîn. Ku ew ê kembera min veke, ez ê cotê zer memikên xwe jê re bikim zozan. Ku ew ê min maç bike, ez ê wî biguvêşim heta hestuwên vî vala bibe. Stêrikên li esmên wê bibin şahidê zewaca me. Yezdanê li jor dê me efû bike. Lê dayikê, bêaqilê! Ez ê sîng û berê xwe î jî penîrê Cizîra Botan sipîtir, hiriya Torê nermtir, lêvên xwe ku ji teraqîyên Bûnisrayê sortir û şêrîntir, sîngên xwe ku ji ava Serê Kaniyê xweştir, serên memikên xwe ku zeytînen Dêrika Çiyayê Mazî bi team-tir, ji bilî Gewriye pêve dê nespêrim çi keseke din."

Dayika wê bi tîrs e. Dijayetî nekiriye. Ne jiyaye. Çi gotine, wê pejirandiye. Bi evîna Ûsif dişewite, lê deng jê dernektiye. Careke din dibêje qîza xwe, Gula file:

"Gula min, kevoka dayika xwe. Ma tu nizane bavê te li ber destê Xwedê û keşeyê gund soz daye? Ku tê here mala Melkê, jê re bibe jin. Reva te, rêya rijandina xwîne dê veke. Were biya keşe bike, bi du aqilê xwe de neçe!"

Gulê serê xwe dihejîne û dibersivîne:

"Lê dayike, li te bextreşê û bedenfirotiyê! Tu çawa jiyanek mirî layiqî min dibîne? Tu çawa dixwaze ku çepelê pîs, li ser sîng û berê min evdala Xwedê di nava zewqê de xerk bibe? Gava ez negihêjim ezîzê ber dilê xwe, fermana keşan û heramkirina dêran li min, qet nîrxeke nake. Ez ê rabim vê sibehê xeberê bigihêjim delalê ber dilê xwe. Bila min birevîne, bibê devereke bi dilê xwe!"

Gulê, adinî rojê bi berbenga serê sibê re rabû ser xwe, kirasê xwe ê pel-pelî berda ser bedena xwe û berê xwe da mala hezkiriyê xwe.

Gewriye di xew de bû. Wê hêdika dêvê pacê vekir û jê re got:

"De rabe hêjajo, tu hêjayî. Tu şêrê Tora Evdînê, şêrînê ber dila î. Rabe vê sibehê, destê xwe bide destê min, em birevin, xwe bigihêjin çiyayê Bagokê, paşê jî Cudî. Em herin Çolamêrik, gundê Koçtanesê. Em xwe bavêjin bextê petrik. Em dê bêjinê; qurban em ketine bextê te û Xwedê de. Rabe fitûkê ji me re derîne, keşeyê gundê me bisekîne. Gava tu nesekîne, em dê herin Birca belek, hawara xwe bigihêjin, Mîrê Botan, bermaliya Bedîrxaniyan. De rabe, rabe. De rabe. Ezîzê ber dilê min, lo lo..."

Herduwan dest da hev û berê xwe dan çiyayê Bagokê. Bûn mêvanê gundek fileyan.

Bavê Werdê ber bi nîvro tê digihêje ku qîza wî pey Gewriye ketiye. Bi beza hawarê siwariyên xwe bi çek û rext dike. Pêşî berê xwe didin mala bavê Gewriyê. Malbata wî pir hejar e, ne belakir in. Lê bela tê ber nigên wan. Du birayên Gewriye û bavê wî li wir tîn kuştin. Paşê siwarî didin pey şopa herdu evîndaran. Ne sax, lê cendekên wan hatiye xwestin.

Li gundê fileyan hawar e. Delal derketiye ser olîyê, xaniyê dutebeq û dike hawar: "Ji aliyê çiyayê Bagokê nêzî 50 siwariyên bi çek tîn ber bi gund ve. Xezep ji wan dibare."

Pêşî keşeyê gund bi siwariyan re qise dike. Dixwaze nava wan nerm bike, evîndara bigihêjîne hev. Lê siwarî lê guhdar nakin. Ya dê gund bişewitînin, an jî serê Gewriyê divê teslîm bikin.

Gewriye îcaza xwe ji keşe û mezinên gund dixwaze. Ji wan du tivink, turek ber, qeyd û zîncîrêkî dixwaze. Û bi Werdê re berê xwe didin çiyayê Cudî, cihê sitarê. Gulê, pir westiyaye. Serê xwe datîne ser paqa wî û di xew ve diçe. Der û dora wan tê pêçan, çi cihê revê nemaye. Dengê teqe-reqa fişekan bi ser ser çiyayê cudî dikeve.

Gewriyê radije qeyd û zîncîrê. Aliyekê qeydê dawêjê nigê xwe û aliyê din di darê tehtê de dixilqîne û kilîlê (miftê) davêje û gazî mala xezuranê xwe dike:

"Min ku rêz û hurmeta we girt. Min ku qet nedixwest xwîna kesê file birjînim. Hûn ku nikarin evîndaran fêhm bikin. Ez sund dixwim bi sunda mêrên fileh ku bi Mesîhê Meryemayê dîkin, bi sunda seydayên kurd yên misilman ku bi serê Ehmedê Xanî sund dixwin, bi sunda cihûwan ku bi Musayê Tûr ê sund dixwin û bi sunda mêrên Êzîdî ku serê xwe didin û sira xwe nadin, ez dê qeyda nigên xwe venekim heta ku xwîn mîna avê neherike û ez vî cihî ji wer nekim goristan!"

Şer, du şev û du rojan dom dike. Gewriye qet raneza ye û nexwestiye Gulê ji xew şiyar bike. Lê di dawîya roja diduwan de, bêtaqet dikeve. Wesan gazî Gulê dike: "Zeriya Torê, Gula nav civatê. Werdêya min, tu rabe ser xwe û li me temaşê bike. Ev du roj û du şev in ku şer e û ez raneketime. Tu rabe ji xewê û bibîne, min du birayên te û 17 segên bavê te kirin qurban, di oxira te de. De rabe, rabe. Rabe delala ber dilê min, rabe!"

Gulê ji xew şiyar dibe. Dibîne ku nigê Gewriyê qeydkirî ye û qeydê, nigên wî birrî ye, xwîn jê tê. Nema xwe digre û radije tivinga din û hêrîşê dibe ser bavê xwe.

Gava bavê wê çav li Werdê dike, biçûkbûna wê tê bîra wî. Kirasê wê yê rengo rengo. Beza wê, peyvên wê yên şerîn. Û xweşikbûna wê. Pora dirêj mîna Dicle û Firatê. Keserek kişand bavê wê, ji bo bêaqiliya xwe. Axîna diduwan ji ber fişeka wê bû. Bavê wê, ji eniya xwe berek xwaribû û cendekê wî li erdê gêr bibû. Piştî kuştina bav bi destê qîzê, hêrîş mezintir dibe, hemû dever dibe toz û dixan. Ji bo cara dawî Gulê li Gewriyê dinêre. Gewriyê dev bi ken bû, lê kenek cemidî, bêrih bû. Serê wî xiliya bû û pêşiya wî bibû gola xwînê. Ji ser sînga xwe berek xwaribû. Dema Gulê zivirî, guleyek kor hat û berê xwe dabû wê jî. Serê wê jî xiliya. Destê xwe dirêjtî ser çavê Gewriyê kir, bi lêvên xwe rûwê wî maç kir û bi çavên qerimî li esmên nêrî.

Di şûna herdu cendekên evîndaran de çend dilopên xwîne mabûn. Ew dilop bubûn du kulîlk. Bîhn dabû çiyayê Cudî. Bubûn kanî ji helbestan re, ji helbestavan re. Gewriye û Werdêya file, bûn du stêrik û firiyan esmên. Di şevên tarî de kêfxweş dibin, dilxweş dibin her ku du evîndar li welatê Torê digihêjin miradê xwe.

- 1 Werdê navê jinan e, bi suryanî û erebî ye. Bi kurdî tê wateya Gulê
 - 2 ştar û Temmuz di mîtolojiyê de du evîndar in. Li cem Asuriyan sembola mêranî, berxwedan û bereketê ne
 - 3 Navê mêran in. Bi suryanî ye.
 - 4 Qencê xwedê ne, berpisriyarê olî ne. Bi eslê xwe suryanî ne.
- Ev kurtserpêhatî, li ser stirana hunermendê mezin yên suryanî Mamoste Gabriel Esad hatiye avakirin.

Têgihiştina Çernîşevskî Ya Estetîkî (*1)

George PLEHANOV
Wergêr : N. ZAXÛRANÎ

Çernîşevskî dibêje xweşiktî jiyan e û bi alîkarîya vê danasandinê derxikeke / kulîlke ku dipişkîvibe, bê mirov çima jê hiz dike, hewl dide ku şîrove bike :

Di derxikan / kulilkan de ya ku li xweşîya merivî diçe, jiyanekê têr û tijî ji hêz û xûlase ku delaletî rengê taze, dewlemend û rengînbûna şikl e. Derxikeke / kulîlkeke ku diçermise, kirh e, derxika ku xulasa wê kêmbê, li xweşîya meriv naçe.

Ev heta bi cihekî mutalake gelekî bi marîfet û rast e.

Lê ji te re zehmetî : weke ku tê zanîn, qewmên hov, mînak: Boşîman û runîştvanên Awustûralya yên ku di eynî konaxa geşbûnê de bûn û “ wahşîyên “ din, li gel ku nevcayên ku lê bi cih û war dibûn ji alîyên kulilkan ve gelek dewlemend bûn, qet bi kulilkan nedihatîn xemlandin.

Lêkolînên dawî yên di etnolojî de didin diyar kirin, ku qabîleyên li jor behsa wan hat kirin , mutîvên xeml û xêza xwe bitenê ji cihana heywanan digrin, didin diyar kirin. Ji vê yekê jî, ev qabîla ku bi tu awayî bi derxik / kulikan mijul nedibûn û fikra Çernîşevskî - ya ku li jor hatebi bîr anîn - ya

ku meriv bi tu awayî li ser psikolojîya van qabîlan nikare bi cih bike, divê ku encamek jê bê derxistin. Ma sedema vê yekê çi bû? Karê bê gotin ku ev qabîla bi awayekî normal hêj negihabûn mustewa zewqa mirovên geşbûyî. Lê, ev yeka dibe bersiveke xapînokî.

Zewqên mirovan yên normal û yên nenormal kujan kriter (pîvan) karin mumkun bikin ku em karibin cudabûna wan ji hev farq bikin?

Çernîşevskî, bi ihtîmal, pêwistîya ku mirov divê vê kriterê di xwazaya mirovî de bibîne, dê bersiv bide. Lê xwazaya mirovî bi serpêhatina geşbûnê re tê guhertin : xwazaya nêçirvanekî hov bi tu awayî naşibhê xwazaya Parisîkî sedsala xvii-em û hinek taybetmendîyên ku di xwazaya Parisîkî de peyde dibin, mirov bi tu awayî nikare di xwazaya Elmanekî dema me de bibîne, û ed.

Tiştêkî din ji heye. Di herdem û dewraneke diyar de, xwazaya hinek kesên ku mensubê çîneke dîyar yê ji jicivatekê bi xwazaya hinek kesên ku mensubê çîneke din in, nagunce. Encam ?

Bê niviskarî di berhema xwe de çi dibêje, em guh bidnê: (*2)

Jiyana binasib ya ji bo gel, jiyana ku divê bibe, zehv xwarina xwarinê ye, bi kêfxweşî jiyandin, têr û tijî razandine. Lê, di dilê kesê gundî de mefhûma “ jiyane ” tim û daim bi xebatê ve hatiye girêdan. Bêyî kar nikare bijî, jiyana pê sext tê. Ev jiyana ku di nava têrûtijiyê de tê derbas kirin û xebat - karekî sext lê disa ji yê ku ne zedeyî hêzê ye - çermikî taze, hinarkên rengîn didin keç û lawên gundî , pîvana sipehîbûnê ya yekem li ba gel ev e.

Jineke gundî ku gelekî kar û xebatê dike, xwedî dar û berekî sexmê; heke ku ew baş hatibe xwedî kirin , bivê - nevê dê sexm bê: aha ji te ra şartekî din yê pêwîst ji bo xweşîkbûna gundîtîyê.

Xweşîkbûna “ esirê ” Mondenê bi cebrî bi gundîyan bi awayekî marezî tê xwiya kirin, heta li ser wan dê tesireke bi kul û şîn biafirîne, lewra gundî zeyîfbûnê mîna encema nexweşîyê an jî felaketê dihesibêne. Lê, kar û xebat tu fersendê nahêle ji qelewbûnîyê re.

Qelewbûnî ji bo keçeke gundî alemetê awak ji awayê nexweşîyê, nişana dar û berekî xerab e û gel şîşmamtîya zêda mîna kusurekê destnişan dike. Bi qasî ku ji stranên gelerî tê fehm kirin, di sipehîtîya gundîtîyê de, saxîtiyeke dis-erxwe re ku ne encamê balansa (mîzîna) hêzan ya di organizmê de ye, liqayî

tu xalê xweşikbûnê nayê kirin. Ev saxîtîya bêhampa û belansa (mêzîna) hêzên di organizmayê de, encama xebateke berdeyam, lê ne bêqader û jiyan-
neke hesanî ye.

Heçî xweşiktîya mondenê ye, ji bini cuda ye : bav û bapîrên vê xweşiktîyê ji gelek nivşan vir de, ji keda dest û milan dûr ketine. Di jiyanê neaktîf de xwîn di serê birrê bedenê re baş nagerehê, adeleyên (damarên) rihn û destan li ba her nivşê nû bêtir zeyîf dibin, hastû ziravtir dibin. Bela vê yekê jî , dest û pê biçûktir dibin. Destên û pîyên biçûk delaletî awayê jiyanê bitenê ku ji alîyê çinên serdest ve maqul tê ditin , dike.

Heke ku dest û pîyên xanimeke modern mezin bin, alemetê ku ew ne bi dar û ber e an ji ew ne ji “ malbateke ” baş tê. Herçiqas saxîtî tu caran rumeta xwe li ba mirovan winda nakê jî, ji ber ku ew pêwistiyeke heta li cem refah û dewlemendîyê jî. Ji ber vê yekê ji, hinarkên rengîn, geş û balbûna ku ji saxîtîyê bi şewq tê, li ba mirovên sosyeta gelekî cazîb e. Lê, ji bo van mirovan nexweşî zeyîfbûnê, sistbûnê, bêgiyanti jî unsurên xweşikbûnê ne, ji ber ku ev mîna encama jiyanê ku di nava luks û berdoştîyê de hatîye buhurandin, tê pesend kirin.

Ji bo mirovên sosyete wateyê (maneyê) din ya çermisandin, sistîti û bêgiyanûcanîtiyê heye: ligel ku gundî li rehetî û huzurê digerehê jî, tew qet guh nadê hewcedariyên maddî û westandina bedenê, lê bele ku gelek caran zigurdetiya wan ji her celeb endîşan dûr e, merivên xwedî kultur yê çîna serdest li hisên bi hêz yê ku cazîbtî û guhertinê didin jiyanê û bi vî awayî jî hirsên ku monotontî û valahîya wê radîkin, digerihi.

Hisên bi hêz, hirsên germ mirovî dixînin, lê bela ku neçarî û bêzartî delaletî serpêhatîyan dîkin, ma ku li hemberî bêçartî, bêzartîya jinekê sihrê nekeve ji destê merovî tê?

Ji vê yekê dê çi encam derkeve. Ji vê yekê, ku huner jiyanê kopya dike û jiyan, “ jiyan xweşik ”, “ jiyan ku divê ku bibe ” ji bo çinên ji hevcuda , encama ku ji hev cuda ye, derdikeve.

Ev cudabûn ji ku tê? Pasaja ku li jor hate pêşkêş kirin, di vî warî de rê nade tu gumanan: Jiyan ji hev cuda ye, ji ber ku rewşa eborî ya çinan ji hev cuda ye. Çernişevskî ev yek bi awayekî birêk û pêk isbat kirîye. Vêca, bi awayekî mafdar (haq) têgihiştina wi ya jiyanê û bi awayekî indirekt (nerastûrê) , ku mefhuma xweşikbûnê bi serpêhatina geşbûna eborî re tê guhertin, em karin bibêjin.

Heke weha bê, iddiaya hunermendên iddialist ya ku iddia dikirin ku xweşikbûna di rastîyê de heye, mirovî tatmîn nake û delîla ku mirov ber bi afirandina hunerê dibe pêwîst e ku divê yekê de bê ditin ku Çernîşevskî wîlqasî bi hijdih puç dikirin, pîrsa ku ew mafdar bû an na, kare bê bîra mirovî.

Ji bo Çernîşevskî, xweşikbûna ku di rastîya jiyânê de heye, ji xweşikbûna ku di huner de heye, rindtir e. Ev yeka, di wateyeke diyar de, haqîqetêke ku îtîraz lê nayê kirin, lê , bitenê di wateyeke dîyar de. Huner , jiyânê kopya dike. Lê, li gore têgihiştina jiyânê ya Çernîşevskî “ jiyana xweşik ”, “ jiyana ku divê mewcut bibe ” li ba kesên ku mensûbê çinên ji hev cuda ne, ku ji binî ne wek hev e, me dît.

Mirovekî ku mensubê çîna jêr bê, li pêşberî jiyana çîna jor û hunerê ku kopya vê jiyânê ye, dê helwesta wî çi be? Ev helwesta wî ku - heke ku li ba vî mirovî awayê tefkîra çîna wî hebe - wê ne erînî be, karê bê texmîn kirin. Heke ku ev mirov hinekî be jî, bi afirandina hunerî re mijul bibe, dê awayê tefkirkirina çîna serdest - ku bi giştî awayê tefkîrê yê serdest awayê tefkirkirina çîna serdest e - biguhere, “ bi awayekî xas ku bişexsiyeta wî dikeve, awayekî nû ” dê hewl bide ku biafirîne. Di vê rewşê de, afirandina wî ya hunerî ji xweşikbûna ku di rastîyê de tê liqayî kirin, dê ji netatmînkirina wî bê afirandin. Hunerê vî mirovî ancax jiyana ku bi çîna wî sipehî tê xwiya kirin û dê rastîyê kopya bike, helbet bi hesanî karê bê gotin. Lê jiyana ku zal e û rastî ne ev in: ya zal ew e ku bîdestê serdestan hatîye afirandin , jiyana rastîya ku ji alîyê hunerê herî bilind ve tê kopye kirine. Bi vî awayî jî, heke Çernîşevskî mafdar bê jî, ekola iddialist ya ku wî li himberî têkoşîn dida, ji binî ne xelet e. Ka em li ser mînakê rawestin:

Di serdema Louisê XV-em de, li civata Fransa di derbarê jiyana ku divê bibe de hinek nosyonan hukum dikir. Nosyonên ku ifadekirina xwe di hinek şaxên hunerê de diditin, nosyonên ku mensubê aristokrasiya li ber ruxandinê bûn. Nunerên tiers etatê yên spirituel yên ku ji bo rizgarîyê xebat dikirin, ev nosyon pesend nedikirin, ji berevaji ,dikirin hedefê rexneyeke herî tuj û dijar.

Van nunerên tiers etatê dema ku dest bi xebata xweyî hunerî kirin, ekola xweyî bi taybet demazrandin, ji ber ku xweşikbûna ku çîna serdest afirandibû, bi awayê temsîl dikir û diparast, di rastîyê de ne mumkun bû ku wan tatmîn bike. Ji ber vê yekê jî, bêguman bûyer mîna ku teorisyanên iddalîst di teoriyên xwe de tassawur dikirin, bûn.

Hem jî, hunermendên ku mensûbê vê çîna serdest jî bûn, dibû ku bi xweşîkbûna ku di rastîyê de liqayî dihatin, qîma xwe pê neyênin. Ji ber ku jiyan di cihê xwe de naraweste, geş û bal dibe, û geşbûna wê bi tiştê ku heye û di nabeyna (li gora mirovan) tiştê ku divê bibe, neahangdariyê diafirine. Vêca, bi vî awayî, rastî meylidarê / teerafdarê hunermendên iddialist bû. Noqta ku ew têde diketin xeletîyê bi temamî tiştêkî din bû. Li gora hunermenden iddialist, xweşîkbûn ku ifadaya Fikra Mutlaq ya ku geşbûna wê dibe bingeh ji bo pêvajoya globalî(cihanî) û bi vî awayî ji bingehê pêvajoya civakî ya kamîl teşkîl dike, bi xwe ye.

Feuerbach bi têkoşîna xwe ya ku li pêşberî iddiazlîzmê dikir, mafdar bû. Suxteyê / şagirtîyê wî Çernîşevskî jî dema ku teorîya iddialist ya huner pûç dikir û digot ku xweşîkbûn jiyanê ku "divê ku bibe" bi xwe ye, û bi giştî huner "jiyanê xweşîk" kopya dike, mafdar bû. Heri çawtetîya Çernîşevskî ew bû ku nizanî bû bê fikrên mirovan bi serpêhatina geşbûna dirokê re çawa geş û bal dibin. Çernîşevskî:

Têgihiştina hunerî ya ku em pesend dikin - dibê - ji têgihiştina hunermendên Elman yê herî nû tê, meyla wê ku bi fikrên hevçax yê giştîyê tê danasandin, bi pêvajoyeke diyalektîkî ji vê têgihiştinê derdikeve.

Rast e. Lê, fikrên Çernîşevskî yê di derbarê estetîk de, têgihiştineke hunerîyeke rast; ango metoda diyalektîkî ya felsefa kevî ligel ku naveroka wê rind fehmkiribû û hatibû kamîl kirin jî, têgihiştina ku bingehê wê yê metafîzîkî red dikir û ne li dorbera fikreki abstrak, ya ku li ser jiyanê civakî ya konkret mijul dibû, hê di serdema xweyî dendîkî de bû. Çernîşevskî bi nerîna diyalektîkî şad nebû, ji ber vê yekê jî, di têgihiştina wî ya jiyan û hunerî de unsurekî girîng yê meta fîzîkê peyde dibe.

Çernîşevskî hewcedarîyên mirovî bi yê xwezayî û sunî (çêkirî) diveqetîne: di bîr û bawerîya wî de "jiyan" bi alîyekî xwe normal e - biqasî ku bi hewcedarîyên xwezayî re digunce -, bi alîyê xwe yê din, bi alîyê xweyî herî mezin jî - biqasî ku ji alîyê hewcedarîyên xwe yê sunî (çêkirî) tê girêdan - nenormal e. Bi alîkarîya kriterê weha, Çernîşevskî bi hesanî encemeke weha jê derdixist: jiyanê çînê serdest yê civatê nenormal e, û bi vî awayî jî, hunerê ku vê jiyanê - di serdemên jî hev cuda de - nenormal îfade dike, hunerê sexte ye. Lê, civat, berîya ku dest pê kir ji rewşa hovîtiyê derkeve, ji serdemeke kevî vir de, bi çinayeti hatibû dabêş kirin.

Li gorî vê rewşê, divîya bû ku Çernîşevskî timamê jiyanê mirovîyê ya ku aidê konaxêke dîrokî ye, sexte û nenormal bibîne û di vê konaxa duvdirêj

de taswîrên jiyanê yên ku li ser vê zemînê peyde bûne, kêma hindik çewt ilan bike. Nerîneke weha ya di derbarê geşbûna nosyonên dîrokî û beşerî de, di demên guhertinê yên civakî de, di demên “ inkarkirinê ” de karin bibin çekeki herî bi hêz yê têkoşînê û bi rastî jî bûne. Vê nerînê ku di şaxsîyeta perwerdevanên me yên sala 1860 de parêzvanekî xweyî germane ditibe, divê ku meirov lê newê şaş kirin. Çi heye ku ev nerîn nikaribû wezîfa bingehî ya şîrovekirina pêvajoya dîrokî bi cih bîne. Ev nerîn ne qabîl bû ku mîna awayê ku Çernîşevskî tassawur dikir, hukum liser estetîkê zanyarî neke, lê ne dibû bingeh ji estetîkê ku tê şîrovekirin jî. Çernîşevskî dema ku digot huner kopya jiyanê ye, gelekî rast digot. Lê, bela ku huner kopya jiyanê ye, estetîkê zanyarî - an jî, bi peyveke herî bi rêk û pêk, teorîyeke huner ya rast - bi tenê gava ku rêgihiştineke jiyanê yeke rast derket meydana, karê bingehêkî resîden (asasî) bi dest bixîne.

Felsefa Feuerbach, di derbarê rêgihiştineke weha de bi tenê hinek îşaret ihtîwa (bi cih û war) dikirin.

Ji ber vê yekê jî, teorîyeke huner ku li ser bingehê vê felsefê dihate ava kirin, dê ji bingehêkî xweyî zanyarî bê par bime.

Bi giştî nokteyên ku min dixwest di derbarê teorîya estetîkî ya Çernîşevskî de dest nîşan bikim, ev bûn. Dema ku behsa teferuata bê kirin, di vî mijarî de ez dê van bibêjim:

Gava ku Çernîşevskî digot: bê li gora / nisbeta tabloyan gravur çî ye, li gora jiyanê jî huner ew e, rexnegirên Rus li himberî vê muqayesekirina wî gelekî ture (aciz) dibûn. Bi vî awayî jî fikra ku Çernîşevskî dixwest li ber çava vejîne, ev bû: heger ku mirov li himberî afrandinên hunerî bi rexbet in, sedema vê yekê, ne ew e ku xweşîkbûna di rastiyê wan tatmîn dike, lê ji bo wan - ji ber vê an wê hoyê - bi destxistina wê nemumkun bû.

Ev nerîna, biqasî texmînkirina kesên ku rexna li Çernîşevskî dikirin, ne bê bingeh bû. Di resmê de, gelek berhemên hunerî hene ku amana wan ew e, di hêlin mirov zewqê ji rastîyeke cazîb - bi wesîla kopyekê bê jî - bike, karin bîn dest nîşan kirin.

Çernîşevskî tabloyên ku dimenên deryayê taswîr dikin, bi bîr - mîna mînak - tene. Alîyê Çernîşevskî yê mafdar zêde bû. Hebûna gelek ji van tabloyan deyndarê ku mirov - mînak Hollandanîne - hiz ji deryayê dike û heta bi gava ku mirov jê dûr bûn jî, mirov temşeyî wan dike. Li Swîstrayê mirov rewşeke ku tişbihê wê, dibîne. Swîstrayî hiz ji çiyayên welatê xwe dikin, lê herdem nikarin wan bi heyret temaşa bikin: li wan welatan birreki mezin ji

nufusa wan welatan li newal û kendalên çiyayîne dijin. Ji ber vê yekê jî gelek resamên Swistra yên ku dimenên Alpan resm (kopya) dikin, hene. Ev berhemên ha yên huner ku ji rastîyê xweşîktir in, ne tê bîra temaşavanên resmê û ne ji dikeve bîra rasaman bi xwe. Lê ev berhem rastîyê bi mirov didin fikirandin; ger ku haqasi li xweşîya mirov diçin, têrî peydekirina wan dike.

Bê munaqêşa ev hemû bûyer şehdebûneke bêlam û cim ji bo Çernîşevskî didin. . Lê bûyerên din ku li dijî wî şehdebûnê didin ji hene, ku divê em li ser wan rawestin.

Resamê Fransî yê romantîkî binav û deng Eugene Delacroix di jurnala xwe de, dibêje: di tabloyên David³ de ku resameki di eynî mustewê de bi nav û deng bû, “ hebeşdarîyeke xerib ya realizmê û iddalizmê ” heye.

Ev peyveke bi temamî rast e; ne bi tenê ji bo David, lê - bi ma ya ku li vir ku ya girîng ev e jî - bi giştî ji bo hunerê ku rizgarîya rafên nû ji xwe re dike amanc, rast e.

Jiyana çîna serdest bi çîna nû, ango bi çîna ku berz dibe nenormal , layiqê rexnê tê ditîn. Ji bo vê yekê jî, resamê ku vê jiyane kopya dikin, awayê hunermendiya wan vê çînê tatmîn nake, pê sunî tê.

Çîna nû jî resamvanan dighêne û ev resam dema ku li dijî ekola kevn têkoşînê didin, serî li jiyane didin, realist in.

Lê, ev jiyana nû li gora nosyonên çîna nû “ jiyana xweşîk ”, “ jiyana ku dive bibe ” ye.

Lê, jiyaneke weha hêj nemewcud e - ji ber ku çîna nû bi tenê bêrîya azadbûnê dike -, ev jiyana hêj bi birrekî xweyî mezin ibaretê ji iddialê ye. Vêca, hunerê ku ji alîyê nunerên çîna nû ve tê afirandin , ku mîna “ hevbeşdarîyeke xerîb ya iddializmê û realizmê ” tê xwiya kirin, ji ber vê sedemê ye.

Hunerekî weha ku tevlîhevkirinê pêşkêş dike, mirov nikarê bibêje ku hewl dide xweşîkbûna ku di rastîyê de heye, kopya dike. Na, ev rasam qîma xwe bi rastîyê nayênin, pê qail nabin. Ew mîna çîna ku temsil dikin, dixwazin hineki rastîyê bugherin, hineki ji dixwzin ku li gora iddala xwe temam bikin.

Fikra Çernîşevskî qet bi wan resam û bi wi hunerî re nagunce, bi nisbetî wan ,ew xelet e. Lê, taybetmendîyeke ku bala merivî dikşîne, ew e ku hunerê Rusî yê dema Çernîşevskî jî hevbeşdarîyeke - û bi awayê gelekî cazîb - bi taybet ya iddîalizmê û realizmê bû. Dema ku teorîya Çernîşevskî ya ku hevcedarî bi realizmeke sexm didît, bê çima teng dima, ev yek ji me re şirove dike.

Lê, Çernîşevskî zarokekî dema xwe - him jî zarokekî çawa ! - bû. Ew, bêyi ku li himberî iddalên serdema xwe bêqayd bîmîne, parezvanekî herî germ, herî ji dîl yê wan îddaalên bû. Ji bervê yekê jî, teorîya wî ya ku iddîalizmeke herî hişk pêwist didît, rê nedida iddîalizmê. Çernîşevskî digot ku huner bi tenê jiyanê kopya nake, wê şirove jî dike, reçenasiyê jê re dike. Ew bi xwe bi huner re, bi taybet mîna "pirtukeke destan " pê mijul dibû û di nivîsandinên xwe yê rexneyî de ji bo ku hunermend fenomenên jiyanê baş fehm bikin, alîkarîya wan dikir. Ji bo suxtayê Çernîşevskî Dobrolîubov jî wilo bû. Dobrolîub bi munasebeta hikayeta xwe ya bi navê Arife " Dê roja rast kengî hilê " nivîsandina ku wî nivîsandibû, bînin ber çavên xwe. Dobrolyubov di vê nivîsandina xwe de weha dibêje:

Nivîskarê henermend, bi ti awayî li ser nerîna civakî û axlaqî her çendî mutalaayên giştî nakê jî, tim û daîm wan bi xetên serekî fehm dike, dizanê bixe ber çavên mirovên ku bi hêz li ronîkirinê digerin. Ji ber vê yekê jî, bi bîr û bawerîya me, dema kunivîskarek dike ku qabiliyetê xwe nîşan bide, ango keliya ku giha rastîya di fenomena de his bike û dighe mustewa taswîrkirina wan, berhemên hunerî yê ku hêza xwe ji nivîskarî distinin, dorbera ku ev an ji ew berhem ilhamî wi dikin û di derbarê lêkolîna serdemê de ji bo me dibe rêçenasekî bi bîr û bawer. Di vê rewşê de, qabiliyeta nivîskarî, bê ew çendî jiyanê fehm dike, hêjayîya imajên ku ew diafirine û bi dewlemendîya wan, karê bê dest nîşan kirin.

Bi vî awayî jî, Dobrolîubov bingehe amanca rexna edebî :

Mîna şirovekirina fenomenên ku di rastîyê de tene pê û dibine bingehe ji afirandina berhemek diyar, tê tesbît kirin.

Bi vî awayî jî, teorîya estetîkî ya ku Çernîşevskî û Dobrolîubov jî diparastin hevbeşdarîyeke cuda ya realizmê û iddîalizmê bû. Vê teorîyê, dema ku fenomenên jiyanê şirove dikirin, bi çavdêrî û tesbîtîkirina ku heye, qail nedibûn, lê di eynî çaxî de - heta di serî de - yê ku divê bibê ji dest nîşan dikir. Vê teorîyê, rastî bi awayê ku heye, inkar dikir û bi vî awayî jî meyla " neerênî " ya serdema xwe tanî zimên. Lê, vê teorîya ha, mîna kû Bielinskî di derbarê

xwe bi xwe de digot, karê “ geşkirina inakara fikrê “ bi ser nexist, ev fikra bi serpêhatina objektîf ya geşbûna civata Rus ve girênedada. Kêmasîya wî ya serekî ev bû, lê, sadiqbûna bi fikrên Feuerbachê re nemumkun bû ku dev ji vê kêmasiyê bê berdan, ne jî farq kirina wan mumkun bû. Bi tenê , bi pendskirina noqteya nerîna Marx karîbû vê qusurê farq bike.

Bela ku ji bo rexnelêgirtina tezên Çernîşevskî yên xwedî mahiyeteke bi taybet cihê me têr nake, dê bi tenê noqteyek bê dest nişan kirin.

Çernîşevskî danasandina îddîalîst ya di derbarê mezinbûnîyê ku ifadeya fikra bê dawîbûnîyê ye, ji binî red dikir. Bi redkirinê jî mafdar bû, lewra iddialistan ji fikra bê dawîbûnê, Fikra Mutlaq fehm dikirin. Ji xwe, cihê fikrêkî weha di doktrîna Feuerbach - Çernîşevskî de nebû.

Ligel vê yekê jî, Çernîşevskî : li ba me, naveroka mezinbûnîyê, herçiqas fikrên ku li ser me şopandinê bi hêz dikin, diafirîne ji, objeya ku vê şopandinê diafirîne, gava ku digot mezinbûna xwe ji vê nerînê cuda diparêze, dikete çawtîyê. Bi mantiqî jî, ji vê îddîayê mezinbûnî ji nerînên ku em di derbarê wê de difikirin, encameke ku bi serê xwe heye, derdikeve.

Çernîşevskî, yê ku bi me mezin tê, obje bi xwe ye, ne ku şopandina li ser me tê pê ye, difikire. Lê, minakên ku dane, bi tezên wî re dikevin dijbertîyê.

Çernîşevskî dibêje Mont Blanc, Kazbek çiyayên bi heybet in, lê tu kes heta talîyatalîyê ji wan re nikare bibêje mezin in. Rast e, lê tu kes nikarê ji me re bibêje ku ev çiya bi serê xwe tenê, ji şopandina ku li ser me têne meydandê cuda, mezin in.

Ji bo nerîna wî ya xweşîkbûnê jî wilo: Çernîşevskî , ji alîkî ve, ji xweşîkbûna rastîyê re bi serê xwe xweşîkbûnî ye, dibêje, ji alîyê din ve jî bi tenê “ jiyana xweşik “, di derbarê “ jiyana ku divê bibe” tiştê ku bi nosyona me re digunce û ji me ve xweşik tê xwîya kirin, tasdiq dike. Naxwe, obje bi serên xwe ne xweşik in.

Bi kurtî, ev çawtîyên niviskarê me - weke ku me berê jî got - ji bê parbûna nerîna diyalektîkî ya di derbarê tiştan tê. Çernîşevskî pevgeridana di nabeyna obje û sujeyê de, ku bi herikandina fikran herikandina tiştan şîrove bike, biserneket. Ji bo vê yekê jî , di dawîyê de ew xwe bi xwe re kete dijberîtiyê û bi awayekî ku bi rihê felsefê nagunce, ku ji hinek fikran re rumeteke objektîf atîf dike, muqaderbû.

Lê, ji bo tesbitkirina vê xeletîyê, pêwîst bû ku felsefa Feuerbach ya ku dibû bîngeh ji teorîya estetîkî ya Çernîşevskî re mîna “qonaxeke bihurtî” êdî dev jê hatibana berdan.

Ligel vê yekê jî, pirtuka niviskarê me, disa ji, ji bo serdema xwe berhemeke herî cidî, herî balkêş bû.

G. V.PLEHANOV

Wergêr : N. ZAXURANÎ

*1-) Ev metna ha , di 1895 - an de, ji sernivîsa niviskarî ya bi navê “Teorîya Çernîşevskî ya estetîkî” ku di pirtuka wî ya di mudetê bîst salan de, derketibû, jê hatîya girtin.

*2 -) Cihê wê di berhemên Plehanovî yên komkirî de. C. Vi, Rup. 281 - 289.

*3 -) Çernîşevskî : “Peywendîyên huner yên estetîkî bi rastîyê re”. Li jurnala Eugene Delacroix meyzênin.Parîs, 1893, C. 3, Rup. 393.

DÎMENÊK JI EDEBIYATA CÎHANÊ

Derdikeve !

Berhevkar û Amadekar
Lokman Polat

Weşanên
ÇANDA NÛJEN

Di sala 1997'an de WEŞANXANEYÊN KURDAN ÇI DIWEŞÎNIN?

Me lêgerînek li ser weşanxaneyên Kurdî yê li Swêdê kir û em fêr bûn ku di sala 1997'an de ev weşanxaneyên Kurdan kîjan pirtûk diweşînin. Navê wan hemû pirtûkan hatiye nivîsîn. Bi dilxweşî biwxînin û pirtûkên ku hûn dicibînin ji xwe re bikin. Pirtûkxaneya xwe ya di malê de bi pirtûkên Kurdî dewlemend bikin.

Me ji weşanxaneyên Kurdan re vê nameya li jêr şiyandibû. Wan jî bersîvên me dan. Hinekan jî bi dev bersîv dan û tenê navê weşanên ku dê derbixin gotin. Li jêr nameya hatî şiyandî, navê weşanxaneyan û berhemên ku dê derbixin heye. Bixwînin.

Birêz Birêvebirê Weşanxaneyê

Em dixwazin xwendevanên xwe bi kar û xebata weşanxaneyên Kurdan agahdar bikin. Berhemên ku weşanxaneyên Kurdan diweşînin divê ji alî xwendevanên Kurd ve bê zanîn. Em dixwazin ku xwendevan bizanibin weşanxaneyên Kurdan di sala 1997'an de kîjan berhem diweşînin.

Ji kerema xwe re navê pirtûkên ku hûn di sala 1997'an de diweşînin ji me re bibêjin ku em xwendevanan agahdar bikin. Pirsên me ji we ev in:

1 - Weşanxaneya we di kîjan sal de hatiye damezrandin?

2 - Weşanxaneya we hetanî niha çend heb pirtûk weşandiye? Ev pirtûkên ku we weşandiye çend heb jê bi Tirkî ne û çend heb jê bi Kurdî ne?

3 - Li ser ziman û li ser dîroka Kurdan gelek kê m pirtûk hatine weşandin. Li gor we gelo sedemên wê çi ne?

4 - Hûn di sala 1997'an de bi tevayî çend pirtûk diweşînin? Navên pirtûkan û navên nivîskarên wan çi ne?

Bi silavên germîn!
Lokman POLAT

PENCÎNAR Weşanên Çanda Kurdî

Bersîv : 1

Weşanxaneya me "PENCÎNAR Weşanên Çanda Kurdî" di 21'ê Adara 1986'an de hatiye dameziran-din. Lê ji ber bêgavtiyê, pirtûkên me ji aliyê weşanxaneyên Kurdî yên cuda ve dihatin çapkirin.

Bersîv : 2

Weşanxaneya me ji 1990 - 91'ê bi vir

ve ye ku pirtûkan li ser navên xwe dide çapkirin û heta niha 14 - 15 pirtûkên bi Kurdî çapkirine.

Bersîv : 3

Sedemê kê m çapkirina pirtûkên li ser ziman û dîroka Kurdî; di radeya yekemîn de hovîtiya dijminan e ku rê li vê yekê girtine. Radeya duyemîn jî, lewazîtiya rêxistinên Kurdî dipeyitîne herweha bêgavî û tuneya nivîskarên Kurd jî dilqekî xwe yê mezin dide leyiztandin.

Mesela: Di van salên dawîn de, eger mirov bi Kurdî çîrokekê li ser mişk û pisîkê yan li ser pesndayîna desthelatiya welatên koledar binivîse, ev herçar dewlet jî dengê xwe nakin. Lê eger çîrok danasîna Çanda Kurdî be, yan li ser Nijada Kurd be, dest datînin serê û nivîskarê wê jî xwe di navbera çar dîwaran de dibîne.

Bersîv : 4

Ji bo sala 1997'an, di programa me de pênc pirtûk hene:

1 - Mele Yûnus - Zirûf

2 - Mele Yûnus - Terkîb

3 - Ebas Alkan - Çanda Warê Talan-kirî

4 - M. Xalid Sadînî - Mamikên Kurdî

5 - Zeynelabîdîn Zinar - Xwençe - Cîld : 10

Lê program û zeman ji bo pirtûkên folklorî û yên klasîkên Kurmancî tune. Çi dema tiştên wisa bi dest bivekin û ku ji bo çapê amade bibin, pêre pêre têne çapkirin. Mesela : Çend hefte berê niha nivîsandina "Sserfa Kurmancî" temam bûye û me ew di nava hefteyekê de jî da çapkirin. Pirtûk li ser rêzimana erebî û farisî ye, di sedsala 17'an de ji aliyê Mele Elî Teremaxî ve hatiye nivîsandin.

Zeynelabîdîn Zinar

WEŞANÊN JÎNA NÛ

Weşanxaneya JÎNA NÛ di sala 1984'an de hatiye damezrandin. Di nav weşanên JÎNA NÛ de hetanî niha 39 pirtûk hatine weşandinê. Weşanên JÎNA NÛ hem bi hemû zaravayên Kurdî û hem jî bi Tirkî pirtûk weşandiye. Weşanên JÎNA NÛ îsal bi Swêdî jî pirtûkek weşand e. Weşanên JÎNA NÛ gelek pirtûkên li ser dîrokê û hinek pirtûkên li ser ziman weşand. Ji niha pê ve jî dê pirtûkên lêkolînî, dîrokî û yên li ser ziman biweşîne.

Pirtûkên ku di sala 1997'an de bêne weşandin ev in:

1 - Kurdernas Humor - Ulf Lundkvist - Bi swêdî - Derket.

2 - Jiyana Celadet Bedir - Xan - Konê Reş - Derket.

3 - Xwendina Kurdî - K. Alî Bedir - Xan - Derket.

Weşanên JÎNA NÛ bi navê KULÎLK kovarek zarokan jî diweşîne. Ev kovara zarokan ji du mehan carek derdikeve.

WEŞANÊN SARA

Weşanxaneya SARA di sala 1987'an de hatiye damezrandin. Weşanxaneyê hetanî niha 49 pirtûk weşandiye. Di nav weşanên SARA de bi herçar zaravayên Kurdî, bi Îngilîzî û bi Swêdî pirtûk hatine weşandin.

Sedemên ku li ser ziman û li ser dîroka Kurdan kêr pirtûk hatine weşandin Tirk in. Kurdan hêj bi destê xwe dîroka xwe nenivîsiye. Lê gelek başe ku Kurdekî ne ji Kurdistanê, Kurdekî Horasanê li ser dîroka Kurdan hezar -1000- rûpel û li ser dîroka MED'an jî pênc hezar -5000- rûpel pirtûk nivîsiye. Em dê

van pirtûkan bi Îngilîzî, Kurdî û Tirkî biweşînin. Di van pirtûkan de gelek belgeyên giranbiha hene û gelek aliyên tarî yên dîrokî derdixe ronahiyê. Ev Kurdê Horasanî ku dîroka Kurdan nivîsiye navê wî M. Kardux e.

Pirtûkên ku em di sala 1997'an de derdixin ev in:

- 1 - Şahmaran - Bi zaravayê Soranî
- 2 - Şahmaran - Bi Swêdî
- 3 - Şahmaran - Bi Almanî
- 4 - Alî Baba û Çil Keleş - Bi Kurdî
- 5 - Adetên û Ruswetnameyên Ekra-diye - M. Mahmûdê Beyazîdî
- 6 - Dîroka Kurdan - Ji Heft hezar sal berê ta niha - Du cîld - Hezar rûpel in. M. Kardux
- 7 - Dîroka MED'an - pênc hezar (5000) rûpel e. M. Kardux

WEŞANÊN ÇANDA NÛJEN

Weşanên Çanda Nûjen di sala 1990'î de hatiye damezrandin. Hetanî niha 18 pirtûk weşandiye. Sedemên ku li ser ziman û li ser dîroka Kurdan kêr pirtûk hatine weşandin ev e ku; di nav Kurdan de zimanzan û dîrokzan kêr in. Loma jî pirtûkên weha bi tiliyan têne jîmartin.

Weşanxaneya Çanda Nûjen ji bo ku alîkarî negirtiye û pirtûkên ku diweşîne li gor îmkanên xwe diweşîne loma jî ev sal dê gelek hindik -çend heb- pirtûk biweşîne. Heger weşanên Çanda Nûjen wek weşanxaneyên din alîkarî bigirtana dê wê jî gelek pirtûk biweşandana. Di destê weşanxanê de gelek pirtûkên amadekirî hene, lê ji ber sedemên aborî weşanxane nikare îsal van pirtûkan biweşîne.

Weşanxaneya Çanda Nûjen di sala 1997'an de van pirtûkan diweşîne:

- 1 - Weyla Licê, Weyla Licê (Dîroka Bîranîna Şehîdan) - Dilpêr Jêlî - Derket
- 2 - Hespê Boz û Şêxzade - Berhevkar : Lokman Polat - Derket
- 3 - Ji Nav Edebiyata Swêdê - Amadekar : Lokman Polat - Derdikeve
- 4 - Ey Şehîd, Hey Hebûn-Serpêhatî. Kovara Helwestê jî ji alî weşanxaneya Çanda Nûjen têt weşandinê.

WEŞANÊN JÎNDAN

- 1 - Weşanxaneya JÎNDANê di kîjan salê de hatiye damezrandin?
- Weşanxaneya me di sala 1985an de

hatiye damezrandin. Lê ji ber rewşa xwe ya aborî nikaribû pirtûkan biweşîne; demeke dûr û dirêj pirtûkan neweşand. Paşê, weşanxaneya me bi kurmancî û zazakî pirtûk weşand.

Weşanxaneya JÎNDANê 13 pirtûkên bi zimanê kurdî weşandîye. Di ber de jî, kovara "Şano û Sîneme" heta pênc hejmaran û niha jî kovara "Jîndan"ê heta du hejmaran derketine. Niha jî em dil dîkin ku li Amedê derbixin. Pirtûkên ku derketin sê heb, di sala 1997an de, nûh derketine û yên din jî li çapxaneyê ne. Yên ku derketine navên wan:

1- Maruf YILMAZ- Nasneme(nasnameya YILMAZ GÜNEY, 1997. Derket.

2- Xelîl DUHOKÎ- Peyv û Tablo Diaxifin, 1997. Derket.

3- Gabar ÇIYAN- Şahmaran, 1997. Derket.

-Pirtûkên nûh ên derbikevin hene? Heger hebin navên wan Çine û nivîskarên wan kî ne?

-Pirtûkên nûh ên ku derbikevin,
1 - Maruf YILMAZ- Wêjeya Kurdî
2 - Maruf YILMAZ- Rêziman
3 - M.YILMAZ- ŞENGÊ, MENGÊ
û PENGÊ (çîrokên zarokan)

Weşanxaneya Jîndaê hetanî niha sêzdeh (13) pirtûk weşandîye. Pirtûkên Kurdî yên ku ji aliyê weşanxaneya me ve hatine weşandinê; pirtûkên rêzimanî, wêjeyî, çîrokî, dîrokî û danasînê ne. Em pirtûkan, bi tirkî naweşînin, xizmeta edebiyata xwe dîkin.

-Li ser ziman û dîroka Kurdan gelek kêr pirtûk hatine weşandin. Li gorî we sedemên bingehîn çi ne?

Tiştê ku di nav Kurdan de kêr bû, kurdperwerî û hîsên wê bûn. Hez-kirina me ji bo welêt, taybetiyên civaka Kurd, ziman û çanda wê ve girêdayî ye. Zimanê kurdî dilê jîndarê çanda kurdî ye, hîmê nasnameya neteweyî ye. Heger em qala pirtûkên dîrokî û rêzimanî bikin, rastiyeke tehl derdikeve holê. Pirtûkên dîrokî û rêzimanî yên kurdî li ser tiliyan tene hejmartin û piraniya wan bi hawayekî zanyarî û ilmî nayên nivîsîn û weşandin.

Weşanxaneya Jîndan

Nivîskar Gabar Çiyan

Gabar Çiyan rojnamevan û nivîskarekî Kurd e. Hetanî niha ji dehî pirtir pirtûk weşandiye. Di sala 1997'an de van pirtûkên jêrin dê biweşîne.

1 - Kürt Aydınları Asur Halkı için ne dediler?

(Kürt Aydınları ile söyleşiler)

2 - Silah Ticaretinde Türkiye

3 - Dostluk Öyküleri - Novel

4 - Pirsî Sînema Kurd û Yilmaz Guney - Lêkolîn.

Rêzepirtûka Şahmaran

1 - Şahmaran - Derket

2 - Evîna Şahmaran - Derket

3 - Şahmaran û Dewran

4 - Gustîlka Şahmaran

5 - Welatê Şahmaran

Di hejmara 9'an de, em dê cîh bidin weşanên Apeck, Weşanên Nûdem, weşanên Roja Nû, Weşanên Mezo-potamya û weşanên Rewşen.

WEŞANXANEYÊN KURDAN YÊN LI STENBOLÊ

Gelek weşanxaneyên Kurdan li Stenbolê hene. Wan weşanxaneyan hetanî niha ji 500'dî pirtir pirtûkên li ser doza netewa Kurd weşandine. Nivîskarên Kurd di van demên dawîn de gelek berhem afirandin. Giraniya wan berheman pirtûkên dîrokî û yê lêkolînî ye.

Weşanxaneyên Kurdan ji sedî zêdetir pirtûkên xwerû bi Kurdî jî weşandin. Lê çî heyf e ku ev pirtûkên Kurdî nayêne firotinê. Xwendevanên Kurd tercîha xwe bi pirtûkên tirkî dikin û pirtûkên Kurdî nakirin. Gelek weşanxane ji bo ku di çapkirina pirtûkên Kurdî de zirarê kirine, hendî naxwazin pirtûkên Kurdî biweşînin.

Li gor ragihandina weşanxaneyên li Stenbolê, di nav pirtûkên xwerû Kurdî de pirtûkên Mehmed Uzun, Lokman Polat û Firat Cewerî hinek tene firotin, lê yê din nayêne firotin.

Weşanxaneyên Kurdan yê li Stenbolê evin:

Weşanên Nûjen, Avesta, Komal, Deng, Firat, Zagros, Koral.

KOVARÊN KURDAN YÊN LI SWÊDÊ

Analîz # Kûltûr # Lîteratur
HELWEST

Kovara Kûltûrî û Lîteraturî

SEMBOLÎZM û ROMANTÎZM



EDEBIYATA KURDÎ DE ROMANTÎZM

Hejmar / No: 6 •••• Sal: Kanûn - 1996

ROJA NÛ

Ji alî Komkar - Swêd ve tê weşandinê. Hetanî niha 47 hejmarên wê derketine. Di van salên dawîn de bi rêk û pêk dernakeve, lê hêj jî weşana xwe didomîne.

BERBANG

Organa Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ye. Hetanî niha 107 hejmarên wê derketine.

DÎDAR

Kovara Yekîtiya Ciwanên Kurd e. Girêdayê Federasyonê ye. Hetanî niha 20 hejmarên wê derketine.

AVAŞÎN

Ji alî Enstîtuya Kurd li Stockholmê tê weşandin. Hetanî niha 4 hejmarên wê derketine.

Xwendevanên me yên li derveyê Swêdê, yên Ewrûpa rojava û yên li welêt dibe ku nizanibin li Swêdê çend kovarên Kurdî derdikevin. Ji xwe dostekî me bi telefonê pirs kiribû gotibû "hemû kovarên xwerû bi Kurdî li Swêdê derdikevin. Gelo çend kovarên Kurdî li Swêdê derdikevin?"

Li Swêdê kovarên ku xwerû bi Kurdî derdikevin ev in:

1 - Roja Nû, 2 - Berbang, 3 - Dîdar, 4 - Avaşîn, 5 - Çira, 6 - Armanç, 7 - Helwest, 8 - Jîndan, 9 - Nûdem, 10 - Nûdem Werger, 11 - Dugir, 12 - Rojbaş, 13 - Însîyatîf

ÇIRA

Kovara komela Nivîskarên Kurd li Swêdê ye. Hetanî niha 9 hejmarên wê derketine.

ARMANC

Kovara Mala Çanda Kurdî ye. 178 hejmarên wê derketine.

HELWEST

Weşanên Çanda Nûjen vê kovarê derdixê. Hetanî niha 8 hejmarên wê derketine.

JÎNDAN

Ji alî weşanên Jîndanê ve tê derxistin. 4 hejmarên wê derketine.

NÛDEM

Ji alî weşanên Nûdemê ve tê derxistintin. 23 hejmarên wê derketine.

NÛDEM WERGER

Kovara wergerê ye. Weşanên Nûdem vê kovara wergerê derdixê. Nivîsên di tê de ne hemû jî nivîsên wergerê ne. 1 hejmar derketiye.

DUGIR

Kurdên başûrê piçûk vê kovara kulturî derdixin. Xwediyê kovarê weşanên KAWA ye. 5 hejmarên wê derketine.

ROJBAŞ

Navenda agahdariya Kurdî li Luleâ yê vê kovarê derdixê. bi Kurdî û Tirkî ye. 3 hejmarên wê derketine.

ÎNSİYATÎF

Komek rewşenbîrên Kurd vê kovarê derdixin. Ev kovar wek kovarek platformî ye. Hemû nivîsên di kovarê de nîrxandinên siyasî ne. 3 hejmarên wê derketine.

YAYIN DÜNYASI (CÎHANA WEŞANAN)

Kovara danasîna pirtûkan e. Nivîsên danasîn û analîza pirtûkan diweşîne. Du hejmarên wê derketine.

Têbînî : Kovarên ku bi Alfabeya Erebî derdikevin me behsa wan nekir. Kurdên başûr û rojhelat jî gelek kovar derdixin Yên ku em dizanin RABÛN û GIZING du kovarên Kurdan yên bi tîpên Erebî ne ku li Swêdê têne weşandin.

LI SER KURDAN PIRTÛKEKE NÛ

Ş. B. SOREKLÎ

Nayê veşartin ku pirsê kurdî ev bûn 50 sal di bin pirsê filistîniyan û cihûyan de nîvveşartî maye.

Weşanên giştî yê cihanê haydariya ku dane û didin wê pirsgerê nadin têkoşîna gelê Kurd. Ta radeyekê sedema vê yekê beşbeşbûna Kurdan di nav 4-5 welatên cuda de ye, tiştê ku piştgiyê rêk û pêk ji bo Kurdan diwar dike, lê Kurd bi xwe jî di derheqê vê pirsê de ne bêtawin.

Tenê bi encama Şerê kendalê û biçolketina dora 2 milyon Kurd di sal 1991 de mîdyaya cihanê ji bo çend hefteyan balkêşiyê mezin da Kurdan.

Li gel hemî kêmasiyan jî dikare bête gotin ku hejmareke ne biçûk ji rojnamevanên welatên rojavayî ji bo Kurdan û pirsê wan her piştgir bûne. Di nav 40 salên borî de hejmareke ji rojnamevanên inglîzî, emîrîkî, almanî, frensî û yê din, ne tenê gotarên gellekî bi nerxê di derheqê Kurdan, dîroka wan û têkoşîna wan de nivîsandine, ne tenê pirtûkên giranbiha dane weşandine, lê gellekê caran jiyana xwe ji bo hezkirinê û piştgirtina Kurdan xistine tehlûkeyê. Nivîskar û rojnamevanên wek HANS HAUSER, EDGAR OBLANGE, FRITZ SITTE, SHERY LAZER, GUN-

THER DESCHNER, GERARD CHALIAND, CHRISTINE MOORE, HELLA SCHLUMBERGER û gellekên din gotar û pitûkên nerxbilind nivîsandine ku ronahiyê diavêjin ser pirsê kurdî ya bi salan di tarîtiyê de mayî.

Yek ji rojnamevanên ku piştgrî û sempatiyeke mezin ji bo Kurdan heye rojnamevanê WASHINGTON POST: JONATHON RANDALL e. Wî ta nuha gellek gotar li ser Kurdan û di derbareyê têkoşîna wan ya millî de nivîsandine, lê ew jî wek hejmareke mezin ji dostên gelê Kurd û wek bi hezaran şareza û zanyarên Kurdan bi encama rewşa kurdî ya li holê dilsar bûye. Tevî diltezîna xwe jî, wî dest ji piştgiriya Kurdan berne-daye. RANDALL pirtûkek li ser Kurdan û rewşa wan nivîsandîya, bi navê: AFTER SUCH KNOWLEDGE WHAT FORGIVENESS: MY ENCOUNTERS WITH KURDISTAN. Yanê: Li Dû Weqa Pêzanîn Çi Bexşandin: Tecrûbeyên Min Li Kurdistan.

Wekî rojnamevan FLORA LEWIS, rojnamevana INTERNATIONAL HERALD TRIBUNE, diyar dike, di pirtûka xwe de JONATHAN RANDALL behsa berje-

wendiyên dijeber, armanc û daxwazên pîrralî, xiyaretên navxoyî û dostan yên pîrrcar, sernekeftina siyaseta emarikî di warê peydakirina dostan de li Rojhelata Navîn û şaştiya siyaseta Washington ya li gel pirsê kurdî dike. Pirtûka RANDALL yeke din ji wan pirtûkan e ku ji aliyekî ve bi qencî û romantîkî behsa Kurdan dikin û ji aliyê din ve rastiya reş ya yeknegirtina rêxistinên kurdî û trajêdiya rewşa kambax ya vî gelî tînin ber çavan.

Çawa be jî dostên gelê Kurd yên wek JONATHAN RANDALL dest ji piştgiriya mafên Kurdan bernadin; dixwazin ku Kurd jî wek komeke xwedan dîrok, tore û ziman, wek neteweyeke ku weqa têkoşîn ji bo mayîna xwe kiriye û dike, bibin xwendiyên jiyaneke layiqe ev qonaxa dîrokî ya mirovan.

Rojnamevan û nivîskarên wek JONATHAN RANDALL piştgiriya mafên Kurdan dikin, ne ji bo berjewendiyên oportunist, lê bêtir bi encama baweriyên mirovahî. Li gel hemî kêmasiyên li holê jî wan bawerî heye ku gelê Kurd, wekî ku dîrokê îspat kiriye, namirê û dê her hebe.

LI KURDISTANÊ

BERBANGA AZADIYÊ

Nivîs : Müslüm Yücel - Wergêr : Pervîn Serefînaz

Pirtûka Lokman Polat ya bi navê
“*Li Kurdistanê BerbangA Azadiyê*”
derket. Ev pirtûk jiyan û tekoşîna
Îrfan Alpaslan yê ku beriya 12 Îlonê li
Agirî karê Serokbelediyê dimeşand
tînê zimên.

Îrfan Alpaslan karê serokatiya belediyê dimeşand û xwe di tu warî de bi mekanîzmayê desthilatê ve girêdayî nedidît, tînê zimên. Di vê pirtûkê de jiyana Îrfan Alpaslan ya ji dema serokbelediyeyê heya bi wextê wî yê ku bû serokmifrezeyê gerîlayan girtiye destê xwe. Jiyana wî ya ku carna bi pêlên bilind, carna jî bi pêlên nizm dom kiriye raxistiye ber çavan.

Özgür Gündem - 24/1/1994

JI KONAXA BELEDIYEYA AGIRÎ HEYA BI ARAMIYA ÇIYAYÊN TORÎSTANÊ

Sal 1979 e. Li Tirkîyê û li Kurdistanê rewşa ku dewlet ketiye rewşa krîzê ye. Di wê demê de gelê Kurd dixwest namzetên xwe bi destên xwe ve hilçîne. Ji wan namzetan yek jî Îrfan Alpaslan bû. Bi navê xwe yê din, Serdar Ararat bû. Wî wek kesekî serbixwe namzetiya xwe li bajarê Agirî dabû diyarkirin. Bi ferqekî mezin dengê xelkê girtibû û hatibû hîlbijartin. Di îlona xwînê de dema ku general hatin ser hukmê, hêza

şoreşgeran derbekî pir mezin xwar.
Wê gavê Alpaslan bû çekdar û ket
nava refên şoreşê. Êdî cîh û warê wî
Kurdistanê Rojhiêlat bû.



Di nav refên şoreşê de him karê te-
orisyenî him jî karê leşkerî dimeşand.
Alpaslan bûbû alîkarê sekreterê giştî
yê Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê û
endamê konseya Ordîya Rizgariya
Kurdistanê.

Di Oktobira 1989'an de di şerê ku li
Kurdistanê Bakur li Beytulşebabê li
herêma Torîsan ya li Uludere derke-
tibû de jiyana xwe wenda kir, şehîd
ket.

Em zaroyên Agirî,
ên welatê Medya ne.
Navê me banga serhildanê ye.
Me zaniyariya şer bi
hunermendiya zêrçêkeran ve honaye.
Serî daxistin di manifestoyê me de
nîne.

Jiyaneke Alpaslan ya kurt û bi nave-
rok hebû. Hevalê wî Lokman Polat
jiyana wî ya kurt, şexsiyet û têkoşîna
wî di pirtûka "Li Kurdistanê Ber-
banga Azadiyê" de kom kiriye.

Di wê pirtûkê de hevpeyvîna ku
"Rojê Welat" bi Alpaslan ve çêkiriye
cîh digire. Wekî din jî sê nivîsên Al-
paslan yên ku di "Hêviya Gel" de
hatibûn weşandin jî cîh digirin.

Özgür Gündem - 31/1/1994

Baseğmeyer
Bir Kürt Devrimcisi
Zeki Adıgüzel

Hazırlayan
Lokman Polat

Her Devrimci Militanın
okuması gereken bir kitap

Weşanên Çanda Nûjen
(Çağdaş Kültür Yayınları)

“HERE CIHÊ KU DILÊ TE, TE DIBE WIR”



Wêşanên CAN weşanxaneyek herî mezin e di tirkîyê de. Ev weşanxane gelek pirtûkên hêja diweşîne. Xwediyê weşanxaneyê Erdal OZ mirovek pêşverû û şoreşger e. Gelek pirtûkên wî hene. Ew di 12'ê Adara 1970'yî de hatiye girtin û Îşkence dîtiye. Ez wexta ku di sala 1973'an de hêj nûh bûbûm şoreşger min pirtûkek wî ya bi navê “Yaralısın - Birîndarî” xwendibû. Pirtûkek gelek baş û balkêş bû.

Wêşanxaneya CANê bi sedan pirtûkên wergerê weşandiye. Pirra-niya pirtûkên ku wergerandine û weşandine pirtûkên nivîskarên Latîn - Amerîkî ne. Di van demên dawiyê de weşanxaneya CAN, pirtûkên nivîskarên Ewropî jî werdigerîne û diweşîne. Pirtûka bi navê “Here cihê ku dilê te, te dibe wir” pirtûka nivîskareka Îtalî ye. Ev pirtûk romane, romanek gelek xweş e. Nivîskara romanê navê wê “Susanna Tamaro” ye. Ev roman wexta ku


cara ewil - çapa yekem- di sala 1994'an de di Îtalyayê de hate weşandin navûdeng da. Di wê salê de pirtûka ku li Îtalyayê herrî pîrr hate firotin ev pirtûk bû. Tim di serê lîsteya pirtûkfirotinan de bû. Li tirkîyê jî çapa wê ya 20'an çêbûye.

Ev roman romanek bi hizn e. Bi kul û keder e. Bi hesret e. Hesreta hevududîtîne ye. Pîrejinek 80 salî ji newiya xwe re nameyan dinivîse. Newiya wê çûye Amerîka yê. Pîrejina 80 salî name li ser nameyê dinivîse. Nameyên hesretê ne. Nameyên şîretê ne. Nameyên wesiyetê ne. Lê wê wan nameyan qet ji newiya xwe re neşiyandiye. Nameyan nivîsiye, lê poste nekiriye, neşiyandiye. Pîrejina 80 salî di van nameyan de derd û kulên xwe dide der. Qala jiyana xwe dike. Tiştên neyênî ku kiriye, êşkere dike. Sirên xwe dide der. Bi xwe re muhasebe dike. Wê li hemberê guhertinan, li hemberê serubinkirina adet û aneyan, tore û tradisiyonan çi hîs kiriye? Bi zimanek fesîh, bi evînî, bi zanîstî qal dike.


Ew li newiya xwe şîret dike ku; di dema ciwaniya xwe de xwestiye hinek tişt bike, lê cesaret nekiriye û

wan tiştan nekiriye. Ew dixwaze ku newiya wê wan tiştên ku wê dixwest bike, lê nekiribû bila ew bi xwe bike. Ew li newiya xwe şîret dike û dibêje : "Rêwîtiya herî hêja rêwîtiya ku mirov di hundirê xwe de bike ye." û dom dike dibêje: "Here cihê ku dilê te, te dibe wir."

Min vê pirtûkê di rojek de xwend û qedand. Pirtûkek herîkbar e. Pirtûkek psîko - sosyal e, civakî ye. Mirov wexta ku dikeve nav dinya wê naxwaze dev jê berde. Jiyana pîrejinê jiyaneke balkêş e. Bi meraq e. Ev meraq mirov bi pirtûkê ve dide girêdan û loma jî mirov naxwaze pirtûkê ji destê xwe dayne. Mirov naxwaze naber bide xwendina pirtûkê. pirtûkek xweş e, bi zimanê edebî, bi zimanek dewlemend hatiye nivîsîn. hûn jî bixwînin.



Romanek Li Ser Kurdan “ORMENS BARN - KURÊ MARÎ”



Anders Kandelin rojnamevan û nivîskarekî Swêdî ye. Ew di sala 1968'an de li Norberg -Västmanland-ê hatiye dinê. Ew niha di komuna Botkyrka'yê de dixebite. Li wir bi navê Alî Gultekin Kurdekî nas kiriye. Vê Kurdî jê re qala -behsa- jiyana xwe, behsa sirgunkirina Kurdan û behsa serhildana Dêrsimê kiriye. Rojnamevan-Nivîskarê Swêdî Anders Kandelin jî ji ber vê qalkirina wî romanek nivîsiye.

Di vê romanê de rewşa kurdan, rewşa Kurdistanê û ya Tirkîyê di salên 1930 û 40'lî de çawan bûye têt qalkirin. Romanek herîkbar e. Lehengê romanê gelek derd, kul, kelem û êş dîtiye. Hatiye girtin, pê şence kirine, wî avêtine zîndanê.

Di salên 1970'yî de jî mecbur maye ji welêt derketiye derve û hatiye Swêdê.

Romana “Ormens Barn - Kurê Marî” ji ber qalkirina rastekîni hatiye afirandin. Nivîskarê romanê Anders Kandelin'ê Swêdî hatina vê pirtûkê bi temamî bexşandiye ji Amnesty'ê re.

Ev romana li ser Kurdan di nav weşanên Baran de hatiye weşandin û bi swêdî ye. Buhayê pirtûkê 150 Kron e. Yên ku bixwazin vê pirtûkê bikirin dikarin ji navnîşana Kovara Helwestê bixwazin. Em dê ji wan re bi postê vê pirtûka hêja bişînin.

SIRÛDÊN EHMED HUSEYNÎ

Helîm YÛSIV

Ehmed Huseynî nirxeke bilind dide peyvên xwe. Di nav sirûdên wî de, peyv an tîra xwe berdide kûraniya dîl, an jî rola xwe di sazkirina wêne û sembolan de dilîze û rê vedike li ber gelek peyvên gelêrî û ji bîrbûyî ku kirasekî nû li peyvê dike û di hevokan de bi xeml û xêzeke nû bi kar tîne.

Ji weşanên Jîna Nû li Swêd û di sala 1994'an de, pirtûka Ehmed Huseynî "Rona û Sirûdên Bêrîkirinê" hatiye weşandin. Bi rastî mirov mat dimîne, dema ku dibîne berhemên wisa girîng bêdeng, di bin çavan re derbas dibin û demên dirêj perdeya xwe diavêjin ser wan, bêtî ku ev berhem bikevin bin roniya rexne û nirxandinê. Ev sirûd ji wan nivîsarên ku xwendevan ji xwendina sirûda yekemîn de tê digihîje ku ne

bi pênuşeke normal, lê belê bi xwîneke germ, anîna canekî tenik, pêjinker û bi dilekî xemgîn (heta tu bêjî bes) hatine nivîsandin.

Helbestvan bi êşên kûr û fireh, bi nalînên tariya bêbinî û mîna kurdekî bi hemû babelat, derd, birîn, kêferat û psîkolojiyeke bêsînor dikare bi sirûdên xwe re biherike û "Rono" (yara wî dibe), ne kilîta bihuştê tenê, belê dibe kilîta dojecha zaroktî, pêxwaşt û qiriktalyê jî. Ehmed

Huseynî qir û qiyametê di nav toza Amûdê de radike, ala evîna kurdekî birîndar di nîvê singa welatekî qedexekirî de diçikîne. Bi dengekî germ û bi xunav qîr dike, sirûdên evîna sêwî û bêrîkirina zarotiya yekemîn, bi vî rengî azmûna ku li ber her nivîskarekî bixurtî derbas dike, ango form û avakirineke saz li gel hestên dadyî û canekî ji agir tevde bi hev re dibin stûn ji nivîsarên wî re. Bi hostayî nivîsarên xwe dirêse. Tê zanîn ku Ehmed Huseynî helbestvanekî nûjen û cihêreng e, ji hemû helbestvanên kurd ên ku di nav toza helbestên Cegerxwîn de bêçav mane û rê jî wînda kirine. Nivîsarên wî bi teknîkeke bilind tînin saz kirin. Ew bi awayekî hunerî wêneyên helbestî di asoyên nivîsarê de belav dike û ramanên veşartî zimanên xwe ji dîroka me ya tal re, di her pevokê de derdixîne. Lewre helbestvan nîrxêke bilind dide peyvên xwe, hetanî ku tu nikarî pêrgî peyveke bêcih û zêde bibî. Di nav sirûdan de, peyv an tîra xwe berdide kûraniya dil, an jî rola xwe di saz kirina wêne û sembolan de dilîze û rê vedike li ber gelek peyvên gelêrî û ji bîrbûyî ku kirasekî nû li peyvê dike û wê di hundirê pevokan de bi xeml û xêzeke nû bi kar tîne. Sirûd

di rengê pexşanê de ne, lê ji helbestan dagirtîne û avdayî ne bi xweşiyê û girî, spehîbûn, bîranîn, bêhna welatekî bêxwedî û dûr, evîna mezin û kambax û berî her tiştî êşa dilekî rastgo û dilsoz, ev kanî tev de sirûdan dipişkivînin û cihekî taybet didin wan, di warê toreya kurdî de û min dixwest di vê kurte-dîtinê de bala kesên rexnegir bikşînim bi alî van afirandinên hêjayî de, çimkî ev nivîsarên bilind bi hewceyî nîrxandîneke din û şîrovekirineke din in.

*H*êjayî gotinê ye ku toreya kurdî (bi zaravayê kurmançî) di van salan de gavên ber bi çav bi nîrx diavêje û Ehmed Huseynî, yek ji van navên girîng e di vê çarçoveyê de.

Têbinî: Ev nivîs ji rojnameya Azadiya Welat hejmara 70'yî hatiye wergirtin.

DUGIR

Kovara Kurdî Li Derveyê Welat

Ev kovar ji alî Kurdên Kurdistanê başûrê piçûk ve têt derxistin. Birêvebîrê kovarê E. Huseynî ye. DUGIR kovarek Kulturî, Hunerî û Lîteraturî ye.

Hejmar : 5 Derket ! Bixwînin!

Romana Ku Yilmaz Guney Nivîsîbû

“BI STUXWARÎ MIRIN”



Yilmaz Guney ne tenê lîstikvanê sînemayê bû. Ew di gel vê huner-mendiya xwe ya sînemayê, nivîskarekî jîr bû. Wî gelek pirtûk nivîsiye û kovar weşandiye. Pirtûkên wî yên edebî û siyasî ne. Kovara ku derdixist jî kovara çandî, edebî û siyasî bû.

Yilmaz Guney di salên 1970'yî de bi navê “Boynu Bökük Öldüler - Bi Stuxwarî Mirin” romanek nivîsî û weşand. Wî vê romanê di hefsê de

nivîsand. Piştî weşandina vê romanê, di pêşbaziya leca xelata Orhan Kemal de bû yekemîn û xelata edebî ya Orhan Kemal girt.

Yilmaz Guney di vê romanê de rastiya gundiyan û gundîtiyê qal dike. Ew wan baş dinase û li gorî jiyana rasteqînî û rastiya cîvakê wan di nav romanê de dihone û bi zimanê edebî qala wan dike.

Gelek roman bi jiyana mirovan, bi jîndariya wan tînin dagirtin. Bi bûyerê

jîndarî tên honandin. Yilmaz Guney di vê romanê de cîhana hundirî a mirovên ku qala wan dike baş dide der. Xelîl leşkeriya xwe diqedîne - tezkere distîne- û vedigere gundê xwe. Dostê wî yê kalepîr Alî Osman jê re behsa gelek tiştan dike. Kamber ji bo vegera Xelîl dîk û mirûşk şerjê dike, ziyafet dide.



Yilmaz Guney di vê romanê de dide xuyakirin ku; di gundan de hişyarî, şiyarbûnî, zanebûnî gelek zehmet e. Xelîl bi Axa ve gelek girêdayî ye. Her tiştên wî bi cîh tîne, her tim wek dike. Axa jê re çî bibêje di cîh de tîne cîh. Xelîl dibêje "yên ku Axa nasneke, xwedê jî nas nake." Lê, di nav pêvajoya jiyane de Xelîl rastiya Axa dinase, gelek tişt fêr dibe û bawerîya wî pê tê şikandin.

Yilmaz Guney di vê romanê de qala serpêhatiyên gelek gundiyan dike. Rewşa gundê "Yênîce" radixe ber çavan, rewşa gundiyan di hêla aborî, civakî û mirovahiye de çawan e behs dike. Ew gelek baş û bi zimanek edebî trajediya Çaqal Osman, jiyana bi êş ya Alî Osman, evîna Xelîl û Emîneyê, jiyana kar û xebata gundiyan, têkiliyên malbatîyê qal dike. Yilmaz Guney lehengê romanê -Xelîl- bi metodên nûh dide qalkirin û bi teknîka romanê ya bi serketî romanê dihone, herîkbar dike.

Yilmaz Guney di vê romana de pişkavtina gundîtiyê û pêşveçûna bajarvaniyê jî bi hostatî li hev dihone û şarîstaniyê derdixe pêş. Romana "Bi Stuxwarî Mirin" romanek bi serketiye, romanek realîst e. Bi zewq tê xwendin.

Gabar Çiyan gelek pirtûkên Yilmaz Guney wergerandiye Kurdî. Bi hêvîya ku ew vê romana wî jî wergerîne Kurdî.

“Strana Carla” EVÎN Û ŞOREŞ



Fîlma “Strana Carla” li ser evînê û şoreşê tê honandin. Dildariya evînê di Skoçyayê de dest pê dîke û di Nîkaraguayê de berdewam dîke. Deorge di Skoçyayê de şofirî otobosê ye. Rojek keçîkek bê bilet li otobosê suwar dibe. Karmendên ku bilêtan kontrol dikin, keçîkê digrin. Şofir George mudaxele dîke û nahêle ku karmend keçîkê teslîmê polîsan bikin. Ew ji keçîkê re dibe alîkar.

Hefteyek paşê, keçîk ji bo ku ji Şofir re sipas bike, adresa wî peyda dîke û hevûdu dibînin. Navê Keçîkê Carla ye. Ew penabreka siyasî ye. Carla ji Nîkaraguayê ye û keçîkek şoreşger e, Sandînîst e. Evîndarê keçîkê di Nîkaraguayê de ji alî kontrayan ve hatiye girtin. Navê evîndarê keçîkê Antonîo ye. Mirovên tarî yên ku kontra ne, Antonîo digrin, pê şence dikin, kezab davêjin rûyê wî û zimanê wî jêdikin.

Çawan evîn karê bawermendan e,
şoreş jî weha karê bawermendan e.

Dostaniya Şofir û keçika penaber
Carla dom dike. Paşê herdu bi hev re
bilêta teyarê distînin û diçin
Nîkaraguayê. Şofir George ji bo ku
ji keçikê hez dike loma pê re diçe
Nîkaraguayê. Ew bûyera girtina
evîndarê Carlayê beriya şoreşê
çêbûye. Keçik û şofir piştî şoreşê
diçin Nîkaraguayê. Şofir George li
Nîkaraguayê bi gundiyan re li ser
şoreşê û li ser pîrsa şoreşa erdan, ze-
viyan, bi gundiyan re sohbet dike.
Şofir George di Nîkaraguayê de pê
dihese ku beriya şoreşê û piştî şoreşê
kontrayan çawan wahşetî kirine.

Şofir George fêr dibe ku; çawan
evîn karê bawermendan e, şoreş jî
weha karê bawermendan e. Yên ku
baweriyek wanî qihîm tunebe nika-
rin bibin evîndar evîndar û nikarin
bibin şoreşger jî. Evîn û şoreş bi la-
fazaniyê nabe, bi cesaretê, bi bawe-
riyê dibe. Yên ne cesûr û ne bawer-
mend nikarin bibin aşîk -evîndar- û
nikarin bibin şoreşger.

Romana Nakokiya Jin û Mêrî

Howard û Barbara Kirk jin û mêrê
hevin. Malbatek bextiyar in, dilşad in.
Ew her sal fest çêdikin. Bangê nas û
dostên xwe dikin û bi wan re festa xwe
bi şahî pîroz dikin.

Di vê sala nû de, malbata Kirk dîsan
festek amade dikin. Howard sosyolog e
û mirovekî radîqal e. Howard nivîskar e
jî. Du pirtûkên wî hatine weşandin,
pirtûka xwe ya sêyemîn amade dike.
Ew di kovar û rojnameyan de nivîsên li
ser zanîstiya cîvakî dinivîse.

Barbara jî jinek aktîf e. Di nav tevgera
jînan de seriya lêvbazîyan û çalakîyan
dikşîne. Ew jî mêrê xwe jî radîqaltir e.
Barbara pîsporê edebiyata zarokan e.
Barbara li ser pîrs û pîrsgirêkên zarokan
di rojnameyan de nivîs dinivîse.
Roman li der dora vê malbatê diçe û tê
û li ser têkiliyên wan hatiye honandin.
Di amadekirina festê de navê 50 kesî
heldibijêrin û telefonê wan dikin, wan
dawetê malê festê dikin. Derdorê vê
malbatê gelek fereh e. Di nav nas û
dostên wan de gelek entelektuel û
mirovên şoreşger hene. Malbat bi wan
kesên cûrbecûr ve festê çêdike.

Nakokiyên di nav jin û mêrî de di vê
romanê de têt qalkirin. Nivîskarê
romanê bi zîmanekî îronîk û bi
mentalîtekekî rasteqînî gelek bûyerên
cîvakî di vê romanê de dinirxîne.
Nivîskarê romanê Malcolm Bradbury
nivîskarekî Îngilîz e. Di nav edebiyata
Îngilîzî de cîhekî wî yê girîng heye. Ev
pirtûk di nav weşanên CANê de li
Stenbolê hatiye weşandin.

Helwest - Kovara Kulturî û Lîteraturî

BERFÎN

Kovara çandî, hunerî, edebî

Li Almanya'yê derdikeve

* Bixwînin, Bibin Abone !

Lokman POLAT
BAYÊ AZADIYÊ

Derket
Bixwînin! Bidin Xwendin!

Navnîşana Xwestinê : Tensta Alle 43 - 2tr.
16364 SPÅNGA - SWEDEN

HELWEST

Kovara Kulturî û Lîteraturî

Hejmar / No: 8 — Sal / Year - Payiz - 1997



EFŞANÊYA

ŞAHMARAN

Amadekar : Lokman Polat

Derdikeve !

Bixwînin! Bidin Xwendin

Weşanên Çanda Nûjen

Helwest = ISSN - 1400 - 9404